

K.T
ZANÎNGEHA BÎNGOLÊ
ENSTÎTUYA ZIMANÊN ZINDÎ
ŞAXA MAKEZANISTA ZIMAN Ê EDEBÎYATA KURDÎ



(TEZA MASTERÊ)

MIJARÊN HEVPAR DI HELBESTÊN ROJEN BARNAS
Ê NÂZIM HİKMET DE

HAYAL YILDIZ

171302104

Şêwirmendê Tezê

Doç. Dr. M. Zahir Ertekin

ÇEWLÎG-2020

T.C.
BİNGÖL ÜNİVERSİTESİ
YAŞAYAN DİLLER ENSTİTÜSÜ
KÜRT DİLİ VE EDEBİYATI ANABİLİM DALI



(YÜKSEK LİSANS TEZİ)

ROJEN BARNAS VE NÂZİM HİKMET'İN
ŞİİRLERİNDE ORTAK TEMALAR

HAYAL YILDIZ

171302104

Tez Danışmanı

Doç. Dr. M. Zahir Ertekin

BİNGÖL-2020

BİNGÖL ÜNİVERSİTESİ
YAŞAYAN DİLLER ENSTİTÜSÜ MÜDÜRLÜĞÜNE

Hayal YILDIZ tarafından hazırlanan *Mijarên Hevpar di Helbestên Rojen Barnas û Nazım Hikmet de* başlıklı bu çalışma, 06.08.2020 tarihinde yapılan tez savunma sınavı sonucunda [oybirliği ile/ oy çokluğu ile] başarılı/başarısız bulunarak jürimiz tarafından [Kürt Dili ve Edebiyatı] Anabilim Dalı'nda Yüksek Lisans tezi olarak kabul edilmiştir.

Tez Jürisi Üyeleri (Unvanı, Adı ve Soyadı)

Başkan	: Dr. Öğr. Üyesi Ahmet KIRKAN	İmza:
Danışman	: Doç. Dr. Mehmet Zahir ERTEKİN	İmza
Üye	: Dr. Öğr. Üyesi Osman ASLANOĞLU	İmza:

ONAY

Bu Tez, Bingöl Üniversitesi Yaşayan Diller Enstitüsü Yönetim Kurulunun/...../2020 tarih ve sayılı oturumunda belirlenen jüri tarafından kabul edilmiştir.

Doç. Dr. Abdulnasır SÜT

Enstitü Müdürü

KURTE

Kurd ji ber rewşa xwe ya polîtîk di proseya dîrokî de bi gelek neteweyan re di nav karîgerîyê de ne. Şopa vê karîgerîyê xwe di gelek qadên muxtelîf de eşkere dikin ku yek ji wan qadan jî wêje ye. Wêjeyên netewî ne tenê ji rehên xwe yên neteweyî pêk tên, herwiha di nav xwe da tesîrên cuda dihewînin. Her netewe ji bo geşedan û pêşxistina wêjeya xwe çav li wêjeyên din gerandine û ji wan tesîr girtine. Wêjeya kurdî jî yek ji wan wêjeyan e ku ji wêjeyên milletên din tesîr girtiye.

Di vê lêkolînê de li ser helbestên du helbestvanan hatîye xebîtin ku netewên wan cuda ne lê ev her du millet bi sedan salan li ser heman axê jîyane. Ev xebata bi navê *Di Helbestên Rojen Barnas û Nâzım Hikmet de Mijarên Hevpar* ji bo karîgerîya wêjeyî ya di navbera her du neteweyan de dibe mînakê mutewazî ku ji destpêkek û sê beşan pêk tê. Beşa yekem ji bo teorîya wêjeya berawirdî hatîye veqetandin. Di beşa yekem de li ser kurtedîroka wêjeya berawirdî agahî hatine dayîn û herwiha agahîyên kurt ên li ser geşedana wêjeya berawirdî ya di nav wêjeya kurdî û tirkî de jî di vê beşê de cih digire. Dîsa di vê beşê de li ser têkîlîya wêjeya berawirdî û zanista wergerê jî hatîye rawestînê. Beşa duyem ji bo jîyan, berhem û poetîkaya her du helbestvanan hatîye veqetandin. Di beşa sêyem de helbestên ku mijarên wan hevpar in hatine tespîtîkirin û li gor mijaran hatine senifandin.

Di dawîya vê xebatê de mijarên hevpar ên ku hatine tespîtîkirin li gor rêbaza berawirdî bi nêrîneke giştî hatine şîrovekirin.

Peyvên Sereke: Rojen Barnas, Nâzım Hikmet, Wêjeya Berawirdî, Mijarên Hevpar, Helbest.

ÖZET

Kürtler içinde bulundukları politik durumdan dolayı tarihsel süreç boyunca birçok farklı millet ile etkileşim halindedir. Bu etkileşimin izleri kendini muhtelif birçok sahada göstermektedir ki bu sahalardan biri de edebiyattır. Milli edebiyatlar sadece milli köklerinden oluşmaz, aynı zamanda içlerinde farklı tesirleri de barındırırlar. Her millet kendi edebiyatının gelişimi için başka edebiyatlara göz atmış ve onlardan etkilenmiştir. Kürt edebiyatı da bu etkileşimin bir parçası olarak yabancı edebiyatların etkisinde kalmıştır.

Bu araştırmada yüzyıllardır aynı toprak üzerinde yaşamış fakat farklı iki ulusa ait olan iki şairin şiirleri üzerinde durulmuştur. Bu iki millet arasındaki edebî etkileşimin mütevazî bir örneği olan *Rojen Barnas ve Nâzım Hikmet Şiirlerinde Ortak Temalar* adlı bu araştırma giriş ve üç bölümden oluşmaktadır. Birinci bölüm karşılaştırmalı edebiyat teorisi için ayrılmıştır. Bu bölümde karşılaştırmalı edebiyatın kısaca tarihsel gelişimi üzerinde durulmuştur, aynı zamanda bu bölüm karşılaştırmalı edebiyatın kürt ve türk edebiyatlarındaki gelişimi hakkında bilgiler de içermektedir. Yine bu bölümde karşılaştırmalı edebiyat ile çeviribilim ilişkisi üzerinde de durulmuştur. Araştırmanın ikinci bölümünde şairlerin hayatları, eserleri ve poetikaları hakkında bilgi verilmiştir. Üçüncü bölümde ortak konulu şiirler tespit edilip konularına göre sınıflandırılmıştır.

Araştırmanın sonucunda karşılaştırmalı yöntem esas alınarak tespit edilmiş ortak temaların genel değerlendirmesi yapılmıştır.

Anahtar Kelimeler: Rojen Barnas, Nâzım Hikmet, Karşılaştırmalı Edebiyat, Ortak Tema, Şiir.

ABSTRACT

The Kurds interact with many different nations throughout the historical process due to their political situation. The traces of this interaction show itself in many different fields, one of which is literature. National literatures do not only consist of their national roots, but also contain different effects. Each nation has browsed and influenced other literatures for the development of its own literature. Kurdish literature has been influenced by foreign literatures as part of this interaction.

In this research, the poems of two poets who lived on the same land for centuries but belonged to two different nations were emphasized. This research titled *Common Themes in Poems of Rojen Barnas and Nâzım Hikmet*, a humble example of literary interchange between these two nations, consists of introduction and three chapters. The first part is devoted to the theory of comparative literature. This section focuses on the brief historical development of comparative literature, and also includes information on the development of comparative literature in Kurdish and Turkish literature. Also in this section, the relationship between comparative literature and translation science is also emphasized. In the second part of the research, information about poets' lives, works and poetics has been given. In the third section, poems with common themes were identified and classified according to their subjects.

The overall assessment of the common themes identified as a result of the research was made based on the comparative method.

Keywords: Rojen Barnas, Nâzım Hikmet, Comparative Literature, Common Theme, Poetry.

PÊŞGOTIN

Tesîrderî wekî her alîyê jîyanê di qada wêjeyê de jî dîyardeyeke jêneger e. Ev xebat jî vê tesîrderîya di qada wêjeyê ji xwe ra dike mijar ku bi rêbaza berawirdî di helbestên Rojen Barnas û Nâzım Hikmet de mijarên hevpar digere. Herwiha zanista wêjeya berawirdî jî sehayeke nû ye û di gelek wêjeyan de hêj nû tê nasîn û sepandin ku wêjeya kurdî jî yek ji wan wêjeyan e. Di wêjeya kurdî de xebatên berawirdî bi gelemperî di navbera sînorên kurdî de maye û zêdetir xebat li ser zarava û berhemên kurdî hatine kirin. Ev xebat jî di kurmancî de wê bibe yek ji xebatên ewil ku du helbestvanên netew cuda bi hemû helbestên xwe ve tên berawirdkirin. Em hêvî dikin ku ev xebat jî bibe perçeyekê ji zîncîreya xebatên bi vî rengî ku ji bo xebatên li ser vê mijarê sûdewer be.

Helbet ev xebat bê motivasyon û alîkarîyan nediçû serî ku di her asta vê proseya de keda gelek kesan heye. Ez deyndarê wan kesan im ku bi rêberî û hevaltîya xwe bûne şîrîkê vê xebatê.

Di serî de divê ez spasîyekê taybet li mamosteyê xwe Doç. Dr. M. Zahir Ertekin bikim ku şewirmendîya min qebûl kir. Bêguman him di xwendina min a lîsansê de him jî di masterê de gelek keda wî li ser min çêbû, ji bo ked û rêberîya wî ya bi salan minetdarê wî me. Helbet îro ev xebat jî bi sebr û alîkarîya wî temam bû. Herwiha mamosteyên min Şerif Güzel û Ömer Delikaya jî bi xwendin û şîroveyan xwe rê li ber min vekirin ku bi saya şîroveyan wan ev xebat kamiltir bû, mala wan ava be.

Bêguman di vê xebatê de keda hevalê min Mem Artemêt zêde zêde ye ku ew ji destpêkê heta dawî bi sebr û alîkarîya xwe her tim li ba min bû û bi motivasyona ku wî da min ev xebat bi rê ve çû, mala wî hezar car ava be. Dîsa divê ez razîbûna xwe bînim ziman ku Qedrî Sipranî jî di vê proseya de bi dostanîya xwe û di pêydakirina çavkanîyan de gelek alîkarî da min.

Helbet ez ji bo hemû kêlîyan xwendina xwe deyndarî malbata xwe me ku di her asta xwendinê de bi tehemul û alîkarîyan xwe barê min sivik kirin. Herwiha ew bi hebûn û alîkarîyan xwe bûne pardarê hemû zehemetîyan min. Spasîyan taybet ji bo birayên min Sedat Baran û Taha Baran ku di vê serpêhatîya min a masterê de her dema ku diketim tengasîyê bi fikrên xwe rê li ber min vedikirin, mala wan ava be.

Spas ji bo hemû dost û hevalan ku keda wan di vê xebatê de heye lê me navê wan nenivîsandine.



KURTEBÊJE

B.Z.	: Berîya zayînê
c.	: cild
CHP	: Cumhuriyet Halk Partisi (Partîya Gel ya Cîmhurîyetê)
DDKO	: Devrimci Doğu Kültür Ocağı (Malbenda Çandeyî ya Şoreşger a Rojhilatê)
h.	: hejmar
h.b.	: heman berhem
h.g.	: heman gotar
h.h.	: heman hevpeyvîn
h.n	: heman nivîs
h.t.	: heman tez
hwd.	: her wekî din
KIBATEK	: Kıbrıs, Balkan, Avrasya Türk Edebiyatları Kurumu (Sazîya Wêjeyên Tirkî ya Kıbrıs, Balkan, Avrasya)
KUTV	: Doğu Emekçileri Komünist Üniversitesi (Zanîngeha Komînîst a Kedkarên Rojhilatê)
P.Z.	: Piştî zayînê
r.	: rûpel
TEDA	: Türk Kültür, Sanat ve Edebiyatı ile İlgili Eserlerin Türkçe Dışındaki Dillerde Yayımlanmasına Destek Projesi (Projeya alîkarîyê ya ji bo weşandina berhemên di derheqê çand, huner û wêjeya tirkîyan ên bi zimanên biyanî.)
TÖS	: Türkiye Öğretmenler Sendikası (Sendîkaya Mamosteyên Tirkîyeyê)
TİP	: Türkiye İşçi Partisi (Partîya Karkerên Tirkîyeyê)

YÖK : Yükseköğretim Kurulu (Lijneya Hîndekarîyê ya Bilind)



NAVEROK

KURTE	II
ÖZET	III
ABSTRACT	IV
PÊŞGOTIN	V
KURTEBÊJE	VII
DESTPÊK	1
BEŞA YEKEM:	7
DÎROKA WÊJEYA BERAWIRDÎ	7
1.1. Ekola Wêjeya Berawirdî ya Fransîzî	10
1.2. Ekola Wêjeya Berawirdî ya Almanî	12
1.3. Ekola Wêjeya Berawirdî ya Amerîkî	13
1.4. Ekola Wêjeya Berawirdî ya Welatên Cîhana Sêyem	15
1.5. Ekola Wêjeya Berawirdî ya Marksîst	16
1.6. Wêjeya Berawirdî di Edebîyata Tirkî de	18
1.7. Wêjeya Berawirdî di Edebîyata Kurdî de	20
1.8. Di Wêjeya Berawirdî de Fonksîyana Wergerê	23
1.8.1. Çalakîya Wergerê Li Cîhanê	25
1.8.2. Çalakîya Wergerê di Tirkî de	29
1.8.3. Çalakîya Wergerê di Kurdî de	31
1.9. Mijarên Hevpar di Wêjeya Berawirdî de:	34
BEŞA DUYEM	36
JÎYAN, BERHEM û POETÎKA YA ROJEN BARNAS û NÂZIM HÎKMET	36
2.1. ROJEN BARNAS	36
2.1.1. Jîyan	36
2.2.1. Berhem	42
2.2.2. Poetîka	43
2.3. NÂZIM HÎKMET	46
2.3.1. Jîyan	47
2.3.2. Berhem	51
2.3.3. Poetîka	53
BEŞA SÊYEM	58
DI HELBESTÊN ROJEN BARNAS û NÂZIM HÎKMET DE MIJARÊN HEVPAR ..	58
3.1. Welat	59

3.1.1.	Hezkirina Welat	60
3.1.2.	Hesreta Welat	63
3.2.	Îdeolojî û Dijmêtînkari	67
3.2.1.	Îdeolojîya Rojen Barnas	68
3.2.2.	Îdeolojîya Nâzîm Hikmet:	69
3.2.3.	Îdeolojîya Neteweyî û Helwesta Dijmêtînkari	70
3.3.	Hezkirin.....	80
3.3.1.	Hezkirina Siruştê.....	80
3.3.2.	Mirovhezî	82
3.3.3.1.	Hezkirina Zarokan.....	85
3.3.4.	Hezkirina Yarê	88
3.4.	Hêvî/Umîd û Hezkirina Jîyanê.....	94
3.5.	Dê/ Dayik.....	99
3.6.	Îxanet.....	102
3.7.	Azadî.....	105
3.8.	Dîrok.....	106
3.9.	Mirin.....	109
ENCAM.....		112
ÇAVKANÎ.....		116

DESTPÊK

Di vê cîhana global de jîyan ji her alîyî ve di nav danûstandineke de ye. Bi pêşveçûna teknolojiyê û nêzikbûna gelan a bi têkîlîyên sîyasî û ekonomîk ve êdî cîhaneke piçûk û nêzî hev derdikeve pêşberî me, ji ber vê sedemê jî em îro nikarin behsa resenî û tekanetîyê bikin. Nabe ku li cîhanê miletek hebe ku çavên xwe ji qewam û rûdanên cîhanê re girtibe û bêyî bandor û têkîlî bi resenîya xwe ve mabe. Ji destpêka mirovahîyê heta îro mirovan di warê çand, huner, zanist û di gelek warên cuda de çî afirandibe ji yê derdora xwe tesîr girtine û mînakên ku ji wan girtine pêşve birine, dewlemend kirine û ji nû ve afirandine. Lewra em dikarin bibêjin ku çand û şaristanîyên ku li dinyayê tên holê bi hevdu re têkildar in û bi jêgirtin û dayînên xwe ve hene. Ev bandor û têkildarî xwe ji alîyên cur bi cur ve nîşan didin. Hin gel ji alîyên bawerîyan ve bi hevdu re têkildar in û ji ber vê sedemê jî çandeke hevpar di navbera wan de çêdibe. Li ser hinekên din jî erdnîgarîya hevpar, bûyerên civakî û sîyasî, têkîlîyên aborî û sîyasî, koçberî û gelek mijarên din tesîrê dihêlin. Ji alîyekî ve jî hin bizavên veguherîn û nûbûnê yê wekî Şoreşa Fransîzî (1789-1799), Serdema Tanzîmat (1839) û Islahatê (1856), Şoreşa Rûsî (1917) û gelekên din li cîhanê deng vedane, li ser gelan tesîr hiştine û bûne sedema guherînan.

Edebîyat jî yek ji wan qadan e ku di bin tesîra van hemû mijaran de dimîne ku me li jor behs kir, edebîyat xwe diguherîne, dewlemendtir dike û merhele û êwrên cuda di nav xwe de dihevine. Helbet îro her wêje û çand di nav têkîlîyan de hebûna xwe didomîne. Ger em bi giştî li wêjeyên miletan binêrin em ê bibînin ku ew wêje xwe li gor ihtiyac û guherînên serdeman vediguherînin, weke mînak; serdema klasîk, serdema modern û postmodern. Herwiha teşe, naverok û cureyên edebî jî bi domana demê re diguherin.

Wêjeya berawirdî jî şaxeke zanista wêjeyê ye ku di dawîya sedsala 18an de wekî rêbazeke zanistî di xebatên akademîk de cih girtiye. Ew guherîn û tesîrdêrîyên me li jor behs kirin dikevîn qada vê zanistê ku berawirdkirina wêje û berheman ji xwe re kirine peywir. Edebîyateke ku di bin tesîra tu edebîyatê de nemabe nikare xwe pêş ve bibe. Edebîyata berawirdî hewl dide ku wekhevî, dijayetî, hevparîya naverok, teşe

û nîyeta berhemana bide ber çavan. Hemû gel çanda xwe, zimanê xwe, teknoloji û ekonomîya xwe û hwd. raberi gelên din dike û li gor vê raberiye xwe pêşdetir dibe, rengên cuda li xwe zêde dike û dikeve hewla dewlemendkirina çanda xwe. Bi vê nîyetê me jî di vê lêkolînê de berê xwe da berawirdkirina helbestvanên ji du miletên cîyawaz da ku ev xebat bibe perçeyekê ji zîncîreya xebatên bi vî rengî û di diyarkirina sînorên wêjeya kurdî de bibe alîkar.

Armanca Tezê

Ji dîroka ku tirk hatine Anatoliyayê heta îro tirk û kurd di heman coxrafyayê da dijîn. Ji ber vê sedemê jî di navbera çand û edebîyata her du gelan de karîgerîyek çêbûye. Wekî ku tê zanîn di serdema cîmhûriyetê de li Tirkîyeyê zimanê perwerdehiyê dibe tirkî û ji ber sedemên civakî û polîtîk jî kurdên ku li vê coxrafyayê dijîn bi zimanê tirkî dest bi xwendinê dikin, edebîyata tirkî dinasin. Ev yek jî dike ku bandora ziman, çand û edebîyata tirkî li ser gelê kurd çêbibe. Rojen Barnas jî yek ji wan kesan e ku demeke jîyana xwe li Tirkîyê bihurandiye, bi zimanê tirkî perwerde bûye, di destpêkê de jî helbestên xwe bi tirkî nivîsandîye. Rojen Barnas di edebîyata kurdî de wekî şaîrekî nûjen û marksîst tê nasîn ku helbestên xwe yên ewil û di bin tesîra helbesta tirkî ya nûjen de bi zimanê tirkî nivîsandîye. Nâzım Hikmet jî şaîrekî marksîst e ku bi helbestên xwe yên nûjen di edebîyata tirkî de bûye ekol û gelek helbestvanên nûjen jî di bin tesîra wî de mane. Em ê jî di vê xebata xwe de li gor teknîka wêjeya berawirdî helbestên Rojen Barnas û Nâzım Hikmet ku her du jî girêdayî îdeolojiya marksîst in bidin ber hev û li ser hevparîya mijarên wan rawestin.

Di vê lêkolînê de jî armanca me ya sereke ew e ku em du helbestvanên nûjen ên serdem û neteweyên wan cuda lê îdeolojiya wan yek e bidin ber hev ku em ê bizanibin helbestên wan ji kîjan alîyan ve dişibin hev. Di vê berawirdkirinê de du helbestvanên ku serdemên wan cuda hatine berawirdkirin û wekî ku tê zanîn Nâzım Hikmet ne li heyatê ye û berhemdarîya Rojen Barnas jî hêj didome, herwiha jî ber ku Nâzım Hikmet berî Rojen Barnas jîyaye, em ê li nav helbestên Rojen Barnas de bandora Nâzım Hikmet bigerin û vê yekê tespît bikin ku Barnas ta çî radeyê di bin bandora Hikmet de maye. Herwiha di vê xebatê de tê nîyetkirin ku ji du zimanên cuda du helbestvanên modern bê berawirdkirin da ku xebateke din, li nav xebatên berawirdî yên lêkolînî yên kurdî zêde bibe û pencereyekê nû vebe di vê biwarê de. Lewra di kurdî de xebatên

berawirdî zêdetir di navbera zaravayên kurdî de hatine kirin û li gor zanîna me di kurmacî de (li bakur) heta niha du helbestvanên netew cuda bi hemû helbestên xwe ve nehatîne berawirdkirin, loma me bi vê kurtexebatê xwest ku ciheke piçûk di vê valahîyê de bê dagirtin.

Çarçoveya Tezê

Di vê xebatê de me peyva kurdî tenê ji bo kurmacî bi kar anîye. Lewra emê div ê xebatê de ji bo beşên kurdî û xebatên li ser Rojen Barnas û Nâzîm Hikmet de tenê cih bidin xebatên bakûr û kurmacî.

Di mijara teorîya wêjeya berawirdî de ev xebata me tenê bi kurtedîroka wêjeya berawirdî û têkîlîya wê bi zanista wergerê ve sînordar e ku me di vê xebatê de cih nedaye hemû nîqaşên li ser pênase û qada xebata wêjeya berawirdî. Lewra ciyê van nîqaşên dûr û dirêj ne xebateke masterê ye.

Ev xebata me di helbestên Rojen Barnas û Nâzîm Hikmet de tenê mijarên hevpar digere û herwiha ev mijarên hevpar tenê ji aliyê naverokê ve hatine berawirdkirin ku me di vê xebatê de dest nedaye berawirdkirina form û rûxsara helbestan. Ji ber ku di helbestên modern de bi gelemperî heman formên ruxsarî tên bikaranîn. Loma jî ev wekî tesîr û hevparîyeke taybet nîne ku di vê xebatê de cih bigire.

Rêbaza Tezê

Di vê xebatê de me li gor rêbaza berawirdî hemû helbestên Rojen Barnas û Nâzîm Hikmet analîz kirin, me dît ku ev helbest ji bo berawirdkirinê guncav in û taybetîyên wêjeya berawirdî di hewînî û bi vê analîzê di helbestên wan de me gelek mijarên hevpar tespît kirin.

Ji ber ku ev xebat li gor teorî û paradîgmayên wêjeya berawirdî hat tetbîqkirin me ji bo fehmkirina vê teorîyê beşa ewil ji bo pênase û kurtedîroka wêjeya berawirdî veqetand. Wêjeya berawirdî jî ji bo xebatên navnetweyî xwe dispêre zanista wergerê, herwiha xebata me jî li ser berhemên du wêjeyên ciyawaz pêk tê û di vê xebatê de jî hewcehî bi wergerê heye loma me di vê beşê de bi kurtî cih da têkîlîya di navbera zanista wêjeya berawirdî û wergerê jî.

Ji ber ku helbestvan bûyerên serdema xwe pitşguh nakin û car caran jî wan mijaran daxilî berhemên xwe dikin, me jî ev guman da ber çavan û nedibû ku em vê faktorê îhmal bikin. Ji ber vê sedemê jî me di beşa duyem de digel serdema jîyana wan bi kurtî behsa berhem û poetîkaya helbestvanan jî kir. Helbet dibû ku me cih nedaya jîyana herdu helbestvanan. Lê ji ber ku cara yekem e ku ev herdu helbestvan bi awayekî sistematîk têne berawirdkirin, me xwest bi kurtî jîyana herdu helbestvanan di tezê de cih bigire. Herwiha heta niha li ser Barnas û jîyana wî xebatên berfireh nehatine kirin. Jiyana Hikmet jî belkî cara ewil di vê xebata me de derdikeve hemberî xwînerên kurd. Herwiha di vê beşê de bi saya kurtejiyan û berhemên herdu helbestvanan rê li ber beşa esasî hate vekirin.

Di beşa sêyem de hevparîyên ku hatibûn tespît kirin li gor mijaran hat dabeş kirin û ji bo berawirdkirin û piştraskirina van hevparîyan jî me wekî nimune cih da helbestan. Di vê beşê de metnên mînak ên Hikmet bi kurdî jî hatin wergerandin.

Di beşa dawî ya vê lêkolînê de jî derbarê encamên bidestxistî de me cih da nirxandineke giştî û çavkanîyên ku me di vê xebatê de jê îstîfade kirine hatine ravekirin.

Zehmetîyên Tezê

Wekî hemû xebatên akademîk zehmetî û pirsgirêkên vê lêkolînê jî hebûn. Problema sereke ya vê lêkolînê jî wergerandin bû. Bi taybetî di beşa teorîya vê lêkolînê de kêmbûna berhemên kurdî yê teorîk bû sedem ku em berê xwe zêdetir bidin berhemên tirkî û dîsa nezanîna me ya zimanê bîyanî jî kir ku em li şûna çavkanîyên yekem berhemên werger ên tirkî bi kar bînin. Ji ber van sedeman me agahîyên ku bi dest xistin ji tirkî wergerand bo kurdî. Loma jî ev beş bû sedema derengketina vê proseyê. Yek jî berawirdî di kurdîya bakur de sehayê nû ye, ji ber vê jî nebûna çavkanîyên sereke yê kurdî- kurmancî weke zehmetîyeke li me asê bû.

Çavkanîyên Sereke

Di vê lêkolînê de ji bo beşa teorîk me bi gelemperî ji çavkanîyên tirkî îstîfade kir. Ji ber ku ev xebat li ser hîma zanista berawirdî hatîye avakirin me xwe gîhand gelek pirtûk û gotarên di derbarê wêjeya berawirdî de. Di derbarê beşa teorîyê de sê çavkanîyên sereke hene ku me bêhtir ji wan îstîfade kir:

Çavkanîya yekem ku ji bo vê lêkolînê bû referanseke xurt berhema Paul Van Tieghem a bi navê *La Littérature Comparée (Wêjeya Berawirdî)* bû ku ji Fransîzî bo tirkî hatibû wergerandin. Dîsa ji bo zelalkirina hin pirsên di vê mijara teorîk de bi taybetî me ji berhema Gürsel Aytaç a bi navê *Karşılaştırmalı Edebiyat Bilimi (Zanista Wêjeya Berawirdî)* îstîfade kir ku ji bo danasîna zanista wêjeya berawirdî çavkanîyeke zelal û birêkûpêk bû. Berhema Mesut Tekşan a bi navê *Karşılaştırmalı Edebiyat Bilimi (Zanista Wêjeya Berawirdî)* jî ji bo rêbaza beşa teorîk a vê xebatê bû rêber. Herwiha gelek pirtûk û gotarên li ser vê mijarê jî bûn referansa xebata me.

Ji bo zelalkirina pirsên derbarê jîyan û poetîkaya Rojen Barnas û Nâzım Hikmet jî me pirtûk, gotar, tez û hevpeyvînên heyî bi dest xistin. Ji bo jîyana Rojen Barnas me ji pirtûka wî ya bi navê *Farqîn* îstîfade kir ku di vê pirtûkê de derbarê jîyana xwe de agahîyên berfireh dide. Dîsa çend hevpeyvîn û gotarên heyî jî ji bo agahîyên li ser jîyan û poetîkaya Rojen Barnas de bûn referansa lêkolîna me.

Ji bo agahîyên derbarê jîyana Nâzım Hikmet jî me gelek çavkanî bi kar anîn lê bi taybetî pirtûka Asım Bezirci ya bi navê *Nâzım Hikmet – Yaşamı, Şairliği, Eserleri, Sanatı-* bû çavkanîya sereke ya vê mijarê ku ev pirtûk him di derbarê jîyana wî de him jî li ser helbestvanîya wî agahîyên berfireh dide. Digel vê berhemê jî me gelek caran ji teza doktorayê ya Ersin Sönmez îstîfade kir ku ev tez di sala 2003an de di Zanîngeha Hacettepe'yê de li ser jîyan û helbestên Nâzım Hikmet hatîye nivîsandin.

Di beşa sêyem ango beşa esasî de helbet çavkanîyen sereke pirtûkên weşandî yên herdu helbestvanan bûn. Me ji hemû pirtûk û helbestên weşandî yên herdu helbestvanan bi awayekî berfireh sûd wergirt û di çavkanîyan de ew bi kar anîn. Dîsa ji bo rêbaza vê beşê me ji gotarên *Sempozyûma Edebîyata Berawirdî -Ji Duh Heta Îro di Edebîyatên Tirk û Kurdan de Texeyulên Nasnameyî-* îstîfade kirin ku di vê sempozyumê de gelek gotarên li ser berawirdkirina her du edebîyatan hatine pêşkeşkirin. Di vê beşê de ji bo danasîna hin mijaran me ji pirtûka Zülküf Ergün a bi navê *Nerît û Helbest-Nerîta Neteweyî Di Helbesta Nû Ya Kurdî De* îstîfade kir. Digel vê pirtûkê çend tezên berawirdî hene ku me di vê beşê de ji rêbaza van tezan îstîfade kir:

Di sala 2019an de di Zanîngeha Gaziantepê de ji alîyê Sema Alptekin ve tezeke bi navê *Şeyhülislam Yahya ve Şeyh Gâlib Dîvânlarında Aşk ve Şarap ile ilgili*

Kavramların Mukayeseli Olarak İncelenmesi ya lisansa bilind hatîye amadekirin. Ev tez li ser beravirdkirina têgehên hevpar ên her du şairên berbehs hatîye hazirkirin ku me jî teza xwe bi taybetî li gor metoda vê teze amade kir.

Di sala 2015an de di Zanîngeha Marmarayê de ji alîyê Begüm Ekşi ve teza bi navê *Bertolt Brecht ve Nâzım Hikmet'in Eserlerine Yansıyan Memleket Hasreti* hatîye hazirkirin. Ev tez li ser berawirdkirina mijara hesreta welat di helbestên her du şairan de hatîye amadekirin.

Dîsa di sala 2019an de di Zanîngeha Mardîn Artukluyê de ji alîyê Volkan Korkmaz ve teza bi navê *Berawirdkirina Li Ser Destana Memê Alan û Mem û Zîna Ehmedê Xanî Ji Alîyê Binyadê Ve* hatîye amadekirin. Ev tez jî bi rêbaza berawirdî hatîye amadekirin û ji bo metoda vê lêkolînê me ji vê tezê jî îstîfade kir.

Di sala 2015an de di Zanîngeha Mardîn Artukluyê de ji alîyê Volkan Korkmaz ve teza bi navê *Berawirdkirinek Li Ser Şivanê Kurmanca û Sêbareya Maksîm Gorkî* hatîye amadekirin. Ev tez jî ji alîyê teorîk ve ji xebata me re bû referans.

BEŞA YEKEM:

DÎROKA WÊJEYA BERAWIRDÎ

Berawirdkirin di jîyana mirovan de behreyeke siruştî ye, her berhema nû, fikrên zanistî, çalakîyên civakî û hwd. bala mirovan dikişînin û mirov van hemû tiştan bi yê berê re berawird dikan. Bi vê helwesta xwe armanc dikan ku wekhevî û cudahiye wan eşkere bikin. Bi demê re ev helwesta siruştî di qadên zanistî de jî wekî disîplînekê cihê xwe girtîye. Di sedsala 18an de rêbaza berawirdî ketîye nav xebatên wêjeyê¹ û di sedsala 19an de jî bi navê “wêjeya berawirdî” wekî qadeke zanistî a serbixwe hatîye qebûlkirin.² Wêjeya berawirdî têkilîyên di navbera metnên edebî yê neteweyî û bîyanî ji xwe re dike mijar ku wan ji alîyê raman, şêwe an jî naverokê ve berawird dike û tespît dike ku ji kîjan alîyan ve û çiqas tesîr li ser hev hiştine. Li ser nav û naveroka wêjeya berawirdî û qada xebata wê nêrînên cuda hene û li gor xebatên berdest teorîsyenên vê qadê li ser pênase û rêbaza wêjeya berawirdî negihîştine encameke hevpar. René Wellek (1903-1995) jî dîyar dike ku têgeha “wêjeya berawirdî” bi xwe têgeheke problematîk e. Ji ber vê sedemê jî di qada wêjeya berawirdî de xebatên akademîk qels mane.³

Dîsa René Wellek behsa sê binyadan dike ku wêjeya berawirdî li ser hatîye rûniştandin.

Di wateya ewil de wekî qada lêkolînên wêjeya devkî tê bikaranîn ku li ser temayên çîrokên gelî dixebite ku ew çawa û kîngê derbasî wêjeya lijneyên bilind û hunermendane bûne. Xebatên bi vî rengî her çiqas di wêjeyên welatên Slav û Îskandînav de hatibin bikaranîn jî di wêjeyên Ewropî de zêde bal nekişandine. Lewma di pênaseya wêjeya berawirdî de “qada lêkolînên wêjeya devkî” zêde nayê bikaranîn.⁴

Wateya duwem jî vê têgehê bi sînor dike ku li gor vê nêrînê edebîyata berawirdî li ser têkilîyên du an jî zêdetir wêjeyan lêkolîn dike. Têgehê di vê wateyê de cara ewil

¹ Gürsel Aytaç, *Karşılaştırmalı Edebiyat Bilimi*, Doğubatı Yayınları, Ankara, 2016, r. 18

² Van Paul Tieghem, *Mukayeseli Edebiyat*, Fransızcadan Çeviren: Yusuf Şerif Kılıçel, Büyüyen Ay Yayınları, İstanbul, 2013, r. 31

³ René Wellek, Austin Warren, *Edebiyat Teorisi*, Çeviren: Ö. Faruk Huyugüzel, Dergâh yayınları, İstanbul, 2013, r.53

⁴ René Wellek, Austin Warren, *h.b.*, r. 53-55.

lêkolînerên ekola Fransîzî ya wêjeya berawirdî ku bi serokatîya Fernande Baldensperger li dora Kovara Wêjeya Berawirdî de kom bûne, bi kar anîne.⁵

“Nêrîna sêyem jî edebîyata berawirdî bi edebîyata cihanî, giştî yan jî edebîyata gerdûnî ve girê dide û bi vê helwesta xwe hewl dide ku rexneyan bi dawî bike. Dîsa jî hin problemên vê nêrinê hene. Têgeha “wêjeya cihanî” ku ji têgeha “weltiliteratur” a Goethe (1749-1832) dinizile û di wê meylê da ye ku ji Zelandaya Nû heta Îzlandayê edebîyata pênc parzemînan bi giştî were kolandin. Di eslê xwe de Goethe wiha nefikirîbû. Wî ev têgeh di maneya wêjeyêke yekpare de bi kar anibû ku ji hemû edebîyatan pêk dihat. Ew îdealekî wisa bû di konsereke gerdûnî de her millet li enstrûmana xwe dide û dibin sentezeke yekta û mezin. Lê belê Goethe bi xwe dît ku ev îdealeke dûr e û yek miletek jî naxwaze dev ji taybetîyên xwe yê mîlî berde. Ku îro em ji yekparebûneke bi vî rengî dûrtir in û em nikarin bibêjin ku bi rastî jî em dixwazin cudahîyên me yê mîlî ji holê rabin. Bi vê pênaseya xwe edebîyata berawirdî dijî edebîyata mîlî ye. Dema ku li ser Walter Scott (1771-1832) tên rawestan di wê bawerîyê de ne ku divê tesîra Scott ya der-îngilistanî û eleqeya ku romana tarîxî ya ku di cimaeta navnetewî de li dar e neyê piştguhkirinê. Edebîyat di feraseteka fireh -tema, teknîkên cûreyî, û vegotinî- de tê dîtinê. Edebîyata ku di welatên din de pêş dikeve, liv û tevgerên fikrî û bizavî bi çavekî berawirdî tên vekolîn.”⁶

Wekî gelek zanistên din zanista wêjeya berawirdî jî ji proseyeke dîrokî derbas bûye. Piştî ku rêbaza berawirdkirinê wekî rêbazeke zanistî hatîye qebûlkirin û di qada wêjeyê de jî hatîye bikaranîn, qadeke nû ya bi navê zanista wêjeya berawirdî jî derketîye holê. “Ji destpêkê heta îro li ser têgeha wêjeya berawirdî nêrînên cuda çêbûne. Rêbaza berawirdkirinê her çiqas di sedsala 19an de wekî disîplîneke zanistî derketibe holê jî bingeha wê digihîje heta Serdema Klasîk a Platon û Arîsto. Cara ewil du têgeh; helbest û felsefe hatine berawirdkirin. Di berawirdkirina van her du têgehan de Platon serdestîya felsefeyê parastîye û Arîstoyê şagirtê wî jî bi îsrar li ser nêrîna xwe rawestîyaye ku li gor wî helbest jî bi qasî felsefeyê girîng e û wî ev her du têgeh ji alîyên têvel ve raberî hev kirîye. Bi vê xebata xwe ji Horace û Longinus re zemîneke berfireh a berawirdkirinê hiştîye ku li du wî hatine. Bi vî awayî mînakên berawirdî ku bi peywendîya felsefe û helbestê ve dest pê kirîye wekî dîroka berawirdî, aborîya berawirdî, polîtîkaya berawirdî û di qadên têvel de derketîye holê. Belkî jî

⁵ René Wellek, Austin Warren, *h.b.*, r. 55

⁶ René Wellek, Austin Warren, *h.b.*, r. 56

bîrewerên serdema klasîk bêyî ku bizanibin çi ye rexneyên “rexneya wêjeya berawirdî” kirine. Ev kevnoşopîya berawirdî ku wan dabû destpêkirin ji wan heta Dryden, Arnold, Sanctis, Goethe, Cuîver hatîye û di çaryeka ewil a sedsala 19an da ji alîye zanistî ve nîrxandina wê dest pê kirîye.”

J. Dryden’ê ku yek ji nivîskarên herî girîng ê wêjeya îngîlîzî ya sedsala 18an e di ceribandineke xwe ya bi navê *Of Dramatick Poesie* da ku di sala 1668an de weşîyaye bi awayê suhbata çar hevalan vê meseleyê berpêş dike: Gelo “dramaya antîk” an “dramaya modern” (sedsala 17.) ji hêla edebî ve berztir e? Suhbet an jî nîqaş, di gereke botê ya ku li ser çemê Thames’ê ye diqewime û cihê ku ava çem lê dirije Îngîlîz û Holandî dicengin. Mijara ku Dryden çav lê diqirpîne problemek e ku Bacon ew (1561-1626) anîye nava wêjeya îngîlîzî lê di Ewropayê da bingeha wê xwe dispêre sedsala 15an. Berhema bi navê *Battle of the Books* a Swift di vê mijara nîqaşê de bi nav û deng e. Di vê ceriandina berbehs a Dryden de pirseke din jî ku dikeve rojevê ev e: Gelo di dram’ê de fransîz pêşketîtir in an îngîlîz.

Lessing’ê (1729-1781) ku yek ji nivîskarê Serdema Ronahîyê (Aydınlanma Dönemi Yazarı) ye di yek ji nameya xwe ya meşhur a 17. de, ku perçeyek ji 333 nameyên naverok-edebîyatî ye (*Briefe, die neueste Literatur betreffend*-1759) pêwendîya edebî ya antîk û îngîlîz û fransîz bi awayekî ecêb dinirxîne û bi wê fikrê re ye ku Shakespeare ji fransîzan bêtir nêzî wêjeya antîk e. Li gorî wî fransîz ji xeynî teqlîdkirina mînakên antîk wêdetir neçûne. Li gorî Lessing palpiştê herî xurt a xizmtîya şanoya îngîlîz a bi şanoya almanî re efsaneya Dr. Faustus e û ev veguhastina bo şanoya îngîlîzî ya vê mijarê ku efsaneya wêjeya gel a almanî ye ji hêla Marlowe ve di sedsala 16an de pêk hatîye. Her wiha Lessing di *Hamburgische Dramaturgie* ya xwe de di rexneyên xwe yên şanoyê de carnan xwe davêje bextê mijarên sê-yeke (ûç birlik), Aristoteles û Shakespeare.⁷

Di dîroka wêjeya almanan de yek ji pêşengên wêjeya berawirdî Friedrich Schlegel (1772-1829) e. Ew di lêkolîneke xwe ya girîng de *Julius Cesar* a Shakespeare û *Leo Armenius* a Gryphius berawird dike. Bi vê xebata xwe armanc dike ku

⁷ Aytaç, *h.b.*, r. 28

Shakespeare li Almanyayê bê fehmkirin û di vê mijarê de jî ev xebat wesfa pêşengîye digire.⁸

Li Îngîlistanê de jî Matthew Arnold (1822-1888) dibe pêşengê xebatên wêjeya berawirdî. Matthew Arnold pirtûka bi navê *Comparative History (Dîroka Berawirdî)* ku ji aliyê Amperé ve hatîye nivîsandin wergerandîye îngîlîzî û cara ewil wî di îngîlîzî de ev têgeh bi kar anîye.⁹ Dîsa M.H. Posnett (1855 – 1927) di sala 1886an de pirtûka xwe ya bi navê *Comparative Literature* çap dike. Ev berhem ceribandîneke dîrokî ye ku li ser çavkanî û geşedana wêjeyên hemû cîhanê bi rêbaza analojîyê hatîye nivîsandin¹⁰ û di qada wêjeya berawirdî de gelek rapor û rexne li ser vê berhemê tînin nivîsandin.¹¹ Lê îngîlîz şûna ku bala xwe bidin wêjeya berawirdî zêdetir li ser zanista wêjeya berawirdî xebitîne. Lewma li Îngîlistan û kolonîyên wê zêde bi vê beşê re eleqedar nebûne.¹²

Her çiqas wekî nakokîyekê bixûyê jî di eslê xwe de xala destpêkê ya çalakîyên wêjeya berawirdî fikara xurtkirina wêjeya neteweyî ye. Bi gotîneke din jî bo ku edebîyata neteweyî sererast bibe û pêşve biçê divê li edebîyatên din bê nihêrîn û bê fehmkirin ka ew çî dikin.¹³ Piştî danasîna van xebatên ku bûne pêşengên xebatên wêjeya berawirdî lazim e em bi kurtî behsa êkolên wêjeya berawirdî bikin.

Zanista wêjeya berawirdî di destpêkê de li Ewropayê teşe digire. Ji ber vê sedemê em ê jî xebata xwe ya li ser êkolên wêjeya berawirdî ji welatên Ewropî bi taybetî jî du êkolên mezin û kevn, ji êkolên Fransîz û Almanan bidin destpêkirin.

1.1. Ekola Wêjeya Berawirdî ya Fransîzî

Di dîroka wêjeya berawirdî de Fransa dibe pêşengê wêjeya berawirdî. Lewra têgeha wêjeya berawirdî hîn di demên berê de li Fransayê hatîye bikaranîn ku hîn di

⁸ Aytaç, h.b., r. 29

⁹ Emel Kefeli, “Karşılaştırmalı Edebiyat: Tanım, Yöntem ve İncelemeler”, *Türkiye Araştırmaları Dergisi*, İstanbul, 2006, C.4, h.8, , r. 332

¹⁰ A.M. Rousseau-CI. Pichois, *Karşılaştırmalı Edebiyat*, Çeviren: Mehmet Yazgan, Milli Eğitim Bakanlığı Yayınları, İstanbul, 1994, r. 26

¹¹ Tieghem, h.b., r. 57

¹² Kefeli, h.g., r. 332

¹³ Aytaç, h.b., r. 33

sala 1827an de Abel-François Villemain (1790- 1870) di dersên xwe yê li zanîngeha Sorbonê de ev têgeh bi kar anîye. Ji sala 1930î ve ev têgeh bûye navê gelek berheman.¹⁴ Villemain di sala 1942an de bi navê *Dîroka Wêjeya Berawirdî* pirtûkeke çap dike. Ampère (1800-1864) piştî di Collège da Franceyê dibe profesor bi dersên xwe yê li ser wêjeya berawirdî dibe pêşengê vî karî. Li ser binyada ku wan dabû destpêkirin Philarete Charles (1798-1873) jî di sala 1835an de bi navê *Litterature Strangère Comparée* dersek daye û naveroka vê dersê di *Reveu da Parisê* de weşîyaye. Di Ekola Fransîzî de Ampère, Willeman û Charles wekî pêşengê wêjeya berawirdî tên hesibandin.¹⁵

Li Fransayê xebatên zanista wêjeya berawirdî li gor Almaniyayê biîstîqrartir bûye. Joseph Texte ku li Zanîngeha Lyonê de profesorê wêjeya berawirdî ye, helwesteke cuda bi kar tîne, di destpêkê de derheqê tesîra wêjeya almanan a li ser wêjeya fransîzan dersê dide. Ev ders dibin bingeha xebatên wêjeya berawirdî. Fransa welatê yekemîn e ku di zanîngehên xwe de bi awayekî fermî cih dide vê qadê.¹⁶ Di sedsala 19an de zêdebûna dersên wêjeya berawirdî dike ku xwendevan bibînin ka edebîyata fransîzî di bin kîjan bandoran de pêş ve çûye. Di heman demê de xwendevanan derfeta berawirdkirina wêjeya xwe û yê din, tespîtîkirina wekhewî û cudahiyan wan dîtine û pêşveçûna cûreyên edebî şopandine. Babetên ku lêkolînên edebîyata berawirdî li ser radiwestîyan meseleyên çavkanî û tesîrdêrî bûn. Paul Van Tieghem (1871-1948) di sala 1931î de rêbaza lêkolînerên ku di qada berawirdî de dixebitin, weke “sêwirandina derbasî/derbasbûyînê” (geçîşi betimlemek/décrire un passage) dinavîne. Salên 1930î ew salên heyatî yê lûtkeyê ne ku xebatên bi vî rengî zêde bûne. Berhema bi navê *La Littérature Comparée* (1931) ya Van Tieghem yek ji çavkanîya sereke ya vê qadê ye.¹⁷

Di nîveka sedsala 19. de Fransaya ku xwedîyê mêtîngehîyên xurt û ligel vê aborîyeka xurt bû, dest bi endustîrbûnê kiribû û bawerîya wê bi ziman û çanda wê hebû, ji ber ku wêjeya berawirdî weke danûstandineke çandî ya navneteweyî û transfereke çandî didît, teorîya “vekolînên tesîrdêrîyê” anîye nava wêjeya berawirdî.

¹⁴ Tieghem, *h.b.*, r. 39

¹⁵ A.M. Rousseau-CI. Pichois, *h.b.*, r. 22

¹⁶ Aytac, *h.b.*, r.54-55

¹⁷ Kefeli, *h.g.*, r. 335

Ev ekoleke wisa ye ku ewilî raber dike bê ka wêje û çand çawa tesîrê li hev dikin û digel vê ji ber ku bêtir çanda xwe û edebîyata xwe berz û bala dibîne xwe weke daner û yên din jî weke hilgir dibîne.¹⁸ Bi gotineke din nûnerên ekola fransîz di wê bawerîyê de ne ku gelên serdest û xurt li ser wêjeyên gelên bindest tesîr dikin.

1.2. Ekola Wêjeya Berawirdî ya Almanî

Ev ekoleke wisa ye ku ji ber ku endamên heman neteweyê di coxrafyayên cuda de dijîn bêtir li gorî agahîyên nijadî kar dike. Ekola Almanî di serî de berawirdkirina sonatên lîrîk pêş dibîne. Di vê ekola ku xwe dispêre danûstandina çandî ya mirovên ku du dewletên cuda lê bi heman zimanî diaxivin û tesîra wê lêdikolin, ruh û rewşa millî desthil e. Ev ekola ku di qonaxa duyem de berê xwe bi temamî vediguhezîne kokên xwe û tê de hestên neteweyî peyda dibin, di dewra Hîtler de -ku netewperestî digihîje lûtkeyan- dikeve nava ketûmîyekê. Hetta wî çaxî edebîyatên din jî tene qedexekirinê. Dema ku rewş wiha bûye heta nîveka sedsala 20an li Ewropayê ekola fransîz bi tena serê xwe desthil bûye.¹⁹

Li Almanyayê bi nûnerê fikrên pre-romatîk Herder (1744- 1803) ve fikrên nû belav dibin ku xwe dispêrin cudahîyên neteweyan.²⁰ Li pey şopa Herder'ê helbestvan û zanyar, ji dîrokeke giştî ya edebîyatê (Allgemeine Literaturgeschichte) re hesretekê zîl daye lê ji ber ku bi qebûldîtina "Germanistik" ê (bo wêje û zimanê Almanî) ya weke şaxekê ve netewetî derketîye pêş, ew dîroka wêjeya berawirdî ya giştî encax di nîveka duyem a sedsala 19an de pêk hatîye.²¹

Di dîroka wêjeya almanî de, di nav kesên ku wekî pêşengê wêjeya berawirdî tîrî hesibandin navê Goethe di serî de tê. Berhema Goethe ya bi navê *Anatomîya Berawirdî* ku di sala 1795an de hatîye nivîsandin ji bo destpêka wêjeya berawirdî girîng e.²² Madam da Steal (1776-1817) ku di sedsala 18an de wekî tekane hunermendê romanê û teorîsyenê wêjeyê tîrî hesibandin, bi xebatên xwe balê dikişîne. Ew di navbera wêjeya berawirdî û zanista wêjeya berawirdî de bûye pireyek. Steal bi

¹⁸ Mesut Tekşan, *Karşılaştırmalı Edebiyat Bilimi*, Kriter Yayınları, İstanbul, 2011, r. 89-90

¹⁹ Tekşan, *h.b.*, r. 91

²⁰ Tieghem, *h.b.*, r. 44

²¹ Aytaç, *h.b.*, r. 52

²² Tekşan, *h.b.*, r. 32-33

berhema xwe ya mezin a bi navê *De L'Allemagne (Derbarê Almanayê de)* de wêjeya almanan bi şiklekî balkêş bi fransizan dide nasîn.²³

Di nîveka ewil a sedsala 19an de jî hin dîroknasên edebîyatê di qada edebîyata berawirdî de xebatên piçûk dikin. Kesên wek; Birayên Schlegel, Eichorn (1752-1827), Bouterweck (1766-1828) pronivîsa tesîrên sereke çêdikin û hin mijarên navneteweyî tomar dikin.²⁴

Berî şerê cîhanê yê yekem li Almanayê ceribandîna li ser zanista wêjeya berawirdî bê encam mane. Dûrmayîna Wilhelm Wetz (1858-1910) û Louis Paul Betz (1861-1904) a jî vê qadê wekî sedema vê meseleyê tê dîtin ku ew di qada wêjeya berawirdî de nav pêşengan de dihatin hesibandin. Herwiha heta dawîya şerê cîhanê yê duyem jî ber zêdebûna fikrên neteweperwerîyê li Almanayê bicîhbûna wêjeya berawirdî bûye zehmet. Bi xîreta penaberên polîtîk ku piştî şer vegerîyane welatê xwe ji nû ve derdikeve holê. Friedrich Hirt (1845-1927) jî bûye damezrînerê enstîtuya wêjeya berawirdî ya ewil.²⁵ Di navbera salên 1870 û 1880an de hin nivîsar û nivîsên destpêkê li ser teorî û metodolojîya wêjeya berawirdî li Almanayê belav dibin.²⁶

Îro li Almanayê di 20an zêdetir zanîngehan de dersên wêjeya berawirdî tên dayîn. Gavên ewil piştî şerê duyem a cîhanê di zanîngehên Mainz û Saarbrücken de hatîye avêtin ku ji bo xurtkirina polîtîkaya aştîyane ya di navbera almanan û cîranên wan ên rojavayî de destpêkiriye. Di qada wêjeyê de berawirdkirinên ewil li ser têkilîyên alman û fransizan ve dest pê kirîye û piştî bi giştî li ser romanîstîk, wêjeya antîk û wêjeya antîk ya Ewropayê tesîr kirîye.²⁷

1.3. Ekola Wêjeya Berawirdî ya Amerîkî

Li Amerîkayê xebatên zanista wêjeya berawirdî wekî çalakîyên ferdî derketîye holê. Paşê eleqeya li ser vê qadê zêde dibe û lêkolînên li ser wejeyên navneteweyî dikarin hebûna xwe bidomînin. Hebûna zemînekî bi vî rengî kirîye ku di salên şerê

²³ Tieghem, *h.b.*, r. 47

²⁴ Tieghem, *h.b.*, r. 47

²⁵ Aytaç, *h.b.*, r. 56

²⁶ Tieghem, *h.b.*, r. 55

²⁷ Aytaç, *h.b.*, r. 60

cîhanê yê duyem de xebatên li ser wêjeya berawirdî bileztir bibin. Kursîyên ewil ên zanista wêjeya berawirdî di sala 1890an de li Harvardê û 1899an de li Colombiyayê de ava bûye.²⁸ Charles Mills Gayley (1858-1932) yek ji damezrênerê ekola amerîkî ye di wê fikrê de ye ku divê xebatên wêjeya berawirdî bi awayekî pirzanistî (interdisipliner) bibe û armanca wî ew e ku felsefeyê wêjeyî derxîne holê. Ekola amerîkî, wêjeya berawirdî wekî têgeheke pirzanistî û gerdûnî raber dikin ku xwe ji netewperwerî û cudahiyan zimanî dûr xistiye. Ev têgeha “sentez” ku li gor avanîya sosyopolîtîk a amerîkî ye, di nîveka duyem a sedsala 20an de ji aliyê ekola wêjeya berawirdî ya Welatê Cihana Sêyemîn ve hatiye hilweşandin.²⁹

Piştî şerê cîhanê yê duyem Amerîka bûye cenneta komparatîstîkê. Du sedemên sereke di vir de xwedîrol in; binyada kozmopolît a Amerîkayê û sitarbûna gelek edebîyatnasên fransîz û alman ku di wextê şer de hatine Amerîkayê. Van kesan Formalîzma Rûsyayê û metodên lêkolînên şeweyê yên Almanyayê anîne Amerîkayê. René Wellek’ê ku di salên 1940î ji Çekoslovakyayê koç kirîye û bi çanda zimanzanîya Prag’ê pijîyaye, dibe nûnerê dildar ê nû yê komparatîstîkê. Rexneyên René Wellek ên ku bo ekola komparatîstîk a fransîz ji bo platforma navneteweyî ya zanista wêjeya berawirdî dibe liv û tevgereke bihêz. Ev rexneyana di wesfeke wisa de ne ku dikarin bi serê xwe ekolekê biafirînin, dij-bereya ekola fransîz jî bi vî awayî pêk tê.³⁰

Wellek li şûna têgeha edebîyata serbixwe û neteweyî ya fransîzan têgihiştina “tifaqa afirînerîya edebî ya giştî, qet nebe tifaqa afirînerîya rojava” serdest dikir. Bi vî awayî jî sînoren ku fransîzan di nava wêjeyên neteweyî de didît, nas nedikir. Ji ber wê li gorî wî ya herî baş ew bû ku meriv di lêkolînan de edebîyatê weke perçeyê tam bibîne. Wî digot çawa ku di zanîngehan de profesorê felsefeyê heye û nabe ku meriv bibe profesorê felsefeya almanî û fransîzî bi heman awayî di qada wêjeyê de jî nabe ku meriv bibe Profesorê wêjeya almanî û fransîzî, encax meriv bikaribe bibe profesorê zanista edebîyatê. Di nava vê pêwendê de hewcehiya ji nû ve nasandina komparatîstîkê dizê. Jixwe li gorî Wellek ev têgeh têgeheke bêsiûd e.³¹

²⁸ Aytaç, *h.b.*, r. 56

²⁹ Tekşan, *h.b.*, r. 92

³⁰ Aytaç, *h.b.*, r. 79-81

³¹ René Wellek, “Karşılaştırmalı Edebiyatın Krizi”, Çeviren: Sıddık Yüksel, *Dinbilimleri Akademik Araştırma Dergisi*, c.7, h. 1, 2007, r. 248

Ger em li kurtedîroka komparatîstîkê binêrin em ê bibinin komparatîstên ewil di wê meylê de bûn ku qadên derveyî wêjeyê jî têkîlî branşê bikin, ji wan sûdê werbigrin û bi pirzanîstî bixebitin. Wekî mînak em dikarin behsa F. W. Chander bikin ku di nivîsara wî ya ku di sala 1910an da weşîyaye, wêjeya berawirdî wekî amadekarê derûnnasî û civaknasîya berawirdî dibîne. Ev meyl çawa ku di salên navbera du şeran da hatibe parastin piştî wan salan jî hatîye parastin. Rexneyên Wellek ên li ser vê mijara wêjeyeke yekpare deng vedaye, ji alîyekî ve şoreş e. Lê belê vê nêrîna wî dabû destpêkirin ku komparatîsta amerîkî û fransîzî ji hev vediqetand, ji xwe re bergirên xurt nedîtîye. Îro komparatîstîk di xizmeta sepînerên her du ekolan de ye.³²

1.4.Ekola Wêjeya Berawirdî ya Welatên Cîhana Sêyem

Di pêwenda sosyolojîk de ev welatên ku weke Welatên Cîhana Sêyem têne nasînê, welatên dagirbûyî (Kolonial) ne ku serxwebûna xwe bi dû re bi dest xistine. Têgeha “Welatên Cîhana Sêyem” cara ewil di sala 1952an de ji alîyê zanyarê fransîz Alfred Sauvy ve hatîye bikaranîn. Ev metoda berawirdkirinê ya ku van welatan pêş xistîye di esasê xwe de metodeke wisa ye ku xwe dispêre bertekê. Ev welatên ku weke cîhana sêyem têne nasînê ku zemanekî kolonîyên Fransa û Îngîlistanê bûn çawa ku qebûl dikin van dewletên ku welatê wan dagir kirine tesîr li çand û berhemên wan ên edebî kirine, di heman demê de îddîa dikin ku wan jî tesîr li edebîyatên wan kirine. Li gorî wan tesîrdêrî yek-alî çênebûye berovajî wê du-alî bûye. Ev welatana çawa ku qîmetê didin lêkolînên li ser wê yeka ku ji welatên kolonyal çî girtine di heman demê de qîmetê didin wê yekê ku gelo çî tişt dane çand û edebîyata wan welatan (çand û edebîyata efendîyên xwe). Ev welatên mesele li ser wan e bi vê helwestê çawa ku ji alîyekî ve sûcdarîyên li ser xwe yên weke bêtûrî û teqlîdkerîyê dibersivînin ji alîyê din ve dixwazin dewlemendîya xwe ya edebî bibînin, xwe nas bikin û bawerîyê bi xwe bînin û jê zêdetir dixwazin serxwebûnîya xwe qewîtir bikin. Wexta ku berhemên serkeftî yên din tên vekolînê tê dîtin ku berhem ji alîyê mijar, çîroksazî, hêmayên şiklî yan jî motîfê ve dişibin hev. Ev jî wê yekê eşkere dike ku edebîyatên neteweyî bi qasî ku tê zanînê di rûnê netewî de naqijilin û tê de gelek tesîr hene. Di lêkolînên bi vî awayî de ya girîng ew e ku kî çiqasî di tesîra kê de maye. Ji bo zanîna vê divê edebîyatên mehelî jî bêne vekolînê. Prensîbên vê ekolê ne ji wê cûreyê ne ku ekola

³² Aytaç, h.b., r. 89

fransiz û alman wan qebûl ke. Lê dema ku meriv dêhna xwe bide tesîrên di berhemana de wê pê bihese ku ev yek çiqasî licih e.³³

Wêjeya berawirdî ku wekî çavkanîyekî dîroka wêjeyê dihûndirîne û dewlemend dike, di serdema ku romantîzm û lîberalîzm li Ewropayê bi bandor bûne, pêş ve çûye. Wê taybetîya xwe diparêze ku di her serdemê de ji çand û wêjeyên cuda re dibe pace. Di nîveka ewil a sedsala 20an de bi metodên lêkolînên zanistî û îmkânên teknolojîya ku hîn jî pêş dikeve sûdê werdigire, xwe pêş ve dibe. Têgeha wêjeya berawirdî ku di destpêkê de wekî berawirdkirina du wêje an jî du çandên cuda dihat wesfandin, êdî wekî qadeke navdîsîplînî tê qebûlkirin ku têkilîya di navbera şaxên zanist û hunerên wekî derûnnasî, civaknasî, felsefe, dîrok, muzîk, fotograf û hwd. xurtir û berfirehtir kirîye.³⁴

1.5. Ekola Wêjeya Berawirdî ya Marksîst

Marksîzm nêrîneke cîhanî ye ku li ser hemû layên jîyanê tesîr dike û bi nêrîneke îdeolojîk tevdigere. Ev nêrîna marksîst a ku xwe dispêre pevçûnên çînî di qadên têvel ên edebîyatê de hatiye bikaranîn û berhem û bûyerên edebî jî bi vê pêwendê hatine nirxandin. Vê yekê kirîye ku estetîkeke nû ya bi navê *teorîya marksîst a edebî* derkeve holê. Li gor vê êkolê huner (bi taybetî edebîyat) li gor bûyerên civakî û aborîyê teşe digire. Li welatên ku nêrîna marksîzmê desthil e, bi taybetî li Yekîtiya Sovyetê de li gor paralelîya vê fikrê meriv dikare behsa ekoleke bi vî rengî bike.³⁵

V. Jirmunskiy ê ku giregirê komparatîsta Yekîtiya Sovyetê ye li ser wê diyardeyê radiweste ku hemû edebîyatên Ewropî de bizavên wêjeyî ên hevpar û meylên şêwazî bi heman rêzê derketine holê. Li gor V.M. Jirmunskiy (1891-1971) derketina bizavên wekî Ronesans, Barok, Klasîsîzm, Romantîzm, Realîzm, Natûralîzm, Modernîzm û Realîzma Sosyalîst ku bi pêşveçûnên civakî re hevterîb in nabe ku ev balanseke tesadûf be. Di vê meseleyê de hêmana diyarker pêşveçûnên civakî ên hevpar in ku di nav gelên berbehs de diqewimin. Herwiha Jirmunskiy di pirtûka xwe ya bi navê *Lêkolînên Serdema ên Berawirdî* (1961) de bi berfirehî cih

³³ Tekşan, *h.b.*, r. 95-96

³⁴ Kefeli, *h.g.*, r. 337

³⁵ Tekşan, *h.b.*, r. 96

dide vê nêrîna xwe û li ser afirandina berhemên hevpar ên di nav gelên cuda de radiweste ku ev vê hevparîyê bi wekhevîya binyadên civakan ve girê dide: Wekî pêşveçûna destanê di nav civakên feodal de.³⁶

Marksîstên rojavayî vê nêrîna Sirmunskiy wekî hêsanîkirineke zêde wesfandine û senifandinên wekhev ên Lukacs jî nepejirandine. Lê tesîra nêrînên teorîsyenê amerîkî F. Jameson di vê êkolê de bi cih bûye. Jameson têgeha totalîterîya cîvakî (toplumsal bütüncüllük kavramı) qebûl dike û li gor wî jî hêmana diyarîker a vê meseleyê rewşa têkîliyên hilberînê ye.³⁷

“Xala bingeşîn a lêkolînerê ew e ku berê wî derve be, divê berawirdêr her ku rastî wê sînore ku çandan ji hev vediqetîne hat, bergeheka wisa tespît bike ku bi pozîsyona mijara ku vedikole re guncav be. Berawirdkirin ji alîyekî ve tê wê wateyê ku meriv rastî “ya din” bê û bi wê bihese. Lazim e ku vekoler di vê lêkolînê de ku ji qonaxên “xwenasîn”, “yê din nasîn” û tespîta “nasîna cudahî/hevşibîn” ê pêk tê bi “xwe” û “yên din” ve bi berdewamî di nava têkîliyê de be. Dema pêwendîyên di nava edebîyatan tê lêkolîn divê meriv hay ji van xalan hebe; ev danûstandin çawa diqewime, çi tê girtin, çi tê dayînê, fikr/ mijar/ teknîk an jî cûre di edebîyata miletekî din de reaksiyoneke çawa pêk tîne, çawa pêş diçe û ji kîjan guherînan derbas dibe.”³⁸

“Bi kurtî tişta ku ji edebîyata berawirdî tê payîn; metneke edebî ji du alîyan ve; ji alîyê poetîka û retorîkê ve heta ku jê tê pîralî vekole. Vekolîna ji hêla poetîkayê tê wê wateyê ku divê van xalan derxîne holê; 1- hunerên gotinî, 2- bê ka ew metna edebî di nav kîjan cûreyan de diheve, 3-gelo ew metn divê kanona edebî ya ku lê diheve da di kîjan astê da ye, yanê dema ku bi metnên nivîskî yên berî xwe ve tê muqayesekirinê alîyên hevpar û cûda derîne. Vekolandina retorîk jî nîyet dike ku derxîne holê bê ka ev tekst kîjan îdeolojî, epîstemolojî û psîkolojîyeke çawa dihundirîne, di nav têkîliyên hêzî yên çanda xwe de cihê wê çi ye, bi kêmasî û bêdengîyên xwe ve îşaretên derbîrêkî kolektîf û ferdî yê çawa dide, bi kurtî ji kîjan alîyan ve piştgirîyê dide çanda xwe û ji kîjan alîyan ve li hemberî çanda xwe derdikeve.”³⁹

³⁶ Aytaç, *h.b.*, r. 78-79

³⁷ Aytaç, *h.b.*, r. 79

³⁸ Kefeli, *h.g.*, r. 338

³⁹ Murat Belge, “Karşılaştırmalı Edebiyat”, *Notos Dergisi*, h.73, İstanbul Aralık 2018- Ocak 2019, r.41

1.6. Wêjeya Berawirdî di Edebîyata Tirkî de

Tirk di pevajoja dîrokî de ji ber rewşên siyasî û coğrafîk bi gelek miletan re di nav pêwendîyê de bûne. Wekî ku tê zanîn împaratorîya osmanî di bin sîwana xwe de gelek millet hewandine. Ji ber vê kozmopolîtîbûna xwe jî ziman û çanda van miletan nas kirine û di bin tesîra wan de mane. Bi demê re tesîra van pêwendîyan di qada hunerê de jî derdikeve holê. Di qada wêjeyê de divê em berê behsa serdema wêjeya klasîk a tirkî bikin ku di vê serdemê de bi tesîra çanda îslamîyetê ve ziman û wêjeya erebî û farisî li ser wêjeya tirkî desthil bûye. Bi encama vê tesîrê ve jî awayên nezmê yên mesnewî û qesîdeyê, kêşeya erûzê ketîye nav edebîyata tirkî. Di sedsala 13an de di nav osmanîyan de ji nivîsên fermî bi zimanê farisî dihat bikaranîn û di heman demê de zimanê wêjeyê jî farisî bû.⁴⁰ Ji ber vê sedemê wêjevanên wê serdemê jî zêdetir qîmet dane wêjeya farisî û berhemên xwe bi farisî nivîsandine.

Edebîyata tirkî ya modern di Serdema Tanzîmatê (1860-1895) de berê xwe dide wêjeyên ewropî, bi taybetî jî wêjeya frensî. Helbestvan û nivîskarên wê serdemê di bin tesîra wêjeyên bîyanî de cureyên nû yên edebî dinasin û gelek berhemên bîyanî werdigerînin tirkî. Wekî klasîkên frensî, almanî, îngîlîzî klasîkên rûsî jî li ser wêjeya tirkî bi bandor bûne. Nâzım Hikmet jî wekî nûnerekî wê serdemê di nivîsên xwe de gelek caran him navên nivîskarên rûsî yên wekî; Dostoyevski, Meyerhold, Gogol, Puşkin bi bîr tîne him jî li ser wan difikire û şiroveyan dike.⁴¹ Bi rêya wergerên wê serdemê tesîreke pirhêlî li ser wêjeya tirkî çêbûye. Tê dîtin ku wêjeya tirkî di serdema klasîk de derîyên xwe ji erebî û farisî re, di serdema modern de jî ji wêjeyên ewropî re vekirîye. Yanî tesîra li ser wêjeya tirkî ji rojhilat arasteyî rojavayê bûye û taybetmendîyên van serdeman jî rê li ber xebatên berawirdî vekirine.

Xebatên ewil ên li ser wêjeya berawirdî ji ber problemên berdewamîyê li Tirkîyeyê bi cih nebûye. Em dikarin bibêjin ku li Tirkîyeyê edebiyata berawirdî bi rêya xebatên zanîngehan ve pêş ketîye. Li gor saloxên İnci Enginün li Tirkîyeyê cara ewil di Zanîngeha İstanbulê de di beşa ziman û wêjeya frensî de di nabeza salên 1943-1969an de Cevdet Perin dersên wêjeya berawirdî dide. Ji ber ku ev dersên Perin li derveyî beşa

⁴⁰ Adnan Karaismailoğlu, “Tarih Boyunca Türkler ve Farsça: Modern Yaklaşımlara Bir Eleştiri”, *Kırıkkale Üniversitesi Sosyal Bilimler Enstitüsü Dergisi*, c.3, h.1, Ocak 2013, r. 6

⁴¹ Aytaç, h.b., r. 37

ziman û wêjeya tirkî hatine dayîn û divê girêdayî vê beşê bibûya, dewam nekirîye. Herçiqas piştî sala 1964an di Zanîngeha Stenbolê de di beşa ziman û wêjeya tirkî de li ser wêjeya berawirdî tezên doktorayê hatibin amadekirin û dersên wêjeya berawirdî di asta lîsansê de cih girtibe jî berdar nebûye. Ji ber vê sedemê jî xebatên wêjeya berawirdî ku ji bo edebîyata tirkî cihekî girîng digirt hema bêje di nav hemû beşan de hatîye girtin.⁴² Gürsel Aytaç jî vê agahîyê piştrast dike û dibêje dersên wêjeya berawirdî cara ewil di salên 1943 û 1960an de di zanîngeha Stenbolê de beşa ziman û wêjeya frensî de hatine dayîn. Lê cara ewil bi awayekî zanistî di Zanîngeha Ankarayê de di makezanista filolojîyê de tezên lîsans, master û doktorayê de xebatên berawirdî hatine kirin û ev xebat bi gelemperî di navbera wêjeyên bîyanî û ya tirkî de bûne.⁴³

Piştî van xebatên ewil, îro di gelek zanîngehan de di asta lîsans û masterê de dersên wêjeya berawirdî tên dayîn û gelek tezên lîsans û masterê jî tên amadekirin. Di hin zanîngehan de jî beşên wêjeya berawirdî vebûne. Di sala 1996an de Zanîngeha İstanbul Bilgiyê beşa wêjeya berawirdî vekirîye û di sala 2002an de jî di Zanîngeha Osmangaziyê de beşa wêjeya berawirdî vebûye.⁴⁴ Dîsa di Zanîngehên Selçuk û Dokuz Eylülê de jî beşên wêjeya berawirdî hene û di Zanînga Koç de jî dersên wêjeya berawirdî cih digirin. Di binasazîya van Zanîngehan de heta niha heft sempozyumên wêjeya berawirdî pêk hatine û ya heştam jî wê di tarîxa 20-21 Kewçêr 2021an de li Zanîngeha Dokuz Eylülê de pêk were. Ji xeynî van xebatan di Uluslararası İmgebilim Sempozyumu (Sempozyûma İmajzanî ya Navneteweyî) (2004), Kıbrıs-Balkanlar-Avrasya-Türk Edebiyatları Kurumları Sempozyumu (KİBATEK) (Sempozyûma Sazîya Wêjeyên Tirkî ya Kıbrıs, Balkan, Avrasya), Germanistik Sempozyumları (Sempozyûmên Germanîstîkê) û gelek sempozyûmên din de bi dehan xebatên berawirdî hatine pêşkêş kirin.⁴⁵

Li Tirkîyeyê pîranîya berhemên ewil ên li ser wêjeya berawirdî bi rêya wergerê derketine holê. Di sala 1943an Şerif Çelikel berhema Paul Van Tieghem a bi navê La Littérature Comparée (Mukayeseli Edebiyat) wergerandîye tirkî. Ev berhem li ser

⁴² İnci Engünün, *Mukayeseli Edebiyat*, Dergâh Yayınları, 1999, İstanbul, r. 17-18

⁴³ Aytaç, *h.b.*, r. 65

⁴⁴ Tekşan, *h.b.*, r. 58

⁴⁵ Ali Gültekin- Betül Üyümez, "Türkiye'de Karşılaştırmalı Edebiyat Çalışmaları", *Alman Dili ve Edebiyatı Dergisi*, h.20, 2008, r. 38

pênaseya dîrok û rêbaza wêjeya berawirdî hatîye nivîsîn û ji bo nasîna wêjeya berawirdî berhemake girîng e. Herwiha berhemên A.M. Rousseau-CI. Pichois û ya René Wellek-Austin Warren yên li ser wêjeya berawirdî jî hatine wergerandin. Dîsa di navbera salên 1946-1974an de Cemil Meriç jî di bin sîwana Zanîngeha Îstanbulê de bi hewl û xebatên xwe (1916-1987) di pêşketina wêjeya berawirdî de roleke girîng gêraye. Ji ber ku Cemil Meriç di dewra cîmhûriyetê de rojhilat û rojhilata dûr tevî vebûna derveyî ya rojava-desthil kirîye di nav amadekarên zanista wêjeya berawirdî ya tirkîyeyê de xwedî cihekî bijartî ye. Bi vî awayî em dikarin Cemil Meriç di nuqtaya fikrên wî de weke tespîtîkirin û nîşadêriyê weke pêşengekî bifikirin. Bi taybetî di berhema wî ya bi navê Kırık Ambarê (1980) de mijarên ku li ser sekinîye him sînorên edebiyata giştî him jî sînorên edebiyata berawirdî nîşan dide. Ji xeynî vê yekê Cemil Meriç Asya û Rojhilata dûr jî tevî hereketa vebûna derveyî ya navend-ewropî ya edebiyata tirkî kirîye.⁴⁶ Herwiha kesên wekî İnci Enginün, Zeynep Kerman, Gürsel Aytaç, Emel Kefeli, Kâmil Aydın û gelek kesên din li ser wêjeya berawirdî xebitîne û xebatên li ser vê qadê her roj zêdetir dibin.

1.7. Wêjeya Berawirdî di Edebîyata Kurdî de

Wekî ku tê zanîn ji bo wêjeya berawirdî danberheva du berhemên esas e ku wekhevî, cudahî û tesîrên di navbera berhemên de derdixîne holê. Ger em bi vê peywendê li wêjeya kurdî binêrin tê dîtîn ku kurd jî ber rewşa xwe ya politîk û coxrafîk jî gelek hêlan ve bi mîletên din re di nav danûstandinê de ne ku çand û zimanên van mîletan jî ji nêz ve dinasin. Ji ber ku kurd di bin desthilatdarîya gelên cuda de dijîn û perwerdehiyê jî bi zimanên bîyanî digirin ji bo wan nasîn û hînbûna van çand û zimanan rewşeke jêneger e. Ji ber van têkîlîyan jî di edebîyata kurdî de him jî hêla naverokê ve û him jî hêla şiklî ve tesîrên wêjeyên din tên dîtîn

Ji bo vê tesîra di navbera wêjeyan de em dikarin bo nimûne behsa wêjeya klasîk bikin. Lewra jêderên vê edebîyatê jî bo xebatên edebîyata berawirdî nimûneyên baş didin me. Di nav gelên rojhilata navîn de cure û naverokên wêjeya klasîk de hevparîyek heye û di edebîyata kurdî de jî ev yekîtî tê dîtîn. Ji bilî naverok û cureyan

⁴⁶ Ertuğrul Aydın, “Türkiyedeki Karşılaştırmalı Edebiyat Çalışmaları”, *Rumelide Dil ve Edebiyat araştırmaları Dergisi*, h.17. 2019, r. 151

tê dîtîn ku peyvên zimanên bîyanî jî ketine di nav wêjeya kurdî ku di gelek berhemên klasîk de peyvên farisî û erebî cih girtine. Ev hemû nîşaneya wê yekê ye ku helbestvan û nivîskarên kurd hay ji wêjeyên gelên din hene û bi wan wêjeyan re ketine nav danûstandinan. Ev çarîna Melayê Cizîrî (1570-1640) ya li jêr jî nîşan dide ku helbestvanên me yên klasîk hay ji wêjeyên derdora xwe hene û di helbestên xwe de jî cih dane wan zimanan ku em dikarin vê mînakê wekî xebateke danberhevî binirxînin;

Me ra j' ewwel çî bir xamî kişand axir bi bednamî

Ji rengê Se'dî û Camî ji şuhret pê hisîn 'amî

Bi deng û bang û awazê dibêjit nexmeya sazî

*Nihan key maned en razê k'ez o sazendi mehfilha*⁴⁷

Dîsa Mela di hebesteke xwe de jî hunera xwe bi şairê navdar Şîrazî re muqayese dike û dibêje:

“Ger lûlûyê mensûr ji nezmê tu dixwazî

Der şîirê Mele bin, te bi Şîrazî çî Hacet”⁴⁸

Tê zanîn ku li rojhilat di dewra edebîyata klasîk de helbesta Farisî di rewacê ye û bi taybetî jî helbestên Şîrazî lûtkeya wê helbestê ye. Ji bo helbesta klasîk berî li Farisî û helbesta Farisî ye.⁴⁹ Mela jî di van risteyan de ji vê yekê gazindan dike, ew zimanê kurdî û hunera xwe bi ya farisan ve muqayese dike û dide zanîn ku kurdî jî têra huner û edebîyatê dike.

Ji bo xebata me nîmûneyên ji edebîyata klasîk ên bi vî rengî zêde ne. Dîsa em dikarin behsa wêjeya modern jî bikin ku bi rêya wergerê edebîyata kurdî derîyê xwe ji edebîyatên bîyanî re vedike û cureyên wekî kovar, roman, rojname li edebîyata kurdî zêde dibin. Em ê agahîyên berfirehtir di binbeşa wergerê de bidin, ji ber vê sedemê jî ne hewce ye ku em dubare behsa van nîmûneyan bikin. Herwiha ji xeynî cure û

⁴⁷ Melayê Cizîrî, *Dîwan*, Weşanên Avesta, Stembol, 2012, r. 24

⁴⁸ Cizîrî, *h.b.*, r. 10

⁴⁹ Îrfan Amîda, *Qonaxeke Modernîzma Kurdî/ Helbesta Tîrêjê*, Weşanên Lîs, Diyarbakır, 20016, r. 61

naverokan gelek ekolên nû yên wekî romantîzm, marksîzm, postmodernîzm jî li gor serdeman û bi têkîlîyên wêjeyên bîyanî ve tên nasîn.

Weki ku tê dîtin wêjeya kurdî ji bo xebatên zanista wêjeya berawirdî qadeke guncav e û gelek keresteyan jî raberî van xebatan dike. Lê her çiqas edebîyata kurdî ji bo van xebatan qadeke guncav be jî zanista wêjeya berawirdî di edebîyata kurdî de hîn nû tên nasîn. Li gor lêkolînên me di kurdî/kurmancî (li bakur) de berhemeke xwerû ya li ser teorîyên wêjeya berawirdî hatibe nivîsîn tune ye. Lê îro gelek gotar hene ku bi rêbaza berawirdî hatine nivîsîn û di kovarên wekî; Nûbihar Akademî, Zarema, Wêje û Rexne, Mukaddime, Derwaze û hwd. de çap bûne. Di malperên wekî Dergîpark û Akademiayê de jî gotar hatine weşandin. Dîsa di Sempozyûma Edebîyata Berawirdî: Ji Duh Heta Îro di Edebîyatên Tirkî û Kurdî de Texeyûlên Nasnameyî (Bi hevparîya Zanîngeha Mardin Artuklu û Zanîngeha Boğaziçi, 2015) û Sempozyûma Navneteweyî Ya Çanda Dengbêjîyê û Dengbêjan (Zanîngeha Şirnexê 2019) de gelek gotarên berawirdî hatine pêşkêşkirin. Herwiha ji xeynî van xebatan di sala 2013an de li Amedê bi hevkarîya Navenda Hunerê ya Amedê û Weşanxaneya Lîsê rojên wêjeya berawirdî hatine li darxistin, di adara 2020an de jî li Stenbolê di Koma Xwendinê ya Weqfa İsmail Beşikçi de bo 11 hefteyan bernameyên xwendina berawirdî hatine lidarxistin.

Ji bo xebatên wêjeya berawirdî divê em bi taybetî behsa xebatên kurdolojîyê bikin ku gelek xebatên berawirdî bi keda kurdolojîyê jî derketine holê. Her çiqas wêjeya berawirdî di nava xebatên kurdî de hîn nû hatibe nasîn jî îro di zanîngehan de dersên wêjeya berawirdî tên dayîn. Di zanîngehên Bîngol û Mûşê de di bin sîwana Enstîtuya Zimanên Zindî de di asta doktorayê de dersên wêjeya berawirdî tên dayîn. Dîsa Zanîngeha Bîngolê ji bo dersên Wêjeya Berawirdî serî li YÖK ê daye. Li gor xebatên me di bin sîwana kurdolojîyê de gelek tezên berawirdî hatine amadekirin. Ev tabloya li jêr li gor zanîngeh û salan hejmara tezên berawirdî nîşan dide:

Zanîngeh	2013	2014	2015	2016	2017	2018	2019	2020	Bî Giştî
Bîngol	-	1	1	-	3	1	2	-	8
Dicle	-	-	-	2	-	-	-	-	2

Mardîn Artuklu	3	5	4	2	4	4	11	-	33
Muş Alparslan	-	-	-	-	1	2	-	-	3
Yüzüncü Yıl	-	-	-	1	2	2	8	1	14

Di navbera salên 2013 û nîveka ewil a sala 2020an de, di kurdolojîyê de bi giştî 60 tez bi rêbaza berawirdî hatine amadekirin. Lê piranîya van xebatan di nav sînorên edebîyata kurdî de mane ku ev xebatên berawirdî yan di navbera zaravayên kurdî de yan jî di navbera cureyên edebîyata kurdî de hatine kirin. Wekî ku me berê jî gotibû zanista wêjeya berawirdî di gelek edebîyatan de hîn nû tê nasîn û edebîyata kurdî jî yek ji wan e, ji ber vê sedemê jî em dikarin bibêjin ku sedema sînorkirina van xebatan jî ev nûbûn e.

1.8. Di Wêjeya Berawirdî de Fonksîyana Wergerê

Werger pireyeke çandî ye ku di navbera civak û çandan de ragihandinê dike. Wekî ku Akşit Göktürk jî dibêje werger ji zimanê tek-tek wêdetir zimanekî hevpar e, zimanê zimanan e.⁵⁰ Werger wekî amûreke ku afirînerîyê û nûbûnê bidest dixe, li ser zimanê wergerê û wêjeya wî zimanî tesîr dike. Wergerên edebî paceyek e ku ji xwendevan, nivîskar û helbestvanan re asoyên nû vedike, wan bi dinyayên têvel re dinasîne. Wergera ku wekî cureyekî hunera şirovekirinê jî tê nîrxandin, di geşedana wêjeyên neteweyî de jî cihekî girîng digire. Her edebîyat bi rêya wergerê edebîyatên din nas dike û bi naskirinê ve xwe bi yên din re dide berhev, hevparî û cudahîyên xwe dibîne û xwe pêş ve dibe. Ji ber ku wêjeya berawirdî wekî qada xebatên navneteweyî tê qebûlkirin girîngî û fonksîyona wergerê jî jixweber derdikeve holê. Di edebîyata berawirdî de metnên ku tên berawirdkirin her tim bi heman zimanî nayên nivîsandin. Ji ber vê sedemê jî piranîya xebatên ku li ser berhemên zimanê bîyanî hatine kirin xwe dispêrin wergerê.

⁵⁰ Akşit Göktürk, *Çeviri: Dilllerin Dili*, Çağdaş yayınları, İstanbul, 1986, r. 15

Wergera ku dikeve qada zanista wêjeya berawirdî bêguman wergera edebî ye. Ji bo wêjeya berawirdî wergerên edebî girîng in. Helbet sedema xwendina berhemên wergerê ne tenê zimanên wan ên edebî ye, di heman demê de bi hevgirtina nîrxên ramanî re jî pêwendîdar e. Werger çand û kevneşopîya wêjeyê vediguhezîne çand û kevneşopîyêke din. Ji ber vê sedemê jî werger ji alîyekî ve ji wêjeya berawirdî re keresteyan peyda dike û ji alîyekî ve jî tesîrê li wê şîroveyê dike ku di berawirdê de diheve. Ji bo vê mijarê em dikarin behsa wergerên Rojen Barnas bikin ku wî di hejmara yekem a kovara Tîrêjê de helbesta Nâzım Hikmet a bi navê *Şarkılarımız* bi navê *Stranên Me* wergerandîye kurdî. Dîsa Barnas di hejmara sêyem a heman kovarê de bi xwe helbesteke bi navê *Stranên Me* nivîsandîye. Ev du nimune ji bo rola wergerê mînakên baş in, lewra bi me dide zanîn ku werger ji alîyekî ve keresteyan raberî vê qadê dike û ji alîyekî ve jî li ser têsîrderîye de jî roleke aktîf digêre.

Ji alîyekî din ve jî werger texlîdeke ji nû ve afirandinê ye, bi gotineke din werger metneke bi eslê re hevbiha dernaxîne, metneke nû derdixe holê ku bi gelek veguherînan ve girêdayî metna ewil e.⁵¹ Dîsa zanista wêjeya berawirdî afirandina wergerên edebî û belavbûna wan jî wekî mijara lêkolîneke girîng dibîne û li ser van xalan radiweste;

- 1- Gelo kîjan berhem tên wergrandin, krîterên hîlbijartina van berheman çi ne?
- 2- Wergerên edebî çawa çê dibin, sedemên xeletîyan çi ne, ev xeletî ji bo xebatên berawirdî delîl/serbendên bi çi awayî didin?⁵²

Wekî ku tê dîtin ev her du qad bi hev re têkildar in û werger ji bo edebîyata berawirdî zemîneke xebatê diafirîne û lazim e ku em di vê xebatê de beyî ku mijarê zêde belav bikin bi kurtî behsa dîroka çalakîya wergerê bikin.

⁵¹ Sandra Bermann, “Karşılaştırmalı Edebiyat ve Dünya Edebiyatı”, *Notos Dergisi*, h.73, İstanbul Aralık 2018- Ocak 2019, r. 33

⁵² Tieghem, *h.b.*, r. 231

1.8.1. Çalakîya Wergerê Li Cîhanê

Dema mirov berê xwe dide dîroka wergerê tê dîtin ku werger hebûna xwe dispêre demên kevnar. Li gor agahîyên berdest werger cara ewil di navbera êl û eşîrên cuda de bi awayekî devkî dest pê dike û yekem gotina li ser wergerê ya ku tê zanîn ji Misrê ye û nêzî 5000 salan kevn e.⁵³ Di dîroka wergera nivîskî de jî berhemên ewil xwe dispêrin B.Z. sedsala sêyemîn (Levhayên nivîskî yên naverok-dînî yên kevn ku Sumerî û Akadî ne). Bi hezaran salan digel metnên ku naveroka wan zanyarî û îdarî ne, wergera edebîyata dînî desthil bûye.⁵⁴ Dîsa peymaneke du zimanî ku di navbera firewnên Misirê û hîtîtiyan de hatîye îmzekirin wekî mînaka ewil a wergerê tê qebûlkirin û tê dîyarkirin ku di serayên firewnan de jî her tim wergêr hebûne.⁵⁵ Herwiha levhayên ji salên B.Z. 1200an mayî yên hîtîti û misirîya kevn jî ji bo ronîkirina nêzîkedayînen serdema xwe girîng in.⁵⁶

Di sedsala 4an de li heremên wekî Misir, Şam û Iraqê digel desthilatdariya Îskenderê Mezin çand û zimane yewnanî jî serdest e. Di sala 332an de li Îskenderîyeyê Medreseya Îskenderîyeyê vedibe û ev medrese dibe navenda çand û zanista yewnanan. Her çiqas li wir yewnanî bûbe zimanê burokrasî û serdestan jî gelê wir ji bo axaftina rojane zaravayên aramî bi kar anîne. Di nav zaravayên wê serdemê de zaravaya Rihayê jî hebûye û bi demê re ev zarava li wê deverê belav bûye û wekî zimanê suryanî hatîye binavkirin. Herwiha wergêrên ewil ên suryanî jî di vê medreseyê de yewnanî hîn bûne. Sergiusê Res'aynî û Ehrun wergêrên ewil yên suryanî ne ku di vê serdemê de hatine wergerandin. Berhema tibî ya Ehrun a bi navê "Kunnâş" jî di serdema Emewîyan de ji alîyê Mâsercevyh ji suryanî bo erebî hatîye wergerandin.⁵⁷

⁵³ Husein Muhammed, "Wergerandin", (22.02.2020)

⁵⁴ Radegundis Stolze, *Çeviri Kuramları -Giriş-*, Çeviren: Emrah Durukan, Değişim Yayınları, İstanbul 2013, r. 20

⁵⁵ Nazik Göktaş, "Fransa'da Yazınsal Çeviri Yaklaşımları (Bir Tarihçelendirme Denemesi)", *Çukurova Üniversitesi Eğitim Fakültesi Dergisi*, c.2, h.30, Adana 2005, r. 52

⁵⁶ http://ceviribilim.com/?page_id=1496 (14.03.2020)

⁵⁷ Mehmet Hakkı Suçın, "Arapça Çeviri Geleneği: Altın Dönem", Harvard University Department of Near Eastern Languages and Civilizations, *Journal of Turkish Studies*, 2010, r. 1-2

Di sedsala 7an de li Rojhilat di qada wergerê de hewldanên girîng tê dîtin. Çalakîyên wergerê bi taybetî di serdema Emewîyan de (661-750) dest pê dikin û di serdema Ebbasîyan de (750-1258) jî digihîje lûtkeyê. Di serdema hukumranîya el-Memun de li Bexdayê navendeke çandî-zannistî ya bi navê Beyt-ul Hikme ava dibe û li vê navendê de ji gelek zimanên wekî yewnanî, suryanî, sanskrîtî, farisî berhem bo erebî dihatin wergerandin.⁵⁸

Li gor Yıldırımçakar radigîhîne; serdema ereban ji bo pêşketina cîhanî serdemeke girîng e. Lewra di vê serdemê de berhemên girîng ên cîhanê yên li ser gelek zanistan hatine wergerandin. Ereban ev berhem bi zanînen xwe berfretir kirine û dîsa wergerandine zimanên Ewropî. Ev xebatên wergerê di navbera rojava û rojhilat de dibe pireyeke ku ji veguhestina zanistî girîng in.⁵⁹ Dîsa sedsala 8an de Îspanya dikeve bin hikumranîya Emewîyan û li wir Dewleta Endulusan ava dibe ku çanda rojhilat veduguheze girava Îberê. Di sedsala 12an de jî bajarê Toledoyê dikeve bin hikumranîya Îspanyolan û Rojavayî bi rêya wergerê ku ji bo latînî û zimanên herêmî hatine kirin gelek agahîyan bi dest dixin.⁶⁰

Di dîroka wêjeya Ewropayê de jî wergerên ewil ji serdema yewnanî û romayîyan ve dest pê kirîye. Ev wergerên ewil, him metnên dînî û him jî yên edebî li gor fehm û pêşketina serdemê peyv bi peyv hatine wergerandin. Fehmkirina van metnan jî pir zehmet e ku wergêr vê zehmetîyê bi pîrozîya metna jêder ve girêdidin.⁶¹ Li Ewropayê wergêr ewil Livius Andronicus (B.Z?-200) e ku di Şerê Tarentê (B.Z 272) de ji aliyê romayîyan ve hatîye dîlgirtin. Wî di mala kesekî bi navê Livius de ji bo zarokan mamostetîya yewnanî kirîye, paşê jî ji ber xebatên xwe hatîye azadkirin û navê efendîyê xwe Livius wergirtîye. Girîngtirîn serkeftina Livius wergera bo Latînî ya Odysseia bûye ku wî qîma xwe tenê bi veguhestina naverokê neanîye û di heman demê de di derheqê taybetmendîyên hunerî ya vê berhemê de jî agahî dane. Vê serkeftinê kirîye ku Livius li Ewropayê unvana wergêr ewil a edebî bigire.⁶²

⁵⁸ Yıldırımçakar, *h.t.*, r. 10

⁵⁹ Yıldırımçakar, *h.b.*, r. 11

⁶⁰ http://ceviribilim.com/?page_id=1496 (14.03.2020)

⁶¹ Yusuf Taştan, *Dîroka Wergerê û Xebatên Wergera Kurdî, Zanîngeha Van Yüzüncü Yılê, Enstîtuya Zimanên Zindî, Makezanista Ziman û Çanda Kurdî, Teza Lîsansa Bilind a Neçapbûyî, Wan, 2019*, r. 3

⁶² Aytaç, *h.b.*, r. 44

Di dîroka wergerê de wergerandin bi awayekî birêkûpêk di serdema romayîyan de dest pê dike. Di vê serdemê de li ser rêbaza wergerê nîqaşên cuda desthil bûne. Ev nîqaşên ku Cicero (B.Z 106-43) û St Jerome (P.Z.347-420) dide destpêkirin li ser rêbazên wekî “wergera rasterast/ peyv bi peyv” û “wergera serbest/ wate bi wate” radiweste û ev nîqaş bi qasî du hezar salan didome. Ev her du şairên ku ji wêjeya Yewnanî ya kevn werger dikirin di wê armancê de bûn ku wê bi rêya wergerê ziman û wêjeya romayî dewlemendtir bikin. Di wê peywendê de jî zêdetir armanca wan ew bû ku berevajî wergereke rasterast metnekê biafirînin ku bi xema estetîkî hatîye wergerandin.⁶³ Yıldırımçakar ji Munday neqil dike ku Cicero bixwe tîne ziman ku wî wergera serbest kirîye; lê dîsa jî stîl û hêza zimên jî parastîye. St. Jerome jî Cicero şopandîye û wî wergera wateyî tercîh kirîye. Ev nîqaşa ku bingeha teorîya wergernasîye ava kirîye di wergera rojhilatê de bi taybetî jî serdema Emewî û Ebbasîyan de jî berdewan kirîye û heta îro jî hatîye.⁶⁴

Di serdema navîn de ji ber belavbûna dînê Mesîhî werger ji bo ragihandina peyamên Xwedê dibe emûra tekane. Di vê serdemê de werger wekî metnên dînî û yên din dibe du beş. Wekî hevterîbê vê dabeşkirinê ji bo metnên dînî wergera sadiq, ji bo yên din jî wergera serbest tê pêşnîyazkirin.⁶⁵ Di navbera van çûnûhatinan de Încîl cara ewil ji aliyê St. Jerome ve di sala 384an de hatîye wergerandin û St. Jerome wergera xwe li gorî terz û pêşnîyaza Cicero bi wateyî wergerandîye.⁶⁶ Wergera încîlê demeke dirêj di nav nîqaşên wergerê de cihê sereke girtîye. Lê di nav wergerên Încîlê de ya zêdetir deng vedaye wergera Martîn Luther e. Wergerên Luther ên Ahîda Nû (1522) û Ahîda Kevn (1534) di reformîzma Mesîhîyan de bûne xebatên sereke. Yek ji giringîya wergerên Luther zimanê wergerê bûye ku wî wexta metna xwe çêkirîye di wê hewlê bûye ku wergera xwe li gorî dîyalekta serdemê, nêzîkî zimanê rojane û fêhmbar bike.⁶⁷

Li rojava teorîyên wergerê di sedsala 17an de bi awayeke sîstematîk pêş ve diçe. Di vê serdemê de veguherîna civakî, pêşveçûna rêveberîya parlamenter û bi

⁶³ Şehnaz Tahir Gürçağlar, *Çevirinin ABC'si*, Say Yayınları, İstanbul, 2019, r. 106

⁶⁴ Yıldırımçakar Ziyattîn, *Werger Wek Kirineke Çandî: Li Ser Rîyên Ji Wergernasîyê Ber Bi Kurdolojîyê Ve*, Zanîngeha Mardîn Artukluyê, Estituya Zimanên Zindî yên li Tirkîyeyê, Şaxa Makezanista Ziman û Çanda Kurdî, Teza Lîsansa Bilind a Neçapbûyî, Mêrdîn, 2016, r. 8

⁶⁵ Göktaş, *h.g.*, r. 53

⁶⁶ Taştan, *h.t.*, r. 6

⁶⁷ Gürçağlar, *h.b.*, r. 108

saya pêşveçûnên zanistî veguhastina zanîn û wêjeyê di navbera çandan, bi taybetî jî di navbera îngilîzî û fransîzî de danûstandina metnên edebî de rola wergerê zêdetir bûye.⁶⁸

Di sedsalên 16 û 17an de li hember zimanê Latînî zimanên mehelî derketine holê û Sed sala 18an de jî di zimanên mehelî de pêşveçûnek dîyar dibe. Di vê serdema Ronakbîrîyê de bo hişyarkirina gel girîngîya zimanên mehelî jî zêdetir dibe, ji ber vê sedemê jî di van serdeman de werger ji bo zimanên mehelî der çûne.

Dîsa di sedsala 19an de bi paralelîya hebûna ziman û wêjeyên milî werger jî bi van zimanan dihat kirin. Serdema Romantîk him ji bo çalakîya wergerê û him jî ji bo nîqaşên li ser wergerê bûye serdemeke mifadar ku di vê serdemê de bi qasî berhemên wêjeyî berhemên zanistî jî di qada wêjeyê de bûye xwedîyê tesîreke girîng.⁶⁹ Di vê serdemê de nivîskarên pêşeng ên romantîzma almanan wekî; Goethe, Humbolt (1769-1859), Novalis (1772-1801) û Shegel werger xistine navenda çalakîyên hizrî û ew wekî amûrek dîtine ku ji bo têgihiştina çanda jêder tê bikaranîn.⁷⁰

Mimkun nebûye ku werger berîya salên 1960an wekî qadekî akademîk derkeve holê. Tevî ku werger giringtîrîn amûra wêjeya berawirdî ye jî di lêkolînên wêjeyê de bi salan wekî qadeke marjînal hebûna xwe domandîye.⁷¹ Lê di nîveka ewil a sedsala bîstan de wergernasî bi alîkarîya zanistên weke edebîyat, zimanzanî, civaknasî û hwd. paşê jî bi tevlêbûna lêkolînerên ku perwerdehiya wergernasîye girtine bûye qadeke dewlemend a navdîsîplînî ku ji nîv sedsalî zêdetir e rehên xwe berdaye nav cîhana akademîk.⁷² Di sedsala bîstan de piştî ku wergernasî ji zanistên weke wêjeya berawirdî û zimannasîyê vediqete êdî weke qadeke serbixwe tê binavkirin.⁷³ Wergerê di vê serdemê de zêdetir bal kişandîye ser xwe û xebatên sazîyan bi taybetî di vê sedsalê de digel texlîdan zêdetir bûne.⁷⁴

⁶⁸ Gürçağlar, *h.b.*, r. 109

⁶⁹ http://ceviribilim.com/?page_id=1496 (14.03.2020)

⁷⁰ Gürçağlar, *h.b.*, r. 110

⁷¹ Gürçağlar, *h.b.*, r. 112

⁷² Gürçağlar, *h.b.*, r. 113

⁷³ Yıldırımçakar, *h.t.*, r. 12

⁷⁴ Göktaş, *h.g.*, r. 56.

1.8.2. Çalakîya Wergerê di Tirkî de

Di dîroka tirkî werger cara ewil di nav uyğuran de dest pê dîke. Di vekolînan de hin metnên uyğurî hatine bidestxistin û tê texmînkirin ku ev metn di sedsalên 8 û 13an de hatine nivîsîn û piranîya van metnan jî werger in. Metnên ku di derheqê Budîzm, Manîheîzm û Xirîstîyanîyê de ne ji zimanên wekî sanskrîtî, farisîya kevn, suryanî, tîbetî û ji zimanê çînî hatine wergerandin.⁷⁵

Tê zanîn ku di serdema selçukîyên anatolîyayê de wergêr hebûne ku ew him jî wergerên devkî û him jî wergerên nivîskî berpirsîyar bûne û wekî “tercûman” hatine binavkirin. Wan wergêran nivîsên di navbera dewletan de bi rê ve birine û navbeykarîya hevdîtînan kirine. Ev kevneşopî di nav Împaratorîya Osmanîyan de jî dewam kirîye û wergêrê ewil a osmanîyan Lûtfî Bey bûye ku di sala 1479an de dewletê ew li ser navê osmanîyan şandîye Venedîkê. Wisa tê texmînkirin ku ev karê wergêrîya serayê di serdema Fatîh Sultan Mehmet de derketîye holê û di sedsala 16an de bi zêdebûna karen dîplomatîk ve girîngî û karen wergêran jî zêde bûye.⁷⁶

Di Împaratorîya Osmanî de wergerên ewil ên nivîskî ji farisî û erebî hatine kirin. Bi taybetî jî wergerên di sedsalên 13 û 14an de li ser pêşveçûna zimanê osmanî de roleke çak gêrane. Di wê serdemê de wergerên metnên dînî û zanistî de zimanê jêder erebî bûye. Herwiha di wergera edebî de jî zimanê jêder yê sereke Farisî bûye. Her çiqas di wan salan de werger zêdetir di karûbarên dewletê de çalak bûbe jî. Di sedsala 15an de hin berhemên edebî hatine wergerandin; Gülşehrî “Mantiku’t Tayr”, Ahmed-i Dai “Çengname”, Kul Mesud “Kelile û Dimme” û Mercimek Ahmed jî “Kâbus-name” wergerandine tirkî. Lê wergera van berheman ne wergerên birêkûpêk bûne û mirov dikare wan jî wergerê zêdetir wekî teqlîd an jî ji nû ve nivîsandina van berheman binirxîne.⁷⁷

Di dîroka tirkî de cara ewil bizava wergereke birêxistî di sedsala 18an, Dewra Laleyan de ji alîyê İbrahim Paşa ve dest pê dîke. Wergêrên vê serdemê zêdetir di karên dewletê de çalak bûne ku di Divan-ı Hümayun, mehkeme, balyozxane û di sazîyên

⁷⁵ Sergül Vural Kara, “Tarihsel Değerlendirmeler Işığında Türkiye’de Çeviri Etkinliği”, *Mersin Üniversitesi Eğitim Fakültesi Dergisi*, c. 6, h. 1, Mersin 2019, r. 95

⁷⁶ Gürçağlar, *h.b.*, r. 17

⁷⁷ Gürçağlar, *h.b.*, r. 18

perwerdehî û artêşa osmanî de wergêrî kirine. Lê wergerên wê serdemê di qada dîrok û zanistê de bûne. Herçiqas wergerên ewil zêdetir li ser wergera berhemên li ser erdnîgarî, tip û eczâtîyê be jî di sedsala 19an de mijarên akademîk ên wekî eskerî û matematîkê de jî werger hatîye kirin.⁷⁸

Di sedsala 19an de wergêrên tirk berê xwe didin berhemên Rojavayê û di vê serdemê de ji bo çalakîyên wergerê hin sazî ava dibin. Di sala 1821î de Tercüme Odası (Wargeha Wergerê) û di sala 1839an de jî Encümen-i Daniş ava dibe. Piştî îlankirina Fermana Tanzîmatê cara ewil di sala 1859an sê berhem ji wêjeya Ewropî tîr wergerandin. Yusuf Kâmil Paşa berhema Abbé Fénelon ya bi navê “Les Aventures de Télémaque (Telemak)”, İbrahim Şinasi hin helbestên La Fontaine, Gilbert û Racine bi sernavê “Tercüma-i Manzume” û Münif Paşa jî hin diyalogên felsefî yê Voltaire, Fénelon, ve Fontenelle bi sernavê “Muhaveratül Hikemiye” werdigerin bo tirkî.⁷⁹ Di vê serdemê de piranîya berhemên werger ji zimanê frensî ye û bi rêya van wergeran jî cureyên nû yê wekî roman, ceribîn û şano dikevin nav edebîyata tirkî.

Di serdema cumhurîyetê de jî sala 1940an dibe lûtkeya çalakîya wergerê ku di vê salê de ji alîyê dewletê ve “Tercüme Bürosu” (Buroya Wergerê) ava dibe. Buroya Wergerê bi sernavê “Dünya Edebiyatından Tercümeler” (Wergerên ji Wejeya Cihanî) gelek berhemên klasîkên cîhanê ji bo tirkî tîr wergerandin. Buroya Wergerê di sala 1940an de 10 berhem wererandiye tirkî û heta sala 1946an jî hejmara wergerê sal bi sal zêde bûye. Buroyê di navbera salên 1940 û 1946 an bi giştî 467 berhemên werger li wêjeya tirkî zêde kirîye.⁸⁰

Sala 1960an ji bo wergera edebî saleke zêde berhemdar nebûye. Herwiha di salên 1970an de jî ji ber şert û mercên sîyasî zêdetir berhemên popûler hatine wergerandin. Lê piştî salên 1980an de di hejmara wergeran de zêdebûnek dîyar dibe ku di vê serdemê de digel behemên wêjeyî di berhemên zanistên civakî, felsefe, edebîyata zarokan û xebatên femînîstî de jî werger hatine kirin.⁸¹

⁷⁸ Aytaç, *h.b.*, r. 46

⁷⁹ Gürçağlar, *h.b.*, r. 18-19

⁸⁰ Aytaç, *h.b.*, r. 47

⁸¹ Aytaç, *h.b.*, r. 47-48

Girîngîya wergerê di nava edebîyata tirkî de her ku diçe zêdetir dibe. Di sala 2005an de dewlet piştgirîyê dide xebatên wergerê û ji bo ku wergera tirkî di nav zimanên din de zêde bibe Porejaya TEDA yê dide destpêkirin. Herwiha dewlet di bergeha vê projeyê de bi alîkarîya maddî xwedî li wergêr û weşanxaneyan derdikeve ku li derweyî welêt berhemên tirkî werdigerin zimanên din û diweşînin.⁸²

Heta îro di edebiyata tirkî de gelek berhem hatine wergerandin û hê jî berdewam e. Îro li Tirkîyeyê di hin zanîngehên wekî Hacettepe, İstanbul û Anadoluyê de beşên wergerê ava bûne ku di qada wergerê de xebatên xwe didomînin.

1.8.3. Çalakîya Wergerê di Kurdî de

Tê dîtin ku rewşa sîyasî û cîvakî ya serdeman li ser dîroka wergera kurdî jî bibandor bûye. Lewra wekî ku tê zanîn ji ber rewşên sîyasî û qedexeyan heta demên nêzîk kurdan derfeta perwerdehîyeke bi zimanê kurdî bidest nexistibûn û sazî û dezgeh nebûn ku bi xebatên bi vî rengî re mijûl bibin. Herwiha wekî Ergin Öpengin jî dîyar dike ji sedsalên 16 û 17an heta nîvê duyem a sedsala 19an zimanê kurdî di bin sî û sîbera serdestîya zimanê erebî û farisî bi rê ve diçû.⁸³ Ji ber van sedeman jî ger em destpêka dîroka wergera kurdî û gelên din berawird bikin tê dîtin ku wekî gelek qadan di qada wergerê de jî derengmayînek heye.

Yekem kitêba ku bo Kurdî hatiye wergerandin Încîlek e, Încîla Matthew e ku sala 1856ê bi alfabeya ermenî li Stenbolê hatiye belavkirin.⁸⁴ Ev beşa Încîlê ji alîyê waîzekî ermenî Stephan ve li Xanî ya Dîyarbekirê bo Kurdî tê wergerandin û ji alîyê British and Foreign Bible Society ve tê çapkirin. Ev pirtûk di heman demê de yekem nimuneya pirtûka kurdî ya çapbûyî ye û 112 rûpel e.⁸⁵ Li dû wê di sala 1961ê de wergereke din derdikeve ku ew ji şîrove û raveya Încîlê ye û li Stenbolê çap bûye. Sernavê wê “Alfabece” ye û bi Kurmancî ye. Ev kitêb ji bo hînkirina zarokan e û tê de agahîyên li ser dîroka zimanê kurdî hene. Temoyê keşeyekî kurd-ermenî jî beşên din

⁸² Gürçağlar, *h.b.*, r. 21

⁸³ Ergin Öpengin, “Werger û Wergêran di Kurmanciyê de: paşxane û hindek pirsên îroyî” *In Proceedings of first international conference on Kurdish Literature*, xxx. Sanandaj, University of Kurdistan Press, 2011, r. 3

⁸⁴ Öpengin, *h.g.*, r. 4

⁸⁵ Yıldırımçakar, *h.t.*, r. 48

ji Încîlê wergerandîye û American Bible Associatonê ew di sala 1972an de çap kirine û tê dîyarkirin ku di navbera salên 1859 û 1923yan bi giştî 7 wergerên Încîlê bi kurdî hatine çapkirin, hemû jî ji aliyê Ermenî û mîsyonerên rojavayî ve.⁸⁶

Dîsa Ergin Öpengin ji K.J. Thomas neqil dike ku di sala 1947an de Kamuran Alî Bedirxan û Thomas Boisê keşeyê domînîkan wergera Încîlê dîkin û li Beyrûdê, bi tîpên latînî û erebî belav dîkin. Wan dîsa berhemek bi navê Metelokên Hezretî Silêman jî ji zimanê Îbranî wergerandine.⁸⁷

Yek ji wergerên ewil ên kurdî “Durul-Mecalîs” a Mele Mûsayê Hekarî ye. Ev berhem bi farisî ji aliyê Mizafer Nûbiharî ve hatiye nivîsandin û Mele Mûsayê Hekarî beşeke ji vê berhemê wergerandîye kurmancî. Ev destxeta Mele Mûsa ji 50 çîrokên curbicur pêk tê û tenê sernavê çîroka ewil heye (Hîkayetê Bersîsayê), yên mayî bi hejmaran hatine dîyarkirin. Durul- Mecalîs di dîroka edebîyata kurdî de li rex wergerên Mele Mehmûdê Bazidî dibe çîrokên werger ên yekemîn.⁸⁸

Di dîroka edebîyata kurdî de cara ewil wergera birêkûpêk û berfireh ji aliyê Mele Mehmûd Bazidî (1797-1870) di salên 1858-1859an de hatiye kirin. Wî beşek ji kitêba *Şerefnameya Şerefxanê Bedlîsî* bi sernavê *Tevarîxî Qedîmî Kurdistan* ji farisî bo kurdî wergerandîye. Dîsa di wan salan de rojhilatnas Peter Lerch di kitêba xwe ya bi navê “Forschungen uber die Kurden und iranischen Nordchaldaer” de cih dide wegera kurdî ya hin çîrok û metelokên fînlendî û tirkî.⁸⁹ Herwiha li gor Muhammed jî ev xebata Bazidî yekem berhema berfireh e ku ji bo kurdî hatiye wergerandin û ew îdîa dike ku piştî vê berhemê heta salên 1980-90î tenê nivîsên kurt tên wergerandin. Loma heta van salan werger di kurdî de wekî qadeke nû tê qebûlkirin⁹⁰

Ji xeynî van xebatan di qada wergera edebî de piştî ku li Stenbolê kovarên cemîyetên kurdan derdikevin hin wergerên helbestan tên wergerandin. Di kovara Rojî Kurd (1913) de Xelîl Xeyalî (1864-1946) bi nasnavê X. Mûdanî helbesteke Mehmet

⁸⁶ Öpengin, *h.g.*, r. 4

⁸⁷ Öpengin, *h.g.*, r. 4

⁸⁸ Mela Mûsayê Hekarî, *Durul-Mecalîs: Yekemîn Komeley Çîrok le Mêjûy Pexşanî Kurdî -Wergêrandî (Saxkirdinewê û Lêkolînewê)*, Amd. Hêmin Omar Xoşnaw, Çapxaneya Hêvî, Hewlêr, 2019, r. 29

⁸⁹ Öpengin, *h.g.*, r. 5

⁹⁰ Muhammed, *h.n.*, r. 2

Akif Ersoy (1873-1936) werdigerîne kurdî û ev helbest di hejmara duyem ya kovarê de tê weşandin. Dîsa Xelîl Xeyalî di hejmara 10an a Hetawî Kurd (1914) de helbesteke Tahir'ul Mewlewî (1877-1951) werdigerîne kurdî û diweşîne. Herwiha Mihemed Mîhrî (1885-1957) jî bi awayekî sistematîk helbestên kurdî tevî wergera wan a tirkî di kovara Jîn (1918- 1919) de diweşîne.⁹¹ Di sala 1931ê de Erebe Şemo (1897-1978) wergera *Koçeke Derewîn* a Aleksandr Araratyan (1876-1937) werdigerîne kurdî û heta salên 80yan kesên wekî Celadet Alî Bedirxan (1893-1951), Kamuran Alî Bedirxan (1895-1978), Qedrîcan (1911-1972) û Osman Sebrî (1905-1993) bi karê wergerê mijûl dibin. Di qada wergerê de divê keda Kamuran Alî Bedirxan neyê piştguhkirin lewra ew digel Încîl û meteloka 36 çarînên Xeyam (1048-1131), gelek sûreyên Qurana Pîroz û qasî 700 hedîs werdigerîne kurdî û di hejmarên Kovara Hawarê (1932-1943) de belav dike.⁹²

Öpengin dîyar dike ku piştî salên 80yan du qewîmînên girîng ruh û dînamîzmek dide weşan û weşangerîya kurdî. Ya yekem ew e ku piştî derbeya leşkerî ya 1980yan gelek rewşenbîrên kurd revîn Ewropayê û li wir xwe dan ber kar û barên wêjeyî, ya duyem jî rakirina qismî ya qedexeyê li ser zimanê kurdî bû ku weşanên kurdî dest bi xebatan kirin.⁹³ Herwiha ev serdem ji bo wergera kurdî jî bûye serdema ronesansê ku karên wergerê ewil li Swêde xurt bûye⁹⁴ ku li wir di sala 1996ê yekemîn kovara wergerê ya bi kurdî “Nûdem Werger” derdikeve. Li dora vê kovarê kesên wek; Firat Cewerî, Şahînê Bekirê Soreklî, Zinarê Xamo, Arif Zêrewan, Hesenê Metê, Fawaz Husên, Mistefa Aydoğan û gelek kesên din di warê wergerê de xebatên giring kirine. Herwiha ev xebatên ku li Swêdê xurt dibin xwe digîhîne Bakur jî. Li Bakur di serî de Stenbol û paşê jî li Amed û li gelek metropolan de enstîtu û navendên çandî, kovar û rojnameyên kurdî jî dest bi karê wergerê dikan. Di salên 1990î de bi taybetî kovara Rewşen (jîyana Rewşen, Rewşen-Name) di qada wergerê de roleke çalak digêre. Şair û rewşenbîrên wek; A. Rahman Çelîk, Cemîl Denlî, Kawa Nemir, Mazlûm Doxan û Osman Mehmed li dora vê kovarê de dest bi xebatên wergerê dikan û çîrok û helbestên

⁹¹ Mesûd Serfîraz, “Di Çapemenîya Kurdî Ya Dewra Osmanî De Wergera Wêjeyî”, *Kovara Wêje û Rexne*, h.2, 2014, r. 59-60

⁹² Öpengin, *h.g.*, r. 50,

⁹³ Öpengin, *h.g.*, r. 5

⁹⁴ Muhammed, *h.g.*, r. 2

werger diweşînin.⁹⁵ Öpengin dîyar dike ku di navbera salên 1980 û 2009an de bi giştî 211 pirtûk hatine wergerandin û hejmara wergerên kurdî ji bilî çend salan sal bi sal zêdetir bûne.⁹⁶

Îro jî wergera kurdî sînorên xwe berfirehtir kirîye û ji edebîyata cihanê gelek berhemên şair û nivîskarên wekî Shakespeare, Franz Kafka, Selma Lagerlöf, Emily Dickinson, Herman Melville, William Faulkner, Gabriel Garcia Márquez, Yaşar Kemal, Selim Berkat, Leyla Erbil, Orhan Pamuk, Murathan Mungan ji bo kurdî hatine wergerandin. Herwiha kesên wekî Dilawer Zeraq, Fahriye Adsay, Ciwanmerd Kulek, Husein Muhammed, Ergîn Öpengîn û gelek kesên din bi xebatên xwe wergera kurdî pêşdetir dibin.

Wekî ku li jor dîyar e di belavbûna çand, bawerî û zanistê de rola wergerê giring e. Tê dîtin ku li cihanê di warê wergerê de xebatên ewil ji bona belavkirina bawerîyan bi gelemperî li ser metnên dînî bûye. Ev nimuneyên wergerê di mijara têsîrdêrîyê roleke çak girtine ku ji bo xebatên wêjeya berawirdî dibin palpişt. Loma di vê xebatê de nedibû ku me behsa rol û giringîya wergerê nekira.

1.9. Mijarên Hevpar di Wêjeya Berawirdî de:

Her berhem ji bo nîyet an jî peyamekê tê afirandin. Hest û ramanên ku di navenda berhema hunerî de cih digirin wekî tema tînin binavkirin. Tema di nav termên şaxên hûnerî de termeke hevpar e.

Bawerî û nirxên çandî dibe sedem ku temayeke di navbera civakên cuda û heta di nav heman civakê de ji alîyê têvel ve bê honandin. Bo nimûne mijara evînê; çawa ku di serdemeke edebî de wekî hestîyarîyeke tenik tê honandin, di serdemeke din de jî dikare wekî kêfeke madî bê îfadekirin.

Ji ber ku mirov bi tesîrdêrîyê re meylê in tînin ku çî neteweyî çî navneteweyî be di piranîya berhemên de mijarên hevpar hene. Nivîskar/helbestvan mijarên ku bala wan dikişînin an jî ji xwe ra nêzîk dibînin bêtî ku dudil bin digirin. Di berhemên edebî de hêmana ku zêdetir balê dikişîne ser xwe “mijar” e. Di lêkolînên

⁹⁵ Kawa Nemir, Kürtçe ve Çeviri

⁹⁶ Öpengin, *h.g.*, r. 6

wêjeya berawirdî de jî zêdetir xebat li ser berawirdkirina mijaran e. Kesên ku berhemên edebî dixwînin û xulase dikin, ewil balê dikişînin ser mijarê. Herwiha wê berhemê bi berhemên cuda re jî berawird dikin ku li ser heman mijarê hatine honandin. Helbet ev berawirdkirineke serveyî ye. Di vir de xalên ku divê li ser bê rawestan ev in; mijarên hevpar çawa hatine honandin, çi cudahî û wekhevî di navbera wan de hene. Heman mijar bi heman perspektîf û heman terzê hatibe honandin jî divê li hîlbijartina peyv û bêjeyan, terza îfadekirina berhemên bê nêrîn.⁹⁷

Di proseya dîrokî de tê dîtin ku mijarên berhemên jî bi demê re li gor pêdivîyên civakî guherîne. Di dîroka gelan de bûyerên girîng hene ku ji rewşa sîyasî bigire heta jîyana rojane û bawerîya gelan diguherînin. Wekî ku tê zanîn wêje ji civaka ku tê de diherike ji hev nayê veqetîn, wekî awêneya civakê edebîyat jî ji van guherînan paydar dibin. Bi van guherînên girîng re mijarên edebîyatê jî diguherînin hin caran mijarên nû dikevin nav edebîyatê û hin caran jî ev guherîn tenê ji alîyê şiklî ve dimîne. Ji bo vê guherbarîya wêjeyî em dikarin behsa edebîyata kurdî bikin ku qonaxên edebîyata kurdî jî wekî hemû wêjeyan ji gelek guherînan ve derbas bûne. Wekî ku tên zanîn mijarên edebîyata klasîk bisînor in û bi gelemperî jî li ser tesewîfê ne, ji daxwaz û xemên serdema modern dûr in û girîngî li ser xweşikbûna vegotin û şêwazê ye. Dîsa di wêjeya gelêrî de jî piraniya berhemên li ser çîrokên qehremanî û şer hatine honandin û teswîra çanda gelêrî kirine. Di proseya dîrokî de di hin serdeman de jî ji ber rewşa sîyasî berhem wekî amûreke propandayê hatine bikaranîn ku mêtînkari, zîlm û zordari bûne temaya sereke. Îro bi pêşveçûna civakê re mijarên cur bi cur bûne para edebîyata modern ku sînorên wê nedîyar e. Bi vê pêwendê em jî di vê xebata xwe de li ser rêça ekola marksîst tevgerîyan ku li gor nûnerên vê êkolê edebîyat li gor rewşa civakî û aboriyê teşe digire û di navbera gelên cuda de jî ji ber wekhevîyên binyada civakî mimkun e ku berhemên hevpar derkevin holê. Em jî di vê xebatê de di berhemên Rojen Barnas û Nâzım Hikmet de mijarên hevpar digerin ku her du helbestvan herçiqas civakên cuda temsîl bikin jî hunera wan li ser heman coxrafyayê teşe girtiye. Loma jî wexta me dest bi vê xebata berawirdî kir em di wê bawerîyê de bûn ku di helbestên Nâzım Hikmet û Rojen Barnas de wê gelek mijarên hevpar hebin.

⁹⁷ Tekşan, *h.b.*, r. 140-141

BEŞA DUYEM

JÎYAN, BERHEM û POETÎKA YA ROJEN BARNAS û NÂZIM HİKMET

2.1.ROJEN BARNAS

2.1.1. Jîyan

Rojen Barnas an jî bi navê fermî Mehmet Gemîcî li Farqînê hatîye dinyayê. Di derheqê roja bûyîna wî de agahîyên cuda hene. Barnas bixwe jî dîroka bûyîna xwe nizane û di berhemên xwe de jî tarîxên cuda wekî 1943 û 1945an dide.

Rojen Barnas di sala 1952an de dest bi dibistana seretayî dike. Li gor agahîyên Barnas dide civaka wê serdemê zêde giringîyê nadin xwendinê û zarok bi hewla mamosteyan li dibistanan tên qeydkirin. Herwiha Barnas jî di wê serdemê de bi alikarîya nasekî xwe bê ku haya malbata wî jê hebe di dibistanê de qeyda xwe çê dike. Ew bi me dide zanîn ku wî jî wekî gelek kurdên serdema xwe ji ber nezanîna zimanê tirkî û tevgerên mamosteyan di dibistanê de gelek zehmetîyan kişandîye lê dîsa jî ji dibistana xwe qayîl bûye.⁹⁸

Di sala 1957an de Barnas dîsa li Farqînê dest bi xwendina dibistana navîn dike. Ev dibistan ji her alîyê ve ji ya seretayî baştir e û di jîyana Barnas da cihekî girîng digire. Ew li wir him dersên îlmî û him jî yên tetbîqî digire. Barnas dide zanîn ku mamosteyên dibistana navîn xwendinê bi wan şîrîn kirîye û bi taybetî behsa şîretên mudirê dibistanê dike ku li ser kesayetî û welatparêzîya wî bandor kirîye:

“Mudir Serwet beg (Bedlîsî) li me vê şîretê dîkir: “Hûnê herin bixwînin, belkî herin heta dawiyê bixwînin û xwe xelas kin. Hûnê bizewicin; eger hun bi yeka wek xwe xwenda û xwe xelaskirî re bizewicin, we bi tenê xwe xelaskiriye; na ku hûn bi yeka ji we ya lê nexwenda û xwenexelaskirî re bizewicin hingê hûn du kesan; hem xwe û hem wê kesê xelas dîkin. Herin bixwînin, xwe xelas bikin û werin bi yeka ji xwe ya xwe ne xelaskirî, re bizewicin û wê jî bi xwe re xelas kin. Nizanim gelo gelperwerî an welatparêzî bi awakî dinê çawa tê formule kirin.”⁹⁹

⁹⁸ Barnas, *Farqîn (Sîlvan/ Silîvan)*, Nûbihar, İstanbul, 2013, r. 140

⁹⁹ Barnas, *Farqîn (Sîlvan/ Silîvan)*, r. 143

Ji ber nebûna lîseyê Barnas ji bo xwendina xwe tevî malbata xwe koçî Dîyarbekirê dike û li wir di lîseyê Ziya Gökalp de dixwîne. Di xwendina xwe ya vê astê de dersa Fransîzî jî dibîne. Li gor qeneata Barnas perwerdehiya lîseyê li gor ya navîn qels e.¹⁰⁰

Rojen Barnas di salên zaroktîyê de dest bi nivîsandina helbestan dike û helbestên wî yên ewil tirkî ne. Ew li ser destpêka helbestvanîya xwe de agahiyên cuda dide û wiha dibêje:

“Min ji sala 1958-59an pê de dest bi nivîsandina şîrîr kir. Ji 1961ê pêde şîrîrên min di 5 rojname û 2 kovarên edebî-hunerî yên Dîyarbekirê de çap û belav dibûn. Di forma berhemên edebiyata dîwanî û gelêrî de çap bû. Bêguman ev şîrîrên min bi tirkî bûn. Herdû rojnameyên wek Gökalp û Şehir ne tê de, wekî din ji aliyê temamê rojnameger û çapkerên nav Dîyarbekirê ve wek şair û nivîskarekî gênc dihatim nasîn. Min hem şîrîr û hem jî nivîs dinivîsîn.”¹⁰¹

Di hevpeyvîneke xwe de jî ji bo destpêka nivîsandina helbestên xwe tarîxekê cuda dide: “Ji 1962yan pê de min bi awayekî aktîf bi tirkî şîrîr dinivîsand. Di rojnameyên Dîyarbekirê de, ev şîrîr bi tirkî dihatin çapkirin. Heta 1965an dom kir. Di rojnameyên lokal de, ev şîrîr çap bûn. Ez wekî kesekî şîrnivîsekî tirkî dihatim naskirin.”¹⁰²

Barnas li Dîyarbekirê Enstîtuya Hînkariyê (Eğitim Enstitüsü) qedandîye û di wan salan de ew dikeve nav derdoreke sîyasî û kurdperwer. Ev derdor li ser hesasîyeta wî ya neteweyî û terazîya wî ya hunerî de tesîr dike. Herwiha di salên ku Barnas helbestan dinivîsîne bikaranîna zimanê kurdî qedexeyê û li ser kurdan jî polîtîkayên tund tîne li darxistin. Barnas jî têdîgîhîje ku ew jî bi nivîsandina zimanê tirkî ve dibe perçeyekî vê zilmê. Ev têgihîştin dibe bingeha helbestên Barnas yên sîyasî û ew berê qelema xwe dide kurdî. Barnas di derheqê kurdî nivîsandina xwe û serborîyên xwe yên wan salan wiha tîne ziman:

¹⁰⁰ Barnas, *Farqîn (Sîlvan/ Silîvan)*, r. 142

¹⁰¹ Barnas, *Kadiz*, r. 13

¹⁰² Nihat Çelik, “Hevpeyvînek Li Gel Rojen Barnas”, *Kovara Jiyana Rewşen*, h. 43, Stenbol 2000, r. 39

“Di 1964-1965an de bi awakî sîyasî-fîkrî rastî rojhilatperwer, çepverûyên rojhilat û kurdperweran hatim. Di wê demê de li Dîyarbekirê buroya Seîd Elçî û dikana pirtûkfiroşî ya nivîskarê *Îslamiyet Açısından Şeyhlik ve Ağalık* muftîyê Qulpê yê berê M. Emin Bozarslan mîna kewara mêşên hingiv ji çûnûhatina kesên navdar dixebitîn. Ez yek ji mudawimên herdu cihan bûm. Seîd Elçî ji tevgera 49an bû û seydayê Muftî bi pirtûka xwe li tevahîya Tirkîyê wek “aydın din adamı” nav dabû ku ji aliye çepverû û kurdperweran ve dihate hez kirin. Li van herdu cihan ez rastî gelek kesan hatim ku hin di çapa Kurdistanê û hin di çapa Tirkîyê de navdar bûn. Bi qasî çend deqîqeyan be jî wek guhdar beşdarî sohbetên wan dibûm, ji dîtinên wan ên erênî yan neyînî min li gora femkirina xwe ders hiltanî”¹⁰³

“Ez di dawîya 1964an û destpêka 1965an de ketim nava vîn û bawerîya kurdperweriyê. Gihîştim vê qenaetê ku, wekî kurd nivîsandina her nivîsareke bedew, her şîrek, her straneke bi zimanekî dîtir ê ji derveyî kurdî xizmetkirina çerxa asîmîlasyonê ye. Li ser vê qenaetê min biryar da ez nebim xizmetkarê asîmîlasyona li ser ziman û çanda kurdî. Berevajiyê vê, heta ku ji min were ez ê di hişê asîmîlasyonê de bi rêgeha mekanîzmaya ziman û çandê tê bikoşim. Ev qenaet hingî çû bi min re xurt bû, kemilî ku min ji xwe re got: Ku wisa be divê meriv bi vê metodê bersiv bide, yanî bi riya biakaranîn û pêşvebirina ziman û kultura me ya devkî/nivîskî.”¹⁰⁴

Piştî vê biryara xwe Barnas dest bi nivîsandina helbestên kurdî dike, helbestên xwe yên ewil bi nasnavê Şêrgo Ciwanroj dinivîsîne. Ji ber ku derfeta weşandinê nabîne helbestên xwe li dikana M. Emin Bozarslan û bûraya Seîd Elçî ji kurdperweran re dixwîne.¹⁰⁵

Di salên 1963-65an de Rojen Barnas bi kovar û rojnameyên wekî Demokrasiye Güven, Dicle, Diyarbakır, Mücadele, Yeni Yurt û Karacadağ Mecmuası (Güven) re têkîlî datîne û bi çûnûhatina van kovar û rojnameyan ve dikeve nav derdoreke edebî jî.¹⁰⁶

¹⁰³ Barnas, *Kadiz*, r. 13-140

¹⁰⁴ Çelik, *h.h.*, r. 39

¹⁰⁵ Barnas, *Kadiz*, r. 15

¹⁰⁶ Fahriye Adsay, “Hevpeyvîn Ligel Rojen Barnas”, *Kovara Zarema*, h.7, sal 3, Amed 2016, r. 77

Di sala 1966an de Rojen Barnas diqede û bi malbatî vedigerin Farqînê û Barnas di vê serdemê de jî helbestên kurdî dinivîsîne lê li Farqînê derfeta weşandinê nabîne û kesê ku helbestên xwe ji wan re bixwîne jî tune. Ji ber nebûna guhdar û xîneran kanîya wî ya helbest zayînê ji bo demekê dimiçiqe.¹⁰⁷

Cara ewil du helbestên Barnas yê kurdî tên parvekirin. Helbesta wî ya bi navê *Memo* ji aliyê Mîr Kamran Bedirxan ve çap dibe. Barnas vê meseleyê wisa radigihîne:

“Min ev ş’ir di sala 1967-68an de nivîsîbû. Hingê birayê min li Parîsê dixwend û me ji hevdû re name dinivîsî. Min bi nameyek re vê ş’ira bi naznavê Memo Guhderz şand. Birayê min jî ev nîşanî gorbehîşt Mîr Kamran Alî- Bedirxan Beg dide. Xuyan e ku kêfa Mîr jê re hatiye û sezayê çapê dîtiye ku di pirtûka xwe ya bi navê “*Fêrbûna Xwendina Kurdî*” de di sala 1968an de li Parîsê çap kiriye. Hingê haya min jê çêbûbû, lê min nedîtibû.”¹⁰⁸ Piştî saleke helbesta wî ya bi navê “*Danielê Sor*” jî ji aliyê Komeleya Piştgirîya Kurd û Fransîzan ve tê çapkirin û wek belavok di tevgerên 1969an de li Parîsê tê belavkirin.¹⁰⁹

Barnas di sala 1966an de li Farqînê dest bi mamostetîya edebîyatê dike.¹¹⁰ Karmendîya wî ji bo helwesta wî ya neteweyî û tevgerên sîyasî re nabe asteng. Ew di vê proseya de he tim jî bo mişkîleyên civakî beşdarî mîting û protestoyan dibe. Yek ji wan mîtingan jî di sala 1966 li Farqînê ji bo protestoya xeta petrolê ya ku bi rêya borîyan wê bikişînin Ceyhanê tê lidarxistin. Dixwazin ku ji dêvla vê xetê li herêmê parzûnxaneyek nû bê çêkirin û bi hezaran kes ji bo debara xwe li vir bixebitin. Barnas him propagandaya vê mîtingê dike ji bo ku zêdetir kes tevî mîtingê bibin û him jî di mîtingê de axaftineke dike û wisa radigihîne: “(...) Min li ser ferqî û meylî têxistina dewletê ya di navbera heremên rojhelat û rojava li ser rewşa belengaziya rojhelat axaftinek kir.”¹¹¹

Barnas ji bilî mîtingan di nav xebatên partî û dezgehan de jî cih girtîye. Ji ber ku di wan salan de derfeta kurdperweran tune ye ku di nava partîyeke de propaganda

¹⁰⁷ Barnas, *Kadiz*, r. 15

¹⁰⁸ Barnas, “Şi’reka Min a Kevin”, *Kovara Nûbihar*, c. 20, h. 138, sal 25, İstanbul 2017, r. 20

¹⁰⁹ Barnas, *Kadiz*, r. 15

¹¹⁰ Barnas, *Kadiz*, r. 4

¹¹¹ Barnas, *Farqîn (Sîlvan/ Silîvan)*, r. 165

bikin xwe li TÎPê digirin. Kurdperwer bi saya TÎPê li nav xelkê û gundan digerin propagandaya partîyê bi kurmançî dikin. Herçiqas di nav TÎPê de roleke Barnas ya fermî tune be jî di ger û çûnên kongre û hîlbijartinan de ji ber xwestina rêvebirê partîye cih digire.¹¹²

Di payîza sala 1968an de Barnas dibe serokê TÖS a şaxa Farqînê. Di dema serokatîya wî de hin tevgerên wekî Büyük Eğitim Yürüyüşü (Meşa Mezin a Hîndekarîyê) (15.02.1969an de li Ankarayê dibe) û Büyük Öğretmen Boykotu (Boykota Mezin a Hînkaran) (15-18.12.1969) pêk tên. Barnas jî tevlî van tevgeran dibe û ji ber tevlîbûna vê boykotê di derheqê Barnas û hin kesên din de lêkolînên edlî, îdarî û dîsîplînî tê kirin. Aliyê edlî ve mehkeme dibin û berat dikin lê Barnas ji alîyê îdarî ve di payîza 1970an de surgûnê Surûcê dibe.¹¹³

Surgûnbûna Barnas ya Surûcê ne tenê girêdayî tevgerên wî yê TÖSê ye, herwiha di wan salan de li Farqînê bûyerên sîyasî diqewimin û Barnas jî li hember qaymeqamê serdemê nerazîbûna xwe ya li hember wan bûyeran tîne ziman û van kirinan wekî bertekên kolonyalist bi nav dike. Ji ber vê helwesta wî qaymeqam bi Barnas dide zanîn ku wê li ser wî raporek amade bike. Barnas bixwe jî nizane ku ji ber rapora qeymaqam an ji ber boykotê surgûnê Surûcê dibe.¹¹⁴

Piştî salekî surgûnê Barnas bi biryara Danîştayê vedigere Farqînê û karê mamostetîyê jî didomîne. Ew di heman salê de bi îsrar û daxwaza kurdperweran endametîya DDKOyê qebûl dike. Her çiqas Barnas berê ji ber karmendîya xwe dudilî be jî piştî ku têdigihîje tişteke ku rasterast karmendîya wî têxe xetereyê tune ye ew daxwaznameyeke ji bo endametîyê dinivîsîne û dide rêveberîyê.¹¹⁵

Di 27 Avrêla 1971ê de li tevahîya Tirkîyeyê reveberîya awarte îlan dibe û esker diavêjin ser malan. Di vê bûyerê de dest didin li ser pirtûkên Barnas û wî dibin qereqolê. Li ser çend pirtûkên wî yê fransîzî di navbera Barnas û başçawiş de diyalogek derbas dibe û mijar tê li ser ziman, Barnas bi wî dide zanîn ku zimanê wî yê

¹¹² Barnas, *Farqîn (Silvan/ Silîvan)*, r. 167

¹¹³ Barnas, *Farqîn (Silvan/ Silîvan)*, r. 170-71-72

¹¹⁴ Barnas, *Farqîn (Silvan/ Silîvan)*, r. 174

¹¹⁵ Barnas, *Farqîn (Silvan/ Silîvan)*, r. 176

zirkmakî kurdî ye, ew tirkî paşê hîn bûye û tirkî zimanê fermî ye. Paşê ev axaftina wî di mehkemeyê de bi awayekî cuda tînin pêşberî Barnas û îdîa dikin ku wî gotiye tirkî zimanê wî yê bîyanî ye.¹¹⁶

Barnas herçiqas nebe endamê DDKOyê û tenê ji bo endametîyê daxwaznameya xwe dabe jî û hê nedîyar e ku daxwaza wî hatîye qebûlîkirin an na, bi îddîaya endametîya li DDKOyê û dîsa bi îddîaya ku wî gotîye zimanê wî yê zirkmakî kurdî ye û tirkî zimanê wî yê bîyanî ye tê mehkemekirin. Barnas bi biryara mehkemeyê tê girtin, du sal ceza û qedexeya hevdîtînê didin wî ku ji malbata wî kes nikare here dîtina wî.¹¹⁷

Li girtîgehê Barnas Îsmail Beşikçi dinase, ew di girtîgehê de bi hev re li ser ziman dixebitin, Barnas ji Beşikçi fransîzî hîn dibe û ew jî dersên kurdî dide Îsmail Beşikçi. Di heman demê de Barnas li girtîgehê dersên kurdî dide hevalan jî û ev qursa ku bi qasî 35- 40 dersan dewam dike bi operasyoneke bi dawî dibe û wan hevalan jî hev vediqetînin.¹¹⁸

Piştî du salan Barnas ji girtîgehê derdikevê û wî bi statuya “sakıncalı er” dibin eskerîyê, piştî qedandina eskerîyê ew pê dihesa ku wezareta hîndekarîyê di derheqê wî de biryara “hükmen emeklilik” derxistîye û têkîlîya wî û mamostetîyê birîne. Bi îtîraza Barnas ev biyar tê pûçkirin lê bi şerta ku li Muğlayê wekî katib bixebite biryarekê nû tê girtin. Barnas ji ber şert û mercên wê serdemê mecbur dimîne ku li gor vê biyarê bixebite. Ew ji 07.07.1975an heta 19.03.1979an bi neçarî li Muğlayê dimîne û wekî katib dixebite. Lê Barnas him dixwaze wekî mamoste kar bike û him jî dixwaze vegere welatê xwe. Ew bi hêvî û armanca vegera welat û mamostetîyê û bi pêşnîyara hin hevalan bi rêvberîya CHPê ya Muğlayê re têkîlîyê datîne. Lê daxwaza wî bi cih nayê û bi şertê ku ew heta sax be li Muğlayê bimîne vedigere ser karê xwe yê mamostetîyê.¹¹⁹

Barnas di wan salan de dîsa dest bi nivîsandina helbestan dike. Lê ji ber ku şert û mercên wan salan de nivîsandina bi kurdî qedexa ye û veşartina van berheman jî

¹¹⁶ Barnas, *Farqîn (Silvan/ Silîvan)*, r. 176-178

¹¹⁷ Barnas, *Farqîn (Silvan/ Silîvan)*, r. 182-183

¹¹⁸ Barnas, *Farqîn (Silvan/ Silîvan)*, r. 185

¹¹⁹ Barnas, *Farqîn (Silvan/ Silîvan)*, r. 184

zehmet e hin helbestên wî winda dibin. Ew di derheqê helbestên xwe yên wê demê de wiha dibêje:

“(..) di havîna 1979an de hatim Farqînê. Heta hingê min helbestên xwe yên *Li Bendava Spêde* bi sê nusxe daktilo kiribûn, bi mebesta ku veşêrin nusxeyek dabû nasek, yek dabû ba Salim Xoce ku hilînin da tişteke pê neyê. Nusxeyek jî li cem min mabû. Heta hingê gelek şîr û nivîsên min di lêgerînên polîs an di ihtîmala avêtina polîs a ser malê de hatibûn şewitandin an winda bibûn.”¹²⁰

Barnas di sala 1979an de destê xwe ji karmendîyê dikişîne û vedigere Farqînê. Piştî vegera xwe ew li Farqînê li ser kovara *Tîrêjê* (1979-1980) dixebite. *Tîrêj* kovareke xwerû bi kurdî ye ku ji dewra cumhûriyetê heta wê demê cara pêşîn e ku kovarekê seranser li ser ziman, çand, huner û edebîyatê ye. Di sala 1979an de digel hejmara ewil a *Tîrêjê* pirtûka Barnas a bi navê *Li Bendava Spêde* derdikeve.¹²¹ Herwiha *Tîrêj* tenê dikare çar hejmar derkeve, piştî sê hejmarên ewil bi hatina cûntaya leşkerî ya 12 Îlona 1980an weşana kovarê li Tirkîyeyê bi dawî dibe, hejamara dawî jî li Swêdê derdikeve.¹²²

Piştî cûntayê Rojen Barnas mecbûr maye cihêla bibe here Swêdê. Ew di 19/20ê tîrmeha 1982an de çûye Swêdê û hê jî li wir dijî.¹²³

Barnas li Swêdê jî xebatên xwe yên kurdî didomîne. Herwiha tê zanîn ku ji bilî pirtûka wî ya bi navê *Li Bendava Spêde* (pirtûka ewil a kurdî ye ku di serdema Komara Tirkîyeyê de çap bûye)¹²⁴ hemû berhemên xwe li Swêdê dinivîsîne. Barnas hê jî helbestan dinivîsîne û gelek helbestên xwe di kovara *Nûbiharê* de diweşîne.

2.2.1. Berhem

Herçiqas Rojen Barnas di edebîyata kurdî de bi helbestên xwe ve hatibe nasîn jî wî ne tenê helbest herwiha çîrok, bend û gotar jî nivîsandine. Helbestên wî di gelek kovarên mîna *Tîrêj*, *Berbag*, *Çarçira*, *Nûdem* û *Nûbiharê* de weşîyane û wî bi gelek

¹²⁰ Barnas, *Farqîn (Sîlvan/ Silîvan)*, r. 186

¹²¹ Barnas, *Farqîn (Sîlvan/ Silîvan)*, r. 186

¹²² Çelik, *h.h*, r. 39

¹²³ Barnas, *Kadiz*, r. 4

¹²⁴ Berken Bereh, “Ağzımda Kimliğim Benim”, (03.11.2019)

nasnavên cuda yê wekî Memo Guhderz, Şêrgo Ciwanroj, Sersax Arda, Ferîdûn Salar, Mihemed Qasim û Filît Totanî berhem nivîsandiye. Derbarê nasnavên xwe de wiha dibêje:

“(…) Min bi navê Rojen Barnas, helbest; Filît Totanî, çîrokên mîzahî; Sersax Arda; gotar û bend; Ferîdûn Salar, çîrokên didaktik ên sergiran; Mehemed Qasim, li ser folklorê dinivisand (...)”¹²⁵

Li Bendava Spêde (1979) (Şîr),

Heyv Li Esmânê Diyarbekirê (1983) (Şîr),

Milkê Evînê (1995) (Şîr),

Hingê (1997) (Çîrok),

Bi Kurmanciya Gewr (2005) (Bend û Gotar),

Farqîn (Silvan/Silîvan) (2013) (Ev berhem ji bo danasîna Farqînê hatiye amadekirin lê tê de di derheqê jiyana Barnas de jî heta sala 1980an agahîyan dide.),

Kadiz (2013) (Li Bendava Spêde, Heyv Li Esmânê Diyarbekirê, Milkê Evînê û Yelda)

2.2.2. Poetîka

Her berhema ku tê afirandin ji taybetîyên serdema ku jê dizê sûd werdigire û serdema xwe temsîl dike. Edebîyat jî yek ji wan rêyan e ku fersenda gotinê dide mirovan û mirov bi wan rêyan xwe digîhîne merem û mebesta xwe. Têkilîya di navbera ferd û civakê li ser dîyarkirina temaya helbestan hêmayeke xurt e. Helbestvan di berhemên xwe de cih didin hest, bawerî, xeyal, daxwaz, sîtem û gelek mijarên din. Civak jî hêmanekê girîng e ku li ser hestên helbestvanan tesîrê dike û em di berhemên wan de rastî tehlîlên civaka wan tên. Lewra nabe ku em helbestên Barnas ji jîyan û civaka wî veqetînin.

Rojen Barnas, şaîrekî romantîk e. Wek hemû nûjenîxwaz û romantîkan fikr, guman, îronî anî nav helbesta Kurmancîya li bakur û xwest wezna biqaîde bişkîne. Her wiha asoya temayên helbestê û awaz guherand, ruh û giyanê şair, erotîzm, kesayetî, xewn û xîyal vegotîneke cuda ya xwezayê lê zêde kir.¹²⁶

¹²⁵ Barnas, *Farqîn (Silvan/Silîvan)*, r. 186

¹²⁶ Berken Bereh, “Rojen Barnas”, *Kovara Nûbihar*, cild 19, h.133, sal 23, Îstanbul 2015, r. 8

Barnas bi mijarên cur bi cur yên wekî; hesreta welat, welatparêzî, ûmîdwarî, şoreşgerî, rastîyên civakê, kevneşop, hezkirin, dîrok, felsefe, çîrok, efsane, kilamên wêjeya gelêrî û hwd.ve asoyên nû li ber helbesta xwe vedike. Herçiqas helbestên Barnas bi mijarên têvel ve derbikeve pêşberî xwîneran jî wî helbestên xwe wekî amrazekê îdeolojîk dîtîye û bingeha xwe ji realîteya civaka xwe digire. Em dikarin bibêjin ku helbesta Barnas ji alîye mijarê ve li ser sê binyadan ava bûye ku ev sê mijar di jîyana wî de bûne azmûnên dijwar. Hesreta welat, êşên kurd û Kurdistanê û îdeolojî. Gelperwerî di helbesta Barnas de pareke mezin digire. Lewra ji dîrokê bigire heta çand, bawerî, êş û şahîya gel di helbestên wî de ciheke taybet digirin. Ew rastîya civaka xwe baş analiz dike ku bi her awayî teswîra vê civakê dike. Di helbestên xwe de cih dide cudahiya di navbera çînan, dibe şîrîkê êşên wan lewra êşên civakê êşên wî bixwe ne. Hin caran analîzên dîrokî dike û di helbestên xwe de cih dide leheng û motîfên dîrokî. Barnas di helbestên xwe de pir caran jî ji kanîya wêjeya gelêrî sûd werdigire û ew destan û çîrokên kurdî yên wekî Zembilfiroş, Mem û Zîn, Çîroka Pepûkê û gelekên din dixê nav honaka helbestên xwe. Barnas ji bo mijara helbestên xwe wiha dibêje:

“(…) Ne tenê kişandina nav dîrokê herwisa ez dixwazim bi xwendevanên xwe re meraqa lêkolîn an hînbûna sembol û hêjayiyên di folklor, efsane, destanan jî hiljenim, meraqa wan li kultura giştî geş bikim. Dixwazim ku xwendevanên min kesên wek sobeberên deryayî an yên di golên kûr de bin, ne ku wek rêwingiyên bihurên avên tenik bin ku heta gûzikê jî jê şil nebin. (...)”¹²⁷

Rojen Barnas di serdemek wisa de dest bi nivîsandina kurdî dike ku ji alîyê civakî de jî problem zêde ne ku bi taybetî mijarên polîtîk di rojevê de ye. Ev tercîha ku Barnas daye ber xwe wekî bertekek li hemberî vê polîtîzmê ye ku ew nivîsandina bi kurdî wekî mecbûreyeteke wijdanî dibîne û berê xwe dide kurdî. Di helbestên Barnas de jî şopa vê rewşê cih digire, êş û xemên civakê dibe mijara sereke ya helbestên wî. Wekî ku me berê jî gotibû ew helbestê wekî amrazekê îdeolojîk bi kar tîne, di helbestên wî de dengê zêdetir bilind dibe yên îtirazê ne ku li hember serdestan, mêtîngeran û zîlm û zordariyê ye. Ev jî renekî sîyasî dide helbestên wî. Barnas bixwe jî bi me dide zanîn ku wî bi biryareke sîyasî dest bi nivîsandina kurdî kirîye û berhemên

¹²⁷ Fahriye Adsay, *h.h.*, r. 76

wî de jî regekî sîyasî heye.¹²⁸ Ev îtiraz û sîtemên di helbestên wî de bi taybetî ji bo gelê kurd be jî di heman demê de ji bo gelên din e jî. Helbestên wî yên bi *navê Bêriya Welat, Çîroka Me, Yên Me û Yên We, Kuştin, Sotin, Talan* ji bo mijarên serdest minakên xurt in.

Helbest ji wate, deng û teşeyê ve pêk tê û ev hêman li dora mijareke de tên honandin. Helbest bi teşe û naveroka xwe ve tê nirxandin. Nabe ku ev hêmanên helbestê ji hev cuda bên şîrovekirin. Lewra naveroka helbestê bi teşeya xwe ve watedar dibe.¹²⁹

Barnas jî li gor terz û kevneşopa helbesta nûjen û serbest di helbestên xwe de terzên cuda bi kar tîne, li gor naveroka xwe terzên helbesta xwe jî diguherîne. Ew di hin helbestên xwe de risteyên xwe ne li gor qalibên adetî rêz dike. Wekî ku bêjeyan direşîne li ser kaxezê tenê bi bêjeyek risteyek ava dike, bi bêjeyan rismekê xêz dike. Bi vê terza xwe coş û kelecana mijarê dixê nava bêjeyan. Di risteyeke de bêjeyeke tenê bi kar tîne, bi wê bêjeyê risteyeke xweser derdixe holê û bi vî awayî balê dikişîne li ser wê peyvê û wekî qirpandinê bi kar tîne. Ji bo vê terzê helbesta wî ya bi navê *Bîbik Dirêsin* nimûneyekê baş e:

Evîn
Nîjad û dîn nanase:
Reşik,
 gewrik,
 zerik,
 û sorîn
Nîn in di ferhenga wê de
Gîşt wek hev
*mirovîn.*¹³⁰

Rojen Barnas hin helbestên xwe yên mijar evînî jî li gor kevneşopa helbesta klasîk bi pîvan û qalibê kêşeyî bi çarîn û beytan nivîsandiye û di hin helbestên bi vî terzê de jî cih daye hin têghehên wêjeya klasîk yên wekî; dilber, mey, birhên kevanî û hwd. Helbestên ku bi pîvan hatine nivîsandin zêtedir di pirtûkên bi navê *Milkê Evînê* û *Yelda* yê de cih digirin.

¹²⁸ Adsay, h.h., r. 76

¹²⁹ Şerif Aktaş, *Şiir Tahlili -Teori ve Uygulama-*, Kurgan Edebiyat Yayınları, Ankara, 2015, r. 33

¹³⁰ Barnas, Kadiz, r. 167

Barnas di warê ziman de jî li gor naveroka helbesta xwe tevdigere. Ji ber ku ew girêdayî rêbaza realîzma sosyalîst e û berhêmen xwe ji bo armanc û meramekê civakî diafirîne zimanê wî jî zimanekî sade ye. Lê her çiqas hewl bide zimanekî sade bi kar bîne jî helbet zimanê berhemên edebî ji axaftina rojane vediqete. Helbestvan gotinên xwe ji bêjînga hunerê de dibêjîne û bi xewn û xîyalên xwe ve berpêşî xwendevanan dike. Barnas jî vê hunera xwe bi îmajan derdixîne pêşberî xwîneran ku bi îmajên xurt yên wekî îmaja wetenîyê, hesretê, zordestîyê û hwd. helbesta xwe dewlemendtir dike. Bo nimûne em dikarin helbesta wî ya bi navê *Di Hembêza Firat û Di Paşila Dîclê De* bidin ku Barnas di vê helbestê de îmaja weteniyê bi kar tîne, di vê helbestê de di heman demê de hesreta welêt jî eşkere ye û ew rûbarên welêt wekî stargehekê dibîne.

“(…)
Di hembêza Firat û di paşila Dîclê de
Milkek heye li raser esmanekî bêdawî
Li kadiza wî sterin hene
Navên wan jî beriya b’hezarên salan
Me danî
Û ew
Bi delalî
*Diçirisin.*¹³¹

Dîsa Barnas bi kar anîna terkîbên wekî; “*ramîsanên rojê, îsîna stêrkan, perê esmên, okyanusa dîlistanî*” ve çêjêke cuda daye helbesta xwe. Herwiha wî di gelek helbestên xwe de bi kar anîna pêyvên dijiwate ve vegotina xwe xurtir kiriye:

Em
Hevrayê hev in
Li pêsarê
Li rîyan
Û di belengaziya malhebûnê de
*li dinê*¹³²

Bi kurtî Rojen Barnas yek ji helbestvanê serdema modern e ku bi xebatên xwe, bi xem û fikara li ser ziman û bi terz û naveroka helbestên xwe wejêya modern ya kurdî de cih girtiye.

2.3. NÂZIM HİKMET

¹³¹ Barnas, *Kadiz*, r. 241

¹³² Barnas, *Kadiz*, r. 115

2.3.1. Jîyan

Nâzım Hikmet di 15ê Çileyê sala 1902an de li Selanîkê ji dayik bûye. Ew di nav malbateke xwenda de mezin bûye. Bav û kalikê wî û gelek kesên ji malbata wî di karên dewletê de xebitîne, ji malbateke burjuvazî tê. Wî ji zoraktîye heta xortanîyê jiyana xwe li Stenbolê derbas kirîye. Perwerdehîya ewil qasî salekê di mektebekê fransî de girtîye lê paşê di mektebên wekî “Göztepe Numune Mektebî û Nişantaşı Sultanisi” yê de xwendina xwe domandîye.¹³³

Hikmet hîn di salên dibistanê de dest bi nivîsandina helbestan kirîye. Di wan salan de şerê cihanê yê yekem dest pê kirîye û di malbata wî de mijar û axaftin her li ser şer bûye. Xalê wî (Mehmet Alî) jî di şer de hatîye kuştin.¹³⁴ Ji ber van sedeman helbestên Hikmet ên ewil ên wekî; *(Vatana) (Bo Wetên), Olma Mağlup (Têk Neçe) Şehîd Dayıma (Ji Pakrewanê Xalê Min Re), Irkıma (Bo Qewmê Min)* de mijar zêdetir li ser hezkirina welat û hestên netewperweriyê ne.

Di sala 1914an de Hikmet helbesteke bi navê “*Bir Bahriyelinin Ağzından (Ji Devê Deryavanekî/Gotinên Deryavanekî)*” dinivîsîne. Ev helbest ji alîyê dostê malbata wî nazirê behriyeyê Cemal Paşa ve pir tê ecibandin. Bi pêşniyaza wî Nâzım Hikmet di behriyeya Heybeliadayê de dest bi xwendina leşkerî dike.¹³⁵ Lê ew xwendina xwe naqedîne, li ser vê meseleyê agahîyên cuda hene. Di wan salan de Stenbol tê dagirkirin û leşkerên bîyanî li wir serdest in, li gor hin çavkanîyan Hikmet ji ber acizîya vê meseleyê dev ji xwendinê ber dide, lê li gor hin çavkanîyan jî ji ber bê dîsîplînîyê ji mektebê hatîye avêtin. Li gor saloxên ku xwenga Hikmet daye ew ji ber nexweşî ya xwe dev ji xwendinê berdide.¹³⁶

Nâzım Hikmet ji ber şer û dagirkirina Stenbolê gelek xemgîn dibe û li ser vê meseleyê helbesta xwe ya bi navê *Mütareke Geceleri (Şevên Agirbestîyê)* dinivîsîne.

¹³³ Asim Bezirci, *Nâzım Hikmet – yaşamı, şairliği, eserleri, sanatı*-, Evrensel Basım Yayın, İstanbul, 2016, r. 15

¹³⁴ Bezirci, *h.b.*, r. 18

¹³⁵ Bezirci, *h.b.*, r. 15-16

¹³⁶ Ersin Özarslan, *Nâzım Hikmet – hayatı ve şiiri*-, Zanîngeha Hacettepe, Enstîtuya Zanistên Cîvaki, Teza Doktorayê, Ankara, 2003, r. 75

Di sala 1920 an de jî helbesteke bi navê *Gençlik (Ciwanî)* dinivîsîne û di vê helbestê de bang li ciwanan dike ku ji bo rizgarkirina welat çalakîyan bikin.¹³⁷

Nâzım, Vâlâ Nureddin û çend hevalên din ji bo piştgirîyê bidin “têkoşîna neteweyî” di çîleya 1921ê de diçin Anatolyayê. Li wir destûra çûyîne nagirin ku biçin enîya şer û bi alîkarîya rêvebirê hîndekarîyê Kazım Naimi li Boluyê dibin mamoste.¹³⁸ Nâzım Hikmet û Nureddin Vâlâ li wir sosyalîstekî bi navê Sadık Ahi (Mehmet Eti) û hevalên wî nas dikin. Li ser sosyalîzmê sohbet dikin, ev sohbet li ser Hikmet gelek tesîr dihêle. Hikmet ê ku heta wê rojê xwe wekî neteweperwerê xurt qebûl dikir bi naskirina sosyalîzmê ve li ser fikrên xwe yê neteweperwerîyê dikeve gumanê. Li xwe difesile, li ser mêtîngerî û cudahiye çînî û hwd. difikire. Hikmet pê derdixe ku ew di van mijaran de xwedî kêr agahîyan e û lazim e xwe pêşdetir bibe. Ew û Vâlâ Nureddin ji bo perwerdehiya xwe temam bikin û Şoreşa Bolşevîkan ji nêzîk ve bişopînin dixwazin biçin Yekîtiya Sovyetê. Ew tebaxa 1921ê de berê xwe didin Sovyetê. Nâzım Hikmet di vê maweyê de jî her tim helbestan dinivîsîne. Helbesta xwe ya *Açların Gözbebekleri (Bîbîka Birçîyan)* jî li ser tiştên ku di rêwîtiya xwe de dîtîye nivîsandîye.¹³⁹ Piştî demekê ew li Moskovayê di Zanîngeha Komînîst a Kedkarên Rojhilatê (KUTV) de dest bi xwendinê dike. Nâzım Hikmet û Nureddin Vâlâ li wir beşa zimanê fransîzî de dixwîn û paşê di zanîngehê de dersên tirkî didin. Hikmet bi şanoyê re jî mijûl dibe û di zanîngehê de kuluba şanoyê ava dike.¹⁴⁰ Ew di zanîngehê de bi gelek kesên bîyanî yê wekî; Si-Ya-U, Benerci, Hasan Zafer û Safer re hevaltîyê dike û di helbestên xwe de jî behsa van kesan dike.¹⁴¹ Helbestên xwe li wir jî bênavber dinivîsîne û wan dişîne Stenbolê. Helbestên wî di salên 1923-24an de di kovara *Aydınlık* de diweşe.

Nâzım Hikmet li Moskovayê bi gelek rewşenbîr û şairan nas dike, di civatên wan de cih digire. Di sala 1922an de Mayakovski nas dike û di bin tesîra helbestên wî de dimîne.¹⁴²

¹³⁷ Bezirci, *h.b.*, r. 20

¹³⁸ Asım Bezirci, *h.b.*, r. 21

¹³⁹ Bezirci, *h.b.*, r. 23-25

¹⁴⁰ Özarlan, *h.t.* r. 146

¹⁴¹ Özarlan, *h.t.*, r. 147

¹⁴² Özarlan, *h.t.*, r. 132

Di sala 1924 de Hikmet vedigere Tirkîyeyê û dibîne ku li welat gelek tişt guherîye. Mustafa Kemal komarekî nû ava kirîye. Hikmet ji rewşa welatê xwe ya wê serdemê aciz dibe lewra gel hêj jî di nav xizanîyê de ye û di nav gel de cudahiye çînî jî berbiçav e. Nâzım Hikmet li Tirkîyeyê jî xwedî li fikrên sosyalîzmê derdikeve, wekhevîya mirovan ji bo wî girîng e û em van fikran di helbestên wî de jî gelek caran dibînin. Ew li Tirkîyeyê him bi nasnavên “N.H û Ahmet” ji kovara *Aydınlık* re li ser van fikrên xwe helbestan dinivîsîne û him jî bi karên teknîk ên kovara bavê xwe ya bi navê *Sinema Mecmuası* ve mijûl dibe. Herwiha di rojnemaya *Orak-Çekiç* de jî dinivîsîne.¹⁴³ Ev kovar û rojname ji Hikmet re dibin qada xebatên siyasî û îdeolojîk. Hikmet di 1ê Çileyê 1925an de wekî delegeyê KUTV yê beşdarî “Kongreya Duyem a Partiya Komünist a Tirkîyeyê” dibe. Rêvebirîya wê serdemê li hemberî fikrên komünist in û him jî ji xwe re muxalîf naxwazin. Di sala 1925an de jî ji ber Serhildana Şêx Seîd qanûna “Takrîr- î Sukûn” derdikeve. Ji ber van sedeman him rê li ber muxalefetê tê girtin û him jî gelek kovar û rojname tên girtin. Ji ber ku kovara *Aydınlık* jî şaxa weşanê ya “Partiya Sosyalist a Gundî-Karkeran a Tirkîyeyê” ye, ew jî tê girtin.¹⁴⁴ Di derheqê nivîskarê li derdora vê kovarê de jî biryara girtinê derdikeve. Hikmet wê demê li Îzmîrê ye, xwe vedişêre û di payîza 1925an de direve Yekîtîya Sovyetê.¹⁴⁵

Nâzım Hikmet di serdema duyem a jîyana xwe ya li Sovyetê de zêdetir bi wêjeyê re mijûl dibe û li KUTVê wergêrî û lektorîyê dike.¹⁴⁶ Ew piştî du salan dîsa dixwaze vegere welatê xwe lê sefaretxaneya tirkan destûrê nadin. Hikmet bê pasaport û bi nasnameyeke sexte vedigere Tirkîyeyê. Li Hopayê tê girtin û wî dişînin Ankarayê, girtina wî di rojnameyan de tê nivîsandin. Hikmet piştî sê mehan ji girtîgehê derdikeve û diçe Stenbolê.¹⁴⁷

Nâzım Hikmet li Tirkîyeyê çendîn caran ji ber helbest û nivîsên xwe hatîye girtin. Rêvebirîya wê serdemê helbestên wî wekî tehdît dîtîne. Li gor rêvebirîyê Hikmet di helbestên xwe de propagandaya sosyalîzmê dike û bi vê helwestê gel û eskeran li hember rejîmê teşwîqî serhildanê dike. Ji ber van sedeman Hikmet di jîyana

¹⁴³ Bezirci, *h.b.*, r. 26

¹⁴⁴ Mariya Leontiç, “Nâzım Hikmet’in Hayatı ve Şiirleri” (20.10.2019), r. 4

¹⁴⁵ Bezirci, *h.b.*, r. 27

¹⁴⁶ Özarlan, *h.t.* r. 184

¹⁴⁷ Bezirci, *h.b.*, r. 203

xwe de çar caran tê girtîn û bi giştî 15 salên emrê xwe di girtîgehan de derbas dike. Wî di girtîgehan de jî her tim helbest nivîsandiye. Wexta ew di girtîgehê de bûye hezkirîyên wî ji bo derxistina wî ya ji wir gelek xebat kirine. Gelek kampanya tên lidarxistin, gelek nivîskar û rewşenbîrên demokrat, rêxistinên navneteweyî yên wekî UNESCO, Îleri Jöntürkler Birliği (Yekîneya (Rexistina) Jontürkên Pêş), Dünya Demokrat Gençlik Federasyonu (Federasyona Xortên Demokrat a Cihanê) piştgirî dane van kampanyayan. Herwiha Hikmet jî li girtîgehê dest bi greva birçîbûnê dike û şairên mîna Orhan Veli, Oktay Rifat, Melih Cevdet jî ji bo piştigirîyê bidin Hikmet sê rojan grev dikin. Diya Hikmet Celile Xanim jî li ser pireya Halîçê înzeyan berhev dike.¹⁴⁸ Lê ev xebat bê encam dimînin. Piştî ku rêvebirî diguhere, Partîya Demokrat tê serî û qanûna efê tê derxistin. Hikmet jî di sala 1950î de tê berdanê.¹⁴⁹

Nâzım Hikmet piştî derketina ji girtîgehê jî gelek tengasîyan dibîne. Ew gelek wext karekî nabîne ku debara xwe bike. Ji alîyekî ve jî polîs her tim wî teqîp dikin. Di 48 salîya wî de ji bo eskerîyê bangî wî dikin lê Hikmet naxwaze biçe eskerîye, wisa texmîn dike ku wê li wir bê kuştin. Jî ber vê sedemê jî mecbûr dimîne ku dev ji welatê xwe berde. Ew di 17 Hezîrana 1951î de dîsa berê xwe dide Moskovayê.¹⁵⁰

Nâzım Hikmet heta dawîya emrê xwe li Moskovayê dijî, Moskova ji wî re dibe welatê duyemîn û li wir gelek qîmetê didin Hikmet. Ew li wir dibe endamê Konseya Aşitîyê ya Cihanê (Dünya Barış Konseyi) û ji ber vê sedemê jî li gelek welatê cihanê digere, tevî civînan dibe. Di hin helbestên xwe de jî cih dide wan welatên ku gerîyaye. Di vê serdemê de Polonya him hemwelatîya rûmetê û him jî pasaportê dide Hikmet.¹⁵¹

Nâzım Hikmet her çiqas li derveyî welatê xwe gelek qîmet û rûmetê bibîne jî li welatê xwe heman qîmetê nabîne. Ew di 15 Tîrmeha 1951î de bi biryara “Bakanlar Kurulu” (lijneya wezareta Tirkîyeyê) ji hemwelatîyê tê derxistin. Sedema girtina vê biryarê jî wisa diyar dikin ku Hikmet bê pasaport ji welat derketîye û ew bi armanca belavkirina fikrên komînîzmê ji bo rêvebirêya Sovyetê dixebite.

¹⁴⁸ Bezirci, *h.b.*, r. 57-59

¹⁴⁹ Bezirci, *h.b.*, r. 62

¹⁵⁰ Bezirci, *h.b.*, r. 67

¹⁵¹ Bezirci, *h.b.*, r. 69

Di jîyana Nâzım Hikmet de gelek jin cih digirin û li ser van jinan jî helbest nivîsandîye. Qasî ku tê zanîn ew çar caran zewicîye, navên hevserên wî; Nûzhet, Hatice Zekiye Pirayende, Münevver û Vera ye. Tenê zarokekî Hikmet ê bi navê Mehmet heye.

Nâzım Hikmet di 3yê Hezîrana 1963an de koça dawî dîke û gora wî li Rusyayê di goristana Novi Devîçi de ye.

2.3.2. Berhem

Wekî ku me berê jî gotibû Nâzım Hikmet hîn di zaroktîya xwe de dest bi nivîsandina helbestan kiriye. Wî zaroktiya xwe de pir xwendîye, ji bo kovar û rojnameyan jî helbest û nivîs nivîsandîye. Wexta li Tirkîyeyê bûye her tim bi wêjeyê re mijûl bûye û bi nivîskar û helbestvanên dema xwe ve di nav têkîlîyê de bûye. Dema ku çûye Sovyetê jî eleqeya wî ya li ser wêjeyê dewam kirîye û gelek helbestvan û nivîskarên navdar naskirîye.

Helbestên Nâzım Hikmet di kovarên wekî *Yeni Mecnû*, *Alemdar*, *Ümit*, *Yedinci Kitap*, *Sekizinci Kitap* de weşîyane û bi vî şiklî Hikmet di qada wêjeyê de hatîye naskirin. Lê helbestên Hikmet bi salan li Tirkîyeyê hatine qedexekirin û li derveyî welat derfeta çapkirinê dîtine. Pirtûkên wî li gelek welatên biyanî de hatine çapkirin, di navbera salên 1965 û 1966an de li Tirkîyeyê jî ji 20an zêdetir pirtûkên wî hatine çapkirin.¹⁵²

Nâzım Hikmet zêdetir helbest nivîsandîye, ji xeynî helbestan metnên şanoyan, çîrok, roman û senaryoyan jî nivîsandîye. Ji bo debara xwe gelek werger jî kirine. Hikmet di berhemên xwe de nasnavên mîna; “N.H, Ahmet, Mazhar Lütfü, Yeni Edebiyat, İbrahim Sabri, Selma Muhtar, Orhan Selim, İmzasız Adam, Süleyman, Hür Adam û Ben” bi kar anîye.

Gelek berhemên Nâzım Hikmet him di serdema jîyana wî de him jî piştî mirina wî hatine çapkirin. Hemû berhemên wî yên çapkirî ev in:

¹⁵² Bezirci, *h.b.*, r. 193

Şiir

“Dağların Havası” (1925), “Güneşi İçenlerin Türküsü” (1928), “835 Satır” (1929), “Jokond ile Si-Ya-U” (1929), “Varan 3” (1930), “1+1= Bir” (1930), “Sesini Kaybeden Şehir” (1931), “Gece Gelen Telgraf” (1932), “Benerci Kendini Niçin Öldürdü?” (1932), “Portreler” (1935), “Taranta Babu’ ya Mektuplar” (1935), “Simavne Kadısı Oğlu Şeyh Bedrettin Destanı” (1936), “Yatar Bursa Kalesinde” (1929-1951), “Kurtuluş Savaşı Destanı” (1965), “Saat 21.00-22.00 Şiirleri” (1965), “Memleketimden İnsan Manzaraları I-V” (1965-1967), “Dört Hapisaneden” (1966), “Rubailer” (1966), “Yeni Şiirler” (1966), “İlk Şiirleri” (1969), “Son Şiirleri” (1970).

Şano

“Kafatası” (1932), “Bir Ölü Evi Yahut Merhumun Hanesi” (1932), “Unutulan Adam” (1934-1935), “Fatma Ali ve Diğerleri” (1952), İvan İvanoviç Var mıydı, Yok muydu?” (1954), “Ferhad ile Şirin” (1965), “Enayi” (1965), “İnek” (1965), “Yolcu” (1965), “İstasyon” (1965), “Sabahat” (1965), “Ocak Başında” (1966), “Bu Bir Rüyadır” (1966), “İnsanlık Ölmedi Ya” (1967), “Allah Rahatlık Versin”(1967), “Evler Yıkılınca” (1967), “Yusuf ile Menofis” (1967), “Demokle’nin Kılıcı” (1974), “Tartüf-59” (1990), “Kadınlar İsyanı” (1990), “Yalancı Tanık” (1990), “Kör Padişah” (1990), “Her Şeye Rağmen” (1990).

Roman

“Öteki Defterler (Orası- Zeytin ve Üzüm Adası)” (1938) “Kan Konuşmaz” (1965), “Yeşil Elmalar” (1965), “Yaşamak Hakkı” (1966), “Yaşamak Güzel Şey be Kardeşim” (1967).

Çîrok

“Orman Cüclerinin Sergüzeşti” (1932), “Sevdalı Bulut” (1968).

Nameyên ku Hatine Çapkirin

“Cezaevinden Memet Fuat’a Mektuplar” (1967), “Kemal Tahir’e Mapushaneden Mektuplar” (1968), “Oğlum, Canım Evladım, Memedim” (1968), “Bursa Cezaevinden Va-Nu’lara Mektuplar” (1970), “Piraye’ye Mektuplar 1-2” (1998).

2.3.3. Poetîka

Edebîyat awêneya civakê ye, helbest jî hêmanekê girîng a vê meseleyê ye ku dibe dengê civaka xwe, hişmendîya neteweyî di civakê de ava dike û civaka xwe ber bi armançekê ve dibe. Jîyan li ser her kesî bi awayekî tesîr dihêle, her kes di vê pêvajoyê de dibe xwediye gelek serpêhatîyan û tecrubeyan hildide. Helbestvan jî wan tecrube û zanînen xwe di helbestên xwe de bi kar tînin.

Nâzım Hikmet jî yek ji wan helbestvanan e ku helbesta wî û serpêhatîya wî di nav hevsengîyê de ne. Di helbestên wî de rengê jîyana wî xuya dibe. Ger em bala xwe bidin helbestên wî em ê bibînin ku wî çî bûyerên ku bandor li ser wî û ciwakê hiştibe xistîye nava helbesta xwe.

Pêvajoya helbestvanîya Nâzım Hikmet de tê dîtin ku helbestên wî ji alîyê mijarê ve pircureyî ne. Di helbestên wî de mijarên wekî; welat, hesreta welat, evîn, dîrok, şer, êşên şer û pevçûnan, aşîfî, mafên karkeran, hezkirin, hêvî, jiyana rojane, rexne, hezkirina mirovan, siruşt, îdeolojî û çakbînî serdest in.

Di helbestên wî yên ewil de bandora romantîzmê tê dîtin, ji ber ku serdema wî beranberî şerê cihanî tê ew helbestên xwe bi xema welat û bi hestîyarîya neteweyî û qehremanîyê dinivîsîne. Di helbestên wî yên bi navê *Çelik (Pola)*, *Feryad- ı Vatan (Hewara Welêt)* de ew hest û ramanên neteweperwerîyê tê dîtin.

Dîsa di navbera salên 1913-15an de Nâzım Hikmet di helbestên xwe zêdetir cih dide xem û kêfxweşîyên şexsî, bi taybetî jî mijara evînê zêdetir tê dîtin. Di helbestên bi navê *Hala Gelmedi Haber (Hêj Xeber Nehat)*, *Ölümün Sırrı (Raza Mirinê)* û *İntizar (Bendewar)* de melankolî û xemgînî serdest in.

Him çûyîna Nâzım Hikmet a li Sovyetê û him jî nasîna komînîzmê fikr û îdeolojîya wî guherandîye. Herwiha rengê helbesta wî jî him ji alîyê naverokê ve him

jî ji alîyê şêweyê ve guherîye. Hikmet di vê serdema nû de berê xwe zêdetir dide mijarên civakî, li dijî emperyalîzmê tê, serdestan rexne dike, li ser mafên karker û gundîyan dinivîsîne. Mînaka ewil ya vê guherînê helbesta wî ya bi navê *Meşin Kaplı Kitap* e lê ev helbest her çiqas ji alîyê naverokê ve nû be jî ji alîyê şiklê ve ji helbesta kevn (koşuk) dûr neketiye.¹⁵³ Helbesta wî ya bi navê *Açların Gözbebekleri* him ji alîyê şêweyê ve û him jî ji alîyê naverokê ve mînaka helbesta nû ye. Hikmet di vê serdemê de dîsa cih dide hestên netewetîyê lê êdî ji bilî neteweya xwe neteweyên din jî dike mijar û cih dide problemên wan jî.

Ger em bi giştî helbesta Nâzım Hikmet ji alîyê mijarê ve binirxînin em dikarin bibêjin ku helbesta wî ji mijarên şexsî ber bi mijarên civakî ve û ji mijarên netewetîyê ber bi mijarên gerdûnî ve çûye.

Nâzım Hikmet girêdayî nêrîna civakî ye û hunereke ji bo gel, rastîbîn (realîst), şoreşger û ronak diparêze. Ew li ser mijara realîzmê wiha dibêje;

“Îro realîzm alaya wêjeya herî pêşdetir e. Îro realîzm bûye şîara bingehî ya hunera şoreşvan ku mijaran ne yekalî û pasîf lê bi hemû rastîyan ve vedibêje. (...) Li gor min xusûsîyeta ku pirtûkên hûnerî yên mezin ji yên sexte vediqetîne ev e; ya heyî ne weke bêliv û hişkîyekî lê weke xwe radigîhîne. (...)”¹⁵⁴

Ger em ji despêkê heta dawîyê li ser helbesta Hikmet rawestin em ê terz û şêweyên gelek cuda bibînin. Ew di axaftinekê xwe de vê mijarê wiha zelal dike:

“Bi gelemperî di nivîsên min de pîvan û şêweyekê diyarkirî tune. Lê şêwe û pîvan heye. Him pîvana kîteyî him pîvana arûzê û hin caran jî tiştên ji wan cuda bi kar tînim. Ez şêweyên ku li gor helbesta dînamîk e ku bi hemû bizavên xwe ve realîteyê radigîhînin bi kar tînim. (...) Wexteke ez di çend nivîsên xwe de ne Mayakovski lê bi gelemperî di bin tesîra Futurîzmê de mam. Lê ev şoreşa futurîzmê zû, pir zû derbaz bû.”¹⁵⁵

Wekî ku Nâzım Hikmet bi xwe jî dîyar dike ku di helbestên wî de gelek terzên cuda hene. Di helbesta xwe ya bi navê *Kerem Gibi (Mîna Kerem)* ev terz tê dîtin ku

¹⁵³ Doğan Aksan, *Nâzım Hikmet Şiirinin Gücü*, Bilgi Yayınevi, Ankara, 2009, r. 43

¹⁵⁴ Bezirci, h.b., r. 127

¹⁵⁵ Bezirci, h.b., r. 128

şair bêjeyan perçe kirîye û bi vî awayî serwayek bidestxistîye, wî bi şiklî rîtmekê cuda derxistîye holê.

Deeert
çok,
hemdert
yok
Yürek-
-lerin
Kulak-
-ları
sağır...
Hava kurşun gibi ağır¹⁵⁶

(Derd
zêde
hemderd
tune
Guhê
dilan
ker in
Hewa wekî risas giran e)

Helbestvan ji bo vegotina xwe xurtir bikin ji hêza hunerên edebî sûd werdigirin Nâzım Hikmet jî ji bo tesîra gotinên xwe xurtir bike gelek caran hunera şibandinê bi kar anîye û vê helbesta xwe de jî hatina şevê bi şibandineke resen sêwirandîye:

*İşte çoktandır ki gece
kara gömlekli bir Faşist ordusu gibi geldi.*¹⁵⁷

*(Va ye ji zû de ye ku şev
Wekî artêşeke faşîstên îşlik reş hat)*

Yek ji taybetîyên sereke ya helbestên Nâzım Hikmet ew e ku; hêza wî ya sêwirandinê derdixin holê. Lewra ew di helbestên xwe de digel şibandinên resen îmajan jî gelek caran bi kar tîne. Ew di hemû helbestên xwe de cih, kesayet û bûyerên ku behs dike bi îmajên xurt derdixe pêşberî xwîneran. Bo nimune em dikarin behsa helbesta Hikmet a bi navê *Angina Pectoris* bikin ku ew di vê helbestê de wexta behsa hezkirina welatê xwe dike ji îmajan îstîfade dike û dilê xwe dişibîne “sêveke sor” ku

¹⁵⁶ Nâzım Hikmet, *h.b.*, r. 204

¹⁵⁷ Nâzım Hikmet, *h.b.*, r. 84

ji bo welatê xwe tenê dikare dilê xwe bide. Dîsa di helbesta xwe ya bi navê *Vera*’ya
(*Bo Verayê*) de îmajên siruştî bi kar tîne:

*“Bir ağaç var içimde
Fidesini getirmişim güneşten
Salınır yaprakları ateş balıklar gibi
Yemişleri kuşlar gibi ötüyor”*¹⁵⁸

*(Darek heye di hundirê min de
Şitila wê anîye min ji hetavê
Dihejin pelên wê wekî masîyên agir
Fêkîyên wê dixwînin wekî çivîkan)*

Bi van îmaj û şibandinên xwe dike ku li ber çavê xwedevan rismekê derxîne
hole. Di vir de zimanê ku ew bi kar tîne jî roleke giring gêraye. Nâzım Hikmet ji ber
ku di helbestên xwe de zêdetir behsa civakê dike, îdeolojîya xwe bi rêya helbestan dide
zanîn û ji kelepore wêjeya gel sûd werdigire zimanê xwe jî li gor vê naverokê bi kar
tîne. Ew di helbestên xwe de vegotîneke siruştî bi kar tîne û risteyên xwe wekî hevokên
ji axaftîneke rojane rêz dike. Helbestên bi navê *Vapur, Sofra, Kuvâyi Milliye* û ev
helbesta li jêr ku wî ji bo hevsera xwe nivîsandîye ji bo fehmkirina terza zimanê
Hikmet mînakên baş in:

*Seni asarlarsa
Seni kaybedersem diyorsun,
‘Yaşayamam!’
Yaşarsın karıcığım.*¹⁵⁹

*(Tu dibêji
Ger te daleqînîn
Ger tu ji deste min biçî
“Nikarim bijîm!”
Tu yê bijî xanima min.)*

Di vê beşê de me hewl da ku em jîyan, berhem û poetîkaya her du şairan bi
kurtî bidin nasîn. Wekî ku tê ditin di serpehatîyên wan de jî beşên hevpar hene û jîyan
û berhemên her duyan jî di nav hevsengîyê de ye ku em di berhemên wan de jî rastî
realîteya wan tînin. Di beşa sêyem de em ê zêdetir bikevin nav kurahîya hevparîya

¹⁵⁸ Nâzım Hikmet, *h.b.*, r. 1717

mijarên helbestên van her du helbestvanan. Jîyan û taybetmendîyên serdema wan wê ji bo tehlîl û şîroveya helbestan ji me ve digihîjine hev.



BEŞA SÊYEM

DI HELBESTÊN ROJEN BARNAS Û NÂZIM HİKMET DE MIJARÊN HEVPAR

Xebatên zanista wêjeya berawirdî zêdetir li ser naveroka berheman radiweste. Di wêjeya cîhanî de gelek berhemên hevdemî (senkronik) an jî nehevdemî (diyakronik) hene ku li ser heman mijar û motîfan hatine honandin.¹⁶⁰ Di vê lêkolînê de helbestên ku em dixwazin li ser rawestî û bidin ber hev jî helbestên serdemên cuda ne. Dîwana Nâzım Hikmet ya bi navê *Bütün Şiirleri* jî helbestan pêk tê ku di navbera salên 1913 û 1963an de hatine nivîsandin û berhema ku em dixwazin bi vê dîwanê re berawird bikin jî *Kadiz*¹⁶¹ a Rojen Barnas e ku jî helbestan pêk tê ku di navbera salên 1965 û 2001ê de hatine nivîsandin. Her çiqas ev her du berhem di serdemên cuda de hatibin nivîsandin jî ji ber ku di nav xwe de mijar û motîfên hevpar dihevin jî bo xebatên zanista wêjeya berawirdî bingeheke guncav temîn dikin.

Di berawirdkirina du berhemên edebî de girîngî ji selimandina tesîra di navbera hunermendan zêdetir li ser ravekirina xalên hevpar û cuda de ye.¹⁶² Me jî bi vê nezerê di vê lêkolînê de cih da helbestên Nâzım Hikmet û Rojen Barnas ku helbestên xwe bi heman cîhanbînîyê nivîsandine û wekî du helbestvanên sosyalîst tên nasîn. Di helbestên wan de ji alîyê ruxsarî û naverokî ve gelek xalên hevpar hene lê me di vê xebatê de tenê cih da berawirdkirina naveroka helbestan ku li gor vê rebaza berawirdî sêzdeh mijarên hevpar hatin tespîtkirin. Ev hevparî û wekhevîyên ku hatine tespîtkirin li gor mijaran hatin senifandin. Di her beş an jî mijarê de me cih da agahî û nirxandinên kurt û ji bo pişrastkirina van nirxandinan me ji nimûneyên helbestên her du şairan îstîfade kirin.

Tê zanîn ku di berhemên helbestvanên sosyalîst de mijarên îdeolojîk û politîk desthil in. Rojen Barnas jî wexta ku têkilîya helbestên xwe û sîyaset û îdeolojîyê dike behsa helbestvanên navdar ên cîhanê wekî Ehmedê Xanî, Aragon (1897-1982), Brecht

¹⁶⁰ Aytaç, *h.b.*, r. 171

¹⁶¹ Di vê xebatê de me du helbestên Rojen Barnas ên derveyî berhema wî ya bi navê *Kadiz*ê jî bi kar anîye.

¹⁶² Aytaç, *h.b.*, r. 178

(1898-1956), Lorca (1898-1936) û Nâzım Hikmet dike ku ew jî di berhemên xwe de cih didin sîyaset û îdeolojîyê.¹⁶³ Di vê xebatê de jî hat tespîtkirin ku sîyaset û îdeolojîya çepgir bandor li ser perspektîfa hunerî ya Rojen Barnas û Nâzım Hikmet kirîye ku her du helbestvan zêdetir di van mijaran de dişibin hev.

3.1. Welat

Têgeha welat di ferhengê de weke; axa ku mirov li ser dijî tê pênasekirin lê ev têgeh di hişê her kesî de dîmenên cuda diafirîne. Ji bilî perçeyekî axê û weke têgeheke coxrafîk welat tê gelek wateyan. Bi gelemperî cihê ku mirov tê de mezin dibe, zaroktîya xwe li wir derbas dike û ji hêla hestîyarî ve xwe aîdî wir dibîne, wekî welat tê qebûlkirin. Helbet ev pênase di xwe de çarçoveyeke piçûk diheve. Lewra ev hestîyarî û aîdbûn ji bo herêmeke piçûk û gelê wir derbasdar e, hin kes têgeha welat di maneya niştîman de hin kes ji bo malbat û hezkirîyên xwe û hinên din jî ji bo hemû deverên wetenî bi kar tînin. Li gor şert û mercên serdeman têgeha welat rengên nû li xwe bar dike û di wateyên cuda de tê bikaranîn. Bi giştî em dikarin bibêjin tiştê ku têgeha welat watedar dike hest û ramanên mirov in. Rengvedana têgeha welat a di qada wêjeyê de jî xwe dispêre demên kevnar. Ji çîrokên gelêrî bigirin heta serdema klasik, ji destpêka serdema modern heta îro jî weke mijar têgeha welat tê bikaranîn. Di qada helbestê de jî tê dîtin ku gelek şair helbestên xwe li ser vê mijarê ava dikin.

Weke ku me berê jî gotibû têgeha welat li gor serdeman wateyên cuda li xwe bar dike. Zülküf Ergün li ser têgeha welat wiha dibêje:

“Di nav dahênana nerîtên neteweyî de cihekî dîyar ê dîmena sembolîk a welat heye. Ji ber vê jî welat di gotara neteweyî de wek cihekî helbestî tê şayesandin ku di çarçoveyên cuda cuda de reng û rûyê neteweyê dîyar dike. Li gor Smith dema bîranînên etnik bi axê ve tîr girêdan û rengê dîrokî bi siruştê tê bexşîn, dîmenên helbestî yê etnik tîr afirandin ku peywendîya wan bi rûdan û kesayetên girîng ên dîroka civaka etnîk re heye. Ji ber vê welat wek cihekî coxrafî bi taybetmendîyên xwe yê fîzîkî reng dide awayê jîyana endamên neteweyê û dibe nasname, karakter û çarenûsa wê. Bi vî awayî netewe û welat dibin yek û weha lê tê ku êdî gol, çîya, rûbar û gelîyên welat bi tevahî dibin taybetmendîyên dîyardeya

¹⁶³ Adsay, *h.h.*, r. 76

neteweyîkirina siruştê bi xwe re tîne ku welat êdî ji taybetmendîyên xwe yên fizîkî zêdetir bi wateya xwe ya sîyasî di gotara neteweyî de cihê xwe digire.”¹⁶⁴

Di helbestên Nâzım Hikmet û Rojen Barnas de jî yek ji temayên sereke “welat” e û wan jî di wateyeke sîyasî de li ser vê diyardeyê hezkirina xwe, hesreta xwe û rewşa welatê xwe vegotine.

3.1.1. Hezkirina Welat

Nâzım Hikmet û Rojen Barnas jî du şairên mişextîyê ne ku ev hevparîya jîyana wan dibe para helbestên wan jî. Ger em rengvedana têgeha welat a di helbestên Nâzım Hikmet û Rojen Barnas de binêrin wê bê dîtîna ku ev têgeh di nava mijaran de pareke mezin e. Wekî ku tê zanîn tiştên ji dest diçin zêdetir qîmetê dibînin û şîrîntir dibin. Ji ber ku her du şair jî bi neçarî ji welatên xwe dûr dikevin, di her fersendê de hezkirina welatên xwe tînin ziman.

Di paşxaneyê hezkirina welat a Rojen Barnas de dîmeneke neteweyî heye. Em vê rengê sîyasî û neteweyî di helbesta Barnas a bi navê *Pêrgîn* de bi awayekî zelal dibînin. Barnas di vê helbestê de hêmanên coxrafîk dişibîne laşê mirovan, ew Kurdistanê wekî laş herikîna Dicle û Firatê jî wekî xwîna wî laşî teswîr dike. Li gor Barnas çawa ku laş bê xwîn nabe herwiha welat jî beyî gel nabe. Bi vê peywendê jî Kurdistanê dişibîne bihuştê lê bi me dide zanîn ku welat bi hebûna kurdan ve dibe bihuşt, bêyî kurdan wateya bihuştê tune û gava ku welat ji dest biçe dinya li kurdan dibe zindan. Ev helbest di heman demê de banga xwedîderketina welat e jî:

“(…)
Dicle – Firat xwîn û can,
Laş bi xwe Kurdistan e.
Bê laş ma xwîn çi tişt e?
Xwîn û laş pêkve can e.
Ger kurdistan behişt e,
Bê kurd behişt xopan e.
Behişt ji dest çû
*Cîhan êdî zindan e.*¹⁶⁵

¹⁶⁴ Zülküf Ergün, *Nerît û Helbest-Nerîta Neteweyî Di Helbesta Nû Ya Kurdî De (1880-1970)-*, Weşanxaneyê Nûbihar, İstanbul, 2017, r. 133

¹⁶⁵ Barnas, *Kadiz*, r. 240

Nâzım Hikmet jî bi heman endîşeya sîyasî welatê xwe kirîye mijar û ji ber têkilîyên sîyasî ya di navbera Tirkîye û Amerîkayê acizîya xwe tîne ziman. Li gor wî welat tiştê herî bi qîmet e û ew vê têkilîyê wekî fîrotina welat şîrove dike. Hikmet jî welat wekî bedena însanekî teswîr dike ku avêtine ber lingê neyaran:

*Eli kolu zincirlere vurulmuş
vatan çırılçıplak yere serilmiş
Oturmuş göğsüne Teksaslı çavuş.
Beyler bu vatana nasıl kıydınız.¹⁶⁶*

*(Dest û pê hatîye zîncikirin
Welat şilfîtaî dirêj kirine li erdê
Runîştîye li ser singan çawîşê Teksasî
Efendîno hûn çawa li ber vî welatî neketin)*

Rewşa madî, manewî û exlaqî ya welat ji bo pêşveçûna welat hêmanên girîng in. Dîsa çand, ziman, orf û edet, nîrxên girîng ên çanda neteweyî ye û xirabûna van nîrxan zirarê dide hebûna welat. Kesên ku ji welatê xwe hez dikin qîmetê didin hemû nîrxên welêt. Yek ji taybetmendîyên girîng ên helbestvanên sosyalîst jî ew e ku di helbestên xwe de cih didin rastîyên civakî û çandî yên welat. Rojen Barnas jî yek ji helbestvanên sosyalîst û welatperwer e ku ji welatê xwe hez dike û di helbestên xwe de cih dide hemû deverên welêt û rewşa van deveran. Barnas di helbesta xwe ya ewil a bi navê *Çûm Diyarbekir* de cih dide welatê xwe û hezkirina xwe ya li ser welatê xwe eşkere dike. Di vê helbestê de li kuçe û kolanên Dîyarbekirê digere û rewşa wir bi îmaj û dîmenan ve disêwirîne. Barnas di çarîna ewil de ji ber dîtina welat kêfxweşî û kelecana xwe tîne ziman lê ev kêfxweşî kelecana wî ber bi çarîna dawî ve rengê xemgînî û endîşeyê digire. Ew di çarîna dawî ya heman helbestê de bi endîşe cih dide rastîya civakî, ji ber rewşa welat dikesire û pê diêşe. Her çiqas bi hêvî û bi eşqeke mezin diçe jî leqî xîyalşikênîyekê tê ji ber ku li welêt rewşa civakî, kulturî pir xerab e û wê ambîyansa ku li bendê bû nabîne. Bêmeferî û bêarmancbûna xortan, rewşa jinên welêt û halê rewşenbîr û zanyaran dibîne û pê xemgîn dibe. Barnas hezkirina welatê xwe di ser her tiştî de digire û digel sêwirandina rewşa welat bi me dide zanîn ku ew ji bo welatê xwe dikare canê xwe jî bide.

*Bi kêf û îşqek çûm Diyarbekir
Ji Dersim, Ji Botan, hezar diyarî*

¹⁶⁶ Hikmet, *h.b.*, r. 1668

*Bi îzet, bi îkram min selav lêkir
Bi destek vala û bi şermezarî
(...)
Ez reş û tarî bûm, sar bûm di cî da
Ev çi hal, ev çi xew, ev çi rexawet?
Me digot ji bo te canê me fîda
Zerîya enîreş, bajarê Amed!*¹⁶⁷

Wekî ku me di beşa jîyana wî de jî dîyar kiribû Nâzım Hikmet ji ber nêzîkbûna komînîzmê û reva li Rûsyayê ji hemwelatîya Tirkîyeyê tê derxistin û berhemên wî jî tîr qedexekirin. Lê ew li hember van kirinan jî tu carî dev ji welatê xwe bernade û her tim rewşa welatê xwe, hezkirin û hesreta xwe bi rêya helbestan tîne ziman.

Hêmana welat a ku di helbestên gelek şairên cîhanê da dêhna xwîner dide ser xwe di heman wextê da bûye mijareke sereke ya Nâzım Hikmet jî. Ya ku vê firsendê dide Hikmet jî dûrketina wî ya ji welatê wî ye. Hesreta welêt, mişextî, polîtîzasyona li dar a serdemê, neheqîya ku li ser şairê berbehs mewcûd e û etîketa welatfiroşîyê ya ku li ser wî rûniştandine hiştîye ku naveroka helbestên wî li gor vê yekê teşe bigire. Em dikarin bêyî cehdeke mezin helbestên Hikmet ên li ser hezkirina welat bibînin, ji ber ku wî heta dawîya emrê xwe hezkirina xwe anîye ziman û helbesta wî ya bi navê *Memleketimi Seviyorum (Ji Welatê Xwe Hez Dikim)* ji bo vê hezkirinê nimuneyeke baş e:

*Memleketimi seviyorum:
Çınarlarında kolan vurdum, hapisanelerin de yattım.
Hiçbir şey gidermez iç sıkıntımı
Memleketimin şarkıları ve tütününü gibi.*¹⁶⁸

*(Ji welatê xwe hez dikim;
Min hêlekan li darên wê yên çinarê xistine, li hepsên wê razame
Tu tişt ji nav ranake diltengîya hundurê min
Mîna stran û titûna welatê min.)*

Nâzım Hikmet di vê helbestê de ji bilî teswîra taybetmendîyên bajarên welêt cih dide rewşa gel jî. Bi sêwirandina civakê de cih dide her cure mirovan û ew berevajî Rojen Barnas di helbesta xwe de cih dide karakterên erênî ku wan wekî kesên jêhatî, binamûs û mêrxas te'rif dike:

¹⁶⁷ Barnas, *Kadiz*, r. 19- 20

¹⁶⁸ Hikmet, *h.b.*, r. 646

(...)
 ve renk renk
 salkım salkım üzümler
 ve sonra karabasan
 ve sonra kara sığır
 ve sonra: ileri, güzel, iyi
 her şeyi
 hayran bir çocuk sevinciyle kabule hazır
çalışkan, namuslu, yiğit insanlarım
 yarı aç, yarı tok
 *yarı esir...*¹⁶⁹

(*û tirîyên reng bi reng*
 guşî bi guşî
û paşê xewnereşk
û paşê reşe-ga
û paşê: ber bi pêş, bedew û baş
hazir ji qebûla her tiştî
 wekî şabûna zarokekî heyran
mirovên min ên jêhatî, xwedînamûs, egit
 nîvtêr, nîvbirçî
 nîvhêsîr...)

3.1.2. Hesreta Welat

Di mijara welat de her du helbestvanan jî zêdetir cih dane hesreta welat. Em dikarin bibêjin ku têgeha “hesreta welat” di nav hemû mijaran de ya herî berçav e. Di vê mijarê de em berê li ser hezkirina welêt rawestîyan. Ji ber ku ev her du têgeh girêdayî hev in û di bingeha hesretê de hezkirin heye. Lewra kesê ku bi awayekî ji welatê xwe hez neke wexta ji welatê xwe dûr bikeve hesreta welat nakişîne û vê hesretê nayîne ziman jî. Nâzım Hikmet û Rojen Barnas jî ji ber ku bi eşqeke mezin girêdayî welatê xwe ne ji bo wan dûrbûna ji welat gelek zehmet e. Ew vê zehmetîyê bi hesreteke mezin di gelek helbestên xwe de bi eşkere tînin ziman.

Rojen Barnas yek ji wan helbestvanên edebîyata kurdî ye ku bi mişextîyê ve hatîye ceribandî. Pareke mezin a jîyana xwe di xerîbîyê de derbas dike û hê jî li xerîbîyê ye. Di helbestên wî de em rastî vê rengê xerîbîyê tînin û ew bi hesreteke mezin qelema xwe bi kar tîne. Çavên wî her li ser welat e û dilê wî ji bo welat lê dide Barnas

¹⁶⁹ Hikmet, *h.b.*, r. 647

hîn di pirtûka xwe ya ewil ya bi navê “*Li Bendava Spêde*” de cih dide helbestên li ser hesreta welat. Tê zanîn ku Barnas berî çûyîna li Swêdê jî ji welatê xwe mişext bibû. Ew piştî derketina ji hepsê surgunî Muğlayê dibe û ev cara ewil e ku ji welatê xwe dûr dikeve. Cara pêşî haveyna helbestên wî yên politîk li vir xwe digire û hesreta wî li wir dest pê dike. Ew bêrîkirinê dişibîne *şîşa sorkirî* ku her tim dilê wî dişewitîne. Hesret bi şev û bi roj di dile wî de mezîn dibe, ev hesret bêhêvîtiyê bi xwe re tîne û tirs a wî ew e ku hesreta welat heta gorê di dil de bimîne.

(...)
Ew e, herzinga ber mirinê
-Ku pêt bi pêt li hinavan diçêre-
Bêriya welat, di dil de
Ev keser, ev xwezî hetanî gorê
*Tirsim bimîne pê re.*¹⁷⁰

Meriv li gorî haletî ruhîyeya xwe tev digere, dijî û bi heman awayî li ser berên xwe yên hunerî disekine. Ev ambîyansa ku hunermend tê de ye di berhema wî de teşe digire. Di helbestê de yek ji mijara desthil û berbelav jî hêvî ye û gelek helbestvanan li ser vê babetê şiklekî didine berhemên xwe. Li jorê wekî ku eşkere ye bêhêvîtiyek li dar e. Ev bêmeferî û tirs a nedîtina welat ya di helbesta Barnas de di helbesta Hikmet de jî xuya dibe. Helbesta Hikmet a bi navê *Vasiyet (Wesîyet)* jî bo vê bedbînîyê mînakekê baş e:

(...)
Yoldaşlar, ölürsem o günden önce yani,
- öyle gibi de görünüyor –
Anadolu’da bi köy mezarlığına gömün beni
ve de uyarına gelirse,
tepemde bir de çınar olursa
*taş maş da istemez hani...*¹⁷¹

(Dostên min, ku bimirim berî wê rojê
Wisa jî dixwîyê
Min veşêrên li goristana gundekî Anatolîyayê
û mimkun be
li ber serê min çinarek jî hebe
kêlûmêl jî naxwazim...)

¹⁷⁰ Barnas, *Kadiz*, r. 23

¹⁷¹ Hikmet, *h.b.*, r. 1518

Rengê bêrîkirinê bi her awayî xwe di helbestên Barnas de dihêwirîne. Di xewn û xîyalên wî de her welat heye û bêrîya her tiştê welat dike. Di helbesta xwe ya bi navê *Destpêka Biharê Ye Niha Li Welatê Min* de jî destpêka biharê bi çem û rûbaran, nergîz û beybûnan û çivîkên welat ve teswîr dike. Ew xislet û taybetîyên mirovan li çivîkan, newalan û daran bar dike û bi vî şiklî teswîrên xurt derdixîne holê. Di vê helbestê de herikîna hestan dixûyê ku hezkirin, hesret, xerîbî û bêsebrîyek mezin hatiye vegotin. Xerîbî û hesreta helbestvan ewqasî ew tengizandîye ku edî sebra wî nemaye.

(...)
Ez biyanî me li van deveran
Li kujekî guhê biyanistanê
Destpêka biharê ye niha li welatê min
Darê beîvan,
Bi xemlûxêz û bi xişir in.
Lê!
Hun sosin û benefşên vê deverê
Reş-rihan medin her tûncikan
Gulyan vemeweşînin bi bayê spêdê re
Hedana min nema, min aram nîn e
*Dil û cergê min mepincêrin.*¹⁷²

Hesret heta dawîya emrê Nâzım Hikmet hogirê wî bûye, wî di jîyana xwe de hesreta gelek tiştan, bi taybetî jî hesreta malbat û welatê xwe kişandîye. Ev du riste jî bûne kurteya jîyana wî:

“Kimi insan otların kimi insan balıkların çeşidini bilir
ben ayrılıkların
kimi insan ezbere sayar yıldızların adını
*ben hasretlerin”*¹⁷³

(Hin kes tehma gîyayan hin kes cureyên masîyan dizanin
ez fîrretê
hin kes jîbere dijmêrin navên stêrkan
ez hesretan)

Wî di helbesta xwe ya bi navê *Gece (Şev)* de dîsa hesreta welatê xwe anîye ziman û edî hesreta wî ewqas giran bûye ku sebr û deyaxa wî nemaye, daxwaza dîtina welêt bi gazind reşandîye nava risteyên xwe. Hikmet di vê helbestê de jî efsaneya “Doktor Faust” sûd werdigire û ew jî wekî Faust nîyet dike ku senedekê bide şeytan lê

¹⁷² Barnas, *Kadiz*, r. 24

¹⁷³ Hikmet, *h.b.*, r. 1780

sebeba ku ew rihê xwe bifiroşe şeytên ne wekî ya Faust e. Ji ber ku ew ne li benda îlmeke bêdawî ye ne jî dewlemendî û ciwanîyê ye. Ew tenê dixwaze ji vê hesreta giran xelas bibe û ji bo seeteke tenê be jî biçe welatê xwe:

(...)
Kapıyı çalıyorum.
Bu evde ben de senet vereceğim şeytana,
ben de kanımla imzaladım senedi.
Ne altın istiyorum ondan,
Ne bilim, ne de gençlik.
Hasretlik cana yetti,
Pes!
*Beni İstanbul'uma götürsün bir saatlik...*¹⁷⁴

(*Derî lêdidim*
Li vê malê ezê jî sened bidim şeytên
Min jî senedê bi xwîna xwe muhr kir
Ne zêran dîxwazim ji wî
Ne îlm ne jî ciwanî.
Nikarim serederîya hesretê bikim êdî
Pess!
Bila bo seetekî min bibe Stenbola min...)

Hesreta welat zêdetir bi pêdivîyên berdewamîya hebûnî, civat û aîdîyetê ve girêdayî ye. Di vê mijarê de wekî ku Minoo Alinia ji Avtar Brah neqil dike; welat bi tiştên tê de hatine jîyîn ve watedar dibe. Welat bi civaka xwe, reng û dengê xwe, bi çand û dîroka xwe ve dibe welat.¹⁷⁵ Barnas jî di helbesta xwe ya bi navê *Rojbaş Roza* de bi xwîneran dide zanîn ku dûrketina ji welat di heman demê de dûrketina ji çand û civakê ye jî û jîyana bi vî şiklî jî wekî mirinê ye.

“(...)
Gul li şaxê
Kulîlk di guliyê xwe de geştir e
Ku ji avê derkeve
Masî dimire
Rast e,
Meriv meriv gotiye
Masî jî masî
Em
Ne masî ne, ne gul in, ne kulîlk

¹⁷⁴ Hikmet, h.b., r. 1596

¹⁷⁵ Minoo Alinia, *Diaspora Mekânları*, Çeviren: Fahriye Adsay, Weşanên Avesta, İstanbul, 2007, r. 211

-Bi çavek xwas
 Gava lê bê nihêrtin-
 Lê em jî
 Ji hêlîna xwe ya çande-civakî
 Ku derkevin
 Ji wan gelek
 Ne têveltir in.
 (...)”¹⁷⁶

Ji bo Nâzım Hikmet jî tişta ku welatê wî bi qîmettir dike çand, gel, malbat û hwd. e. Ew di her fersendê de di helbestên xwe de cih dide van nirxan. Digel giranî û dijarîya hesreta welat, dûrketina ji malbatê jî dibe barekî giran. Hikmet di helbesteke xwe de ku ji bo hevsera xwe nivîsandîye hevsera xwe û lawê xwe dike dewsa welatê xwe, têgeha welat bi wan watedar dike. Radeya hesreta wî ewqas mezin dibe ku ew li ku dinêre perçeyekê ji welatê xwe dibine, li ber çavên wî cih û deverên bîyanî jî dibe yên welatê wî. Di vê helbesta li jêr de em dibin şahîdê hesreta wî:

*“Ağaçlar duruyor, eski sıralar ölmüş.
 “Park Boris”, “Hürriyet Parkı” olmuş.
 Sade seni düşündüm kestanenin altında,
 sade seni, yani Memed’i
 sade seninle Memed’i, yani memleketi...”*¹⁷⁷

*(Dar hêj li şûna xwe ne, textebendên berê mirine
 “Park Boris”bûye “Hürriyet Park”
 Tenê li te fikirim di binê dara berûyê de
 Tenê te, yanê li Memed
 Tenê te û Memed, yanê li welêt...)*

Wekî ku dîyar e Rojen Barnas û Nâzım Hikmet bi hişmendîyekê neteweyî dîmena welat honandîne û hesret û hezkirina welat di helbestên wan de bi her awayî hatîye şayesandin.

3.2. Îdeolojî û Dijmêtînkari

Di vê beşe de jî em ê cih bidin helwesta dijmêtînkari û îdeolojîk yê Rojen Barnas û Nâzım Hikmet ku wekî du helbestvanên sosyalîst tînin nasîn. Her du jî di her fersendê de cih didin fikrên xwe yê îdeolojîk û bûne şahîd û berdevkê serdema xwe ku bi taybetî li hember mêtinkariyê dengê xwe zêdetir bilind kirine. Ji bo analîz û

¹⁷⁶ Barnas, *Kadiz*, r. 191-92

¹⁷⁷ Hikmet, *h.b.*, r. 1616

dîyarkirina çarçoveya helbestên îdeolojîk divê em berê cih bidin nêrîna îdeolojîk a her du helbestvanan ku di berawirdkirina helbestan de ji me re bibin palpişt.

3.2.1. Îdeolojîya Rojen Barnas

Me di beşa jîyana Barnas de jî dîyar kiribû ku ew di salên 1964-65an de rastî kurdpeweran tê¹⁷⁸ û berê xwe dide kurdî ku di wê serdemê de him kurdî qedexe ye him jî li ser nasnameya kurdî polîtîkayên tund derdikevin pêş. Barnas ji ber van sedeman dikeve nav tegerên sîyasî û kurdewar û helbestên xwe bi îdeolojîya neteweyî û ji bo dijmêtinkariyê dinivîsîne.

Li gor agahiyên Zülküf Ergün dide, “rêxistin û partiyên sîyasî yên Kurdî ji alîyekî ve neteweyî ye û xweserî û mafên rewa yên Kurdistan ji xwe re dikin armanc, ji alîye din ve jî di bin karîgerîya îdeolojîya çeprew de li dijî bereya emperyalîst û hevkarên wê tê dariştin. Gotara çeprew ji salên çilî heta salên şêstî gelek serdest dibe û hema bibêje piranîya helbestvanên vê serdemê bi awayekî çalak di avakirina vê gotarê de beşdarî dikin.”¹⁷⁹

Bêguman Rojen Barnas jî yek ji wan helbestvanê neteweperwer e ku vê kevneşopa gotara nû ya neteweyî heta roja me anîye. Berken Bereh jî Barnas wekî şairekî sosyalist ku girêdayî îdeolojîya marksist e dide nasîn û serdema ku Barnas dest bi nivîsandina helbestên kurdî kirîye wiha pênase dike: “Di wan salan de dinya bibû du qor; li hêlekê emperyalîst û li ya din sosyalist û gelên bindest. Ev her du hêz bi hemû şîyana xwe li hember hev di nav şer û pevçûnê de bûn.”¹⁸⁰ Ev şer û îdeolojî bû hevîrtirşkê edebîyatê jî, ji alîyekî ve zilm û zordarî ji alîyekî ve jî tekoşîn dikeve nava risteyên helbestvanan.

Dîsa Berken Bereh ji bo helbestên Barnas yên îdeolojîk wiha dibêje: “Her çi qas pêla sosyalîzm û çepgirîyê dinya gişk dabe ber lehîya xwe jî, Rojen Barnas îdeolojîyê ji xwe re nake qiblegeh, ew wê ji bo neteweya xwe û rizgarbûna wê wek alavekê bi kar tîne.”¹⁸¹

¹⁷⁸ Barans, *Kadiz*, r. 13

¹⁷⁹ Ergün, *h.b.*, r. 69-70

¹⁸⁰ Bereh, *h.n.*, r. 6

¹⁸¹ Bereh, *h.n.*, r. 7

Ev hizra neteweyî ya Barnas hîn ji pirtûka ewil ya bi navê *Li Bendava Spêde* de dest pê dîke heta pirtûka dawî *Yeldayê* jî didome. Lê ber bi vê pirtûka dawî ve tê dîtîn ku ev hizr û kelecana îdeolojîk ên li ser netewetî, dijmêtînkari, ferqa di navbera çînên civakî, mafên karkeran, zilm û zordariyê qels dibin. Lewra Barnas êdî di helbestên xwe yên ku di kovaran de diweşîne berê xwe zêdetir dide êş û kêfxweşiyên şexsî.

3.2.2. Îdeolojîya Nâzım Hikmet:

Wekî ku me berê jî gotibû Nâzım Hikmet di dema şerê cihanê yê yekem de dest bi nivîsandina helbestan dîke ku di wan rojan de welatê wî hatiye dagirkirin. Loma helbestên wî yên ewil li ser vê atmosfere hatiye nivîsîn. Piştî çûyîna Rusyayê, Hikmet Şoreşa Bolşevîkan û tevgera sosyalîzmê dinase ku li tevahiya cihanê belav dibe û ji wir şûn de berê xwe dide mijarên bi vî rengî.

Li Tirkîyeyê piştî îlankirina Meşrutîyeta Duyem di nava fikrên belavbûyî de herî zêde fikra sosyalîzmê li derdora çandî û siyasî ya rewşenbîrên tirkî de ji alîyekî ve wekî tevgera polîtîk cih girtiye û li aliyên din de jî di warê huner û edebîyatê de bandora xwe hiştiye. Li ser belavbûna fikrên sosyalîzmê yên di warê huner û edebîyatê de rol û girîngîya kovara *Aydınlık* mezîn e. Kesên wek Nâzım Hikmet, Şevket Süreyya (1897- 1976), Vedat Nedim (1897-1985) û Kerim Sadi (1900- 1977) li dora vê kovarê kom dibin û digel têkilîya di navbera fikrên sosyalîst, huner û edebîyatê li ser mijarên civakî jî nivîsan dinivîsînin. Lê ji ber ku rêvebirîya wê serdemê fikrên sosyalîzmê dijberî desthilata xwe dîtîye ji xebatên rewşenbîrên wê serdemê re bûye asteng. Heta salên sîhî fikr û hunera marksîst ji xwe re qada xebateke bi rêkûpêk neditîye. Lê di destpêka salên sîhî rewşenbîr û nivîskarên sosyalîst hin berhemên teorîsyenên wekî Marks (1818- 1883), Engels (1820-1895), Lenîn (1870- 1924) û gelekên din wergerandine tirkî û kêmbûnê jî li ser van berheman nîqaş kirine. Nâzım Hikmet bi nivîsên xwe yên bi navê *Putları Yıkıyoruz (Em Peykeran Hildiweşîn)*, No. 1 *Abdülhak Hâmit*, No.2 *Mehmet Emin Beyefendi* ve bûye pêşengê vî karî.¹⁸² Di heman demê de Nâzım Hikmet bi helbestên xwe yên îdeolojîk û bi mijarên civakî jî di warê helbestê de jî bûye pêşeng.

¹⁸² Murat Kacıroğlu, “Cumhuriyet Dönemi Türk Edebiyatında (1923-1940) Toplumcu-Gerçekçi Edebiyat Tartışmaları”, *Erzurum Teknik Üniversitesi Sosyal Bilimler Enstitüsü Dergisi*, Temmuz, 2016, r. 38-39

Di helbestên ewil ên Nâzım Hikmet de rengêkî dînî û hestên netewperwerîyê xûya ye. Piştî çûyîna Sovyetê ev rengê dînî cihê xwe ji fikrên sosyalist re dihêle û heta helbestên wî yên dawî jî digel mijarên curbicur, em geşedana vê îdeolojîyê bi awayekî xurt dibinin.¹⁸³

Nâzım Hikmet wekî helbestvanekî sosyalist li gor zîhnîyeta marksîst di helbestên xwe de li ser temaya îstîsmarkirina çîna karkeran rawestîyaye. Wî bi taybetî di helbestên xwe de bal kişandîye ser mijarên cîvakî û ji bo çareserkirina van probleman jî îdeolojîya marksîst araste kiriye. Di helbesta tirkî ya nûjen de ev zîhnîyet bi Hikmet dest pê dike û di nav helbestvanên serdemê de belav dibe.¹⁸⁴

Bi kurtî Nâzım Hikmet di çarçoveya îdeolojîya sosyalist de daxwaza wekhevîya hemû mirovahîyê dike ku ji mêtinkariyê dûr, azad bijîn û bi vê nezerê jî di helbestên xwe de li hember neheqîyan derdikeve.

3.2.3. Îdeolojîya Neteweyî û Helwesta Dijmêtinkarî

Barnas di helbestên ewil de rengê îdeolojîya xwe û serdema xwe bi me dide zanîn. Di wan helbestan de îdeolojî û hestîyarîya netewperîyê bi awayekî xurt derdikeve pêşberî me. Barnas helbesta xwe ya bi navê *Min Navê Xwe Kola Li Bircên Diyarbekir* de çavkanîya xwe ya hizrî ji îdeolojîya çepgir girtîye û helbesta xwe bi endîşeya rastîya civakî nivîsandîye. Her çend helbest li ser Dîyarbekirê bimeşe jî wexta mirov dêhna xwe baştir didê, baş xûya ye ku li gel çîyayê ku nêzî Behra Wanê ye qesta helbestvan Kurdistan bi xwe ye bi hemî çîya, kulîlk, çem û robarên wê ne.¹⁸⁵ Barnas ji bilî dîmenên coxrafîk ji alîyekî ve jî bi lîrîzmeke millî teswîrên xeyalî dike û rengêkî neteweyî û serxwebûnê dide helbestê. Barnas bi xwe jî dîyar dike ku wî vê helbestê ji têkoşînê zêdetir ji bona bîrveanîna tarîx, kultur û xwedîderketina Diyarbekirê nivîsandiye¹⁸⁶ û ev jî vê rengê neteweperwerîya wî baştir nişan dide:

(...)
Ez
Di Derîyê Niştimanî de ketim hundir
Min

¹⁸³ Bezirci, *h.b.*, r. 212

¹⁸⁴ Bezirci, *h.b.*, r. 213

¹⁸⁵ Mîrza Baran, “Di ser Erdnigarîyê re Deng û Bêdengîya Madûnan”, (19.11.2019)

¹⁸⁶ Çelik, *h.h.*, r. 40

*Deriyê Niştimanî bi zerzenga xemiland
Û li ber Deriyê Serxwebûnê
şer kir
Bêweç mabû baxçeyê Deriyê Felatê
Min tê de
Şaxên serbestiyê çikand
Tovê xawendariyê werkir.¹⁸⁷*

Di helbestên ewil yê Nâzım Hikmet de digel mijarên curbicur ji ber ku di atmosfereke sîyasî de hatîye nîvîsîn rengvedana hestên netewperwerîyê jî xurt e. Ew di helbesta xwe ya bi navê *Viran Dîyar* (Warê Wêran) de atmosfera wê serdemê dişayesîne. Ji ber dagirkirin û kavihbûna welat dikesire, hêrs û xema civakê teswîr dike. Ji alîyekî ve jî dide zanîn ku êdî ji bo welêt serdemek bi dawî dibe û li benda serdemeke nû û tolhildanê ne. Bi vê daxwaza tolhildanê dide zanîn ku wê ev ruhê neteweyî tu carî nemire û wê di siberojê de ji nû ve derkeve holê.

(...)

*Bu elemin sebebini kime sorsam
Viran ücra ufukları bana gösterdi
Buraları bir mazinin öldüğü yerdi
Evlatları istikbalden bekler intikam.¹⁸⁸*

*(Min sebebê vê eleme ji kê pirsî
Asoyên talde yê wêran nîşanî min dan
Ev der cihê mirina raborîyê bû
Nevîyên wan li bendî tolhildane ne ji dahatûyê)*

Barnas di helbestên xwe de zêdetir cih dide îdeolojîya çînî, di gelek helbestên xwe de deng dide karkeran. Zülküf Ergün dîyar dike ku helbestvanên Kurd ji ber ku axa û şêxan wek nokerên dewletên serdest ên li Kurdistanê û dewletên serdest jî wek hevkarê emperyalîzmê pênase dikin, van kesan hem wek dijminê neteweya Kurd û hem jî wek dijminê bereya komunîst li qelem didin. Loma jî helbestvanên neteweperwer ên çeprew van çîn û kesayetên navborî ji xaneya Kurdbûnê derdixin, wan dikin bereya dijminê hevbeş ê Kurdayetî û marksîzmê û bi vî awayî di nav

¹⁸⁷ Barnas, *Kadiz*, r.29

¹⁸⁸ Hikmet. *h.b.*, r. 1892

îdeolojîya neteweyî û marksîst de hevgirtineke çêdikin. Loma jî di gotara helbestvanên neteweperwer ên çeprew de Kurd tenê ji çîna karker, hejar û ji dijminên emperyalîzmê pêk tên.¹⁸⁹ Li ser vê nêrînê jî tê dîtin ku Barnas jî di helbesta xwe ya bi navê *Ez Karker im* de bi dengê karkerekî, bi coş û eşq behsa doza karkeran dike. Gava em li temamê helbestê dinêrin Barnas karê karkeran wekî jinekê teswîr dike ku ew bi eşqekê mezin girêdayî karê xwe ne û karker ji bo dinyayeke azad û xweşreng xwe feda dikan, ji tava rojê ji şînahîya esmên mehrum dimînin.

(...)

*Ez karker im
Bi çend sed metreyan li binê axê
Dirêj, fere, kûr
Kewaran diqewêrim
Ji tava Rojê dûr
Ji zelaliya şîneyîya esmên biyan
Bo pêşveçûna hilberînê
Da ku
Gul bibişkişin li lamê mendalan
Keç bişên strana bistrên
Riwal li dinê heval û hevra
Geştir bin qerenfîl di serê Gulanan de
Li ber dilê mirovan.
Direwêrim bi serê kuling
Bi nikulê kuling ji sînga zinaran
Dibirêşim, diqewêrim
Çiyayên karakî ji hevdû dadpeşkînim.
(...)¹⁹⁰*

Nâzım Hikmet jî heta dawîya emrê xwe têkoşîna xwe ya ji bo çîna karkeran domandîye. Wî karker wekî rêhevalên xwe dîtine û her tim ji bo dahatûyeke baş hêvîya xwe li wan girtîye. Hikmet karkeran dike asteke wisa ku di dinyaya wî de her tişt bi destên wan dibe, ew bi xebatên xwe ji bo gel dinyayekê diafirînin, ji ber vê sedemê jî Hikmet karkeran wekî destên jînbexşîn dişayesîne. Helbesta Hikmet a bi navê *Türkiye İşçi Sınıfına Selam (Silav Li Çîna Karkerên Tirkîyeyê)* mînaekeke baş e ji bo vê qîmeta ku ew dide karkeran:

*“Türkiye işçi sınıfına selâm!
Selam yaratana!
Tohumların tohumuna, serpilip gelişene selâm!
Bütün yemişler dallarınızdadır.*

¹⁸⁹ Ergün, *h.b.*, r. 75

¹⁹⁰ Barnas, *Kadiz*, r. 45

*Beklenen günler, güzel günlerimiz ellerinizdedir,
haklı günler, büyük günler,
gündüzlerinde sömürülmeyen, gecelerinde aç yatılmayan,
ekmek, gül ve hürriyet günleri.*"¹⁹¹

*(Silav li çîna karkerên Tirkîyeyê
Silav li kedkaran/afirîneran
Silav li tovên tovan, li yên bejn avêtî/hêşînbûyî
Hemû mêwe gulîyen we de
Rojên çaverê, rojên xweş bi destên we
Rojên heq û mezin
Nan, gul û rojên azadiyê
Yên ku di rojê nayên îstîsmarkirin û di şevan birçî nayên razan)*

Barnas bi helbesta *Cenanên Titûnê* berê xwe dide mijara îstîsmarkirina karkeran. Ew sermayedar, axa û patronan jî weke hevkarê emperyalîzmê dibîne. Ji ber vê sedemê jî wan wekî karakterên neyînî disêwirîne. Wekî ku me berê jî gotibû Barnas zêdetir bi îdeolojîyeke çînî tevdigere, di vê helbestê de jî rewşa çîna karkeran teswir dike ku ew di bin zilma sermayedaran de bi mecbûrî dixebitin. Êş û zehmetîya kar tenê li piştê karkeran e lê pardarê sermayeyê zêde ne û ev rewş wekî pergala mêtinkarîyê her sal bi vî awayî didome:

*(...)
Pardar gelek in, tê de
Pardar gelek in bê hejmar
Ji sedî pêncî yê patron e her
Qapankêş û nivîsan bê bazar
Eksper û midur û embarvan
Ji malê ne. Ma ew biyan in?
Di diravdayînê de bêşik, bêguman
Cihê wî her diyar û xuyan e:
Razîqê rizqa; hejmarvan
Her sal nû dibe ev serpêhatî
Her sal li dara dikeve ev serawa.*¹⁹²

Nâzım Hikmet jî di helbesta xwe ya bi navê *Memleketimden İnsan Manzaraları 3 (Ji Welat Dîmenên Însanan 3)* de bi awayekî çîrokî mêtinkarîya sermayedaran dide ber çavan. Di vê helbestê de gundî di navbera zilma axa û sermayedaran de mane û ji neçarîyê keda xwe dikin para axa û sermayedaran. Ji bo nîşandana mêtinkarîya

¹⁹¹ Hikmet, *h.b.*, r. 1828

¹⁹² Barnas, *Kadiz*, r. 71

serdestan ev dîyaloga di navbera memûrê “Toprak Ofisi” yê û gundîyekî mînakek baş e:

(...)
“-Koyunzade’ye borcun var mı senin?”
Köylü tereddüt etti cevap vermeden önce,
“-Söylesene var mı?”
“-Var, iki yüz banknot kadar.”
“-Ziraat Bankası’ndan niye almadın?”
“- Bankadan ağa alır, dağıtır bize.”
“-Faiz ne vereceksin?”
“-Yüz banknota on banknot, demek, iki yüze yirmi.
Ağanın çeltik tarlasında da çalıştık biraz.”
“-Para aldın mı?”
“-Buncacık işe para mı alınır?”
O da, hükümete işimiz düşerse parasız görüverir.”
“-Niye deyyuslara başvuruyorsun?
Kendi işini kendin görsen ya hükümette...”¹⁹³

(Deynê te ji Koyunzade re heye?
Gundî dudil bû û berî ku bersivê bide,
Çima nabêjî! Heye?
Heye, qasî dused panotan e.
Te çima ji Ziraat Bankası nehilda?
Axe ji banqê hildide, li me belav dike.
Ê! tu yê çiqas riba bidî?
Ji sed panotî ra 10 panot, yanê ji dused panotî ra 20 panot.
Em hinekî jî di zevîya birincê ya axê da xebitîn
Te pere hilda?
Meriv ji bo ewqas kar pere hildide qey?
Ew jî wexta ku karekî me li hukmatê asê be bêheq safî dike
Tî ji bo çî serî li van deyûzan dixî?
Karê xwe yê hukmatê bi xwe safî bikî ne çêtir e.)

Di heman demê de ev memûr (Kemal) di serê helbestê de hewl dide ku di nava vê civaka serdestan de nebe perçekî vê zilmê lê di dawîyê de li hember nefsa xwe têk diçe û nikare xwe ji vê bayê emperyalîst bifilitîne, dibe pardarê vê zilmê:

(...)
Ve o kadar keyiflendi, kendini öyle kudretli duydu ki Kemal
Ve o kadar bahtiyardı ki:
“Parti Müfettişinin de hatırı kalmasın,” dedi,
“Koyunzadenin pirincini de al.”
Ve yağmadan kurtulanları aldı 40 kuruştan.
Ve mavi bi zarfın içinde soktu ceketinin dış cebine ilk rüşvetini.¹⁹⁴

¹⁹³ Hikmet, h.b., r. 1363

¹⁹⁴ Hikmet, h.b., r. 1374

*(û Kemal hingî kêfxweş bû, xwe hingî biquddret hest kir ku
Û hingî bextewar bu ku:*

Got: "Bila xatirê mufetişê partîyê jî nemine."

"Birincên koyunzade jî bigire."

Û ji 40 qurîşî girt yê ji talanê mayî.

Û di nava zerfeke şîn de ruşveta xwe ya ewil kir bêrîka derve ya çakêta xwe.)

Dîsa Barnas fikrên xwe yê li ser mêtinkarîyê di helbesta xwe ya bi navê *Melayê Şîretkir* de li ser melayekî tîne ziman ku mela di vê helbestê de wekî alîgirê emperyalîzmê tê şayesandin. Barnas bang li mela dike ku êdî bila şîret û galegalen neke û were rastîya civakê bibîne ku bi şîretên pûç feydeya wî nagihîje civakê:

*"(...)
Em
Ew qas pê dizanin
Bes e êdî ev galegal,
Şîret û gazin.
Bes e qurban!
Dakîşe ji Lamekan
û were xwarê
Were dinê,
Qasek li însan,
Li mirovan
Mêze ke
Fermo!"¹⁹⁵*

Nâzım Hîkmet jî di helbesta xwe ya bi navê *Meşin Kaplı Kitap (Pitûka Rû Çermîn)* de dêhna xwe dide ser bûyerên dîrokî û qinyata xwe pê tîne ku bawerîyên dînî tu feydeyê nadin mirovahîyê. Barnas di vê mijarê de şêx û melayên bûne şîrîkê emperyalîzmê rexne dike lê Hikmet rasterast rexneyên xwe dibe ser dîn. Ew di helbesta xwe de cudahîyên di navbera çînan û zordestîya serdestan tîne ziman û bi me dide zanîn ku li ser rûyê erdê însan ewqas êşan dikişînin lê fêdeya şîretên dînî ji wan re çênabe, ji ber ku serdest dîsa serdest in, zordar dîsa zordar in û feqîr û belengaz her di rewşa berê de ne:

*"(...)
Yazık, yazık bize ki bi çırağ gibi yandık...
Ne gökten necat geldi, ne bir parçacık merhamet,
Çalışan esirlere İsa, Musa, Muhammet*

¹⁹⁵ Barnas, *Kadiz*, r. 83

*Sade bi satırda dua, bir tütsü buhur verdi.
Masal cennetlerinin yollarını gösterdi.
Ne beş vakit ezanı, ne Anjülüs çanları
Zincirler kurtarmadı yoksul çalışanları.*

(...)

*Efendiler, ağalar, evliyalar, keşişler
Ebedî karanlığın boğulsun kollarında.
Artık temiz ruhların aydınlık yollarında
Sade bir din, bi kanun, bi hak:
İşleyen – dişler...*

*(Heyf, heyfa me ku em mîna qirşekê şewitîn.
Ne ji esmanan xelasîyek barî, ne jî piçek merhemet
Ji hêsîrên xebatkar ra Îsa, Mûsa, Mihemmed
An jî ne du rêzikên sade da duayek, ne jî buxur-tutsîyek
Rêyên bihûştên çîrokan nîşan da.
Ne pênc dan azan, ne jî naqosên Anjulusê
Qeydan nekarî xebatkarên hêsîr xelas kira.
(...)
Efendîno, axeno, ewlîyano, keşişno
Tarîya te ya ebedî bila paxila te da bixeniqe.
Êdî di rêyên ronak ên ruhên pak da
Dînekî sade, qanûnek, heqek.*

Diranên-dicûn...)

Rojen Barnas û Nâzım Hikmet her du jî roşeşa proloteryayê û îdeolojîya dijmêtinkarîyê ji neteweyîbûnê ber bi navnetewetîyê ve dibin. Ew bêtî ku cudahîyê bixin nav nijadan ji bo hemû gelên cîhanê wekhevî, yekîtî, biratî û jîyaneke azad dixwazin, dengê xwe didin hemû gelên bindest.

Barnas di helbestên xwe de li dijî zilm û zordarîyê radibe ku li hemû cîhanê heye. Ew bi îdeolojîya xwe ya çepgir di helbestên xwe de bi me dide zanîn ku sînorên êşê tune ne û ew zordestîyê wekî tarîfîyê şîrove dike ku bi hêzeke tund li hemû cîhanê belav dibe:

*“(...)
Xweza
Ji xwîn û xweydanê
Bû derya
Ji cendekên kuştîya
Çiya
 çêbûn
Û
Hê jî
Tarîza*

*Bi hêza xwe ya tund
Mirinê diguvguvîne li cîhanê
Li Latîn-Amerîka
Li Afrîka
Li rojhilatanavîn
Li kul û kesera dile min
Li Kurdistanê.*”¹⁹⁶

Dîsa Barnas sînorên di navbera gelan ku ne ji ber cudahîya nijad, dîn, reng û zimanan lê ji bo berjewendîya çînên serdest û zordaran hatîye avakirin, bê wate dibîne. Ew di helbesta xwe de daxwaza hilweşîna van sînoran dike û bangawazîya wekhevî û yekîtîyê dike.

*“(…)
Kê van keleha kêşa nava me
Ne nîjad e, ne dîn, ne ziman e,
Ne rengê ten e, sedemê bingeş
Kê şolî kir serê kaniyê
Jehravê berda sere riya me

Divê em rakin van keleşan
Ji navbera xwe bimalin
Divê zelal be serê kaniyê
Ku stran li jiyanê belav bin
Divê ku hestê me mil bidîne hev*”¹⁹⁷

Wekhevî û biratîya gelan yek ji diyardeyên îdeolojîya çepgir e ku di helbestên Nâzım Hîkmet de jî cihekî girîng digire. Hikmet di helbesta xwe de li gor îdeolojîya xwe ku heta dawîya emrê xwe bi şîara wekhevî û azadîyê têkoşîna xwe berdewam kirîye, hemû gelên li cîhanê bi rêzdarî silav dike û tîne ziman ku hemû gel li ber dilê wî wekî hev in:

*“Sayın halkları bütün ırkların,
Endonezyalı, Almanı, Eskimosu,
Sudanlı, Çinlisi, Türkü, Ermenisi,
Yahudisi, Arabı, Lehlisi, Rusu,
Meksikalısı, Norveçlisi, Kırgızı,
Abhazyalısı, Hintlisi, Kürdü, Firansızı,
Farsı, Liberyalı, İngiliz, i,
Amerikalısı: ak, kara, kırmızı,
tükenir mi saymakla
ve adını duymadıklarım,*

¹⁹⁶ Barnas, Kadiz, r. 223

¹⁹⁷ Barnas, Kadiz, r. 307

hepinizi, hepinizi
yerlere kadar eğilerek selamlarım.
Saygıyla, şefkatle, bahtiyar, severim sizi.
Ne birbirinizden üstün
ne birbirinizden aşağı,
gönlümün tahtında yan yana oturursunuz.¹⁹⁸

(Birêz nijadên hemû netewan
Endonezî, Almanî, Eskîmoyî
Sûdanî, Çînî, Tirk, Ermenî,
Cihû, Ereb, Lehî, Üris,
Meksikî, Norvecî, Kirgiz
Ahbazî, Hindû, Kurd, Fransiz
Fars, Lîberî, Îngîlîz,
Emrîkî: spî, reşik, sorik,
Qet xelas dibe bi jimartinê?
Û yên ku navên wan guh lê nebûme,
We hemûyan, we hemûyan
Silav dikim hetanî ku enîya min li xakê keve,
Bi hurmet, bi dilovanî, bi bextewarî, ji we hez dikim,
Hûn ne ji hev berjortir
Ne jî nîzmtir in,
Dî textê dilê min da lî kêleka hev rûdinên.)

Barnas di helbesta xwe ya bi navê *Ragihandin* de rasterast propagandaya îdeolojîya sosyalîst dike. Ew jî di helbesta xwe de armanca çepgir û sosyalîstan tîne ziman ku ji bo têkbirina mêtinkaran û damezrandina dinyayeke ronak dixwazin her kesî di nav sîwana sosyalîzmê de bi cîh bikin. Barnas vê nîyeta xwe di vê helbestê de bi eşkere tîne ziman:

“(…)
Em havilkar in
Li kefteleftek
Li tevgerek
Em havilkar in, bi çistî
Me pêşbîrek heye,
Herêma herêma
Pele pele hilrakirina kedxwirî û mêtîngehkarî
Û seraser
Damezrandina dinyakî ronak e,
Damezrandina dinyakî ronak
Bi sosyalîstî.”¹⁹⁹

¹⁹⁸ Hikmet, h.b., r. 1663

¹⁹⁹ Barans, Kadiz, r. 116

Herwiha tê zanîn ku Nâzım Hikmet sosyalîzmê di cihê zayîna wê de dîtîye û sosyalîzmê rasterast ji çavkanîyên sereke hîn bûye. Hikmet di piranîya helbestên xwe de cih dide propagandaya sosyalîzmê û hezkirina Lenîn jî gelek caran ber gotinê dixê. Hikmet di vê helbesta xwe de jî propagandaya sosyalîzmê dike û di vir de armanca fikrên sosyalîzmê heye ku dixwazin di navbera hemû gelan de tifaqekî ava bikin. Ji ber vê sedemê jî navê Lenîn û “Kızılbayrak” (Alaya sor) wekî sembola sosyalîzmê hatîye bikaranîn:

“(…)
Ekmeği dostlara çok,
kendime az böler ellerim.
Tırahomlu bütün gözleri öperim
Anadolu köylerinde
Şehit düşerim dünyanın bir yerinde
Dünya inklâbı için.
Yüreğimi geçirirler
Kadife bir yastığın üzerinde
Kızılbayrak nişanı gibi.
Bandolar matem marşı çalar.
Ölülerimizi bir duvarın dibine gömeriz
toprağın içine
bereketli tohumlar gibi.
Ve toprağın üstünde türkülerimiz
ne Türkçe, ne Rusça, ne İngilizce
türkücedir.
Karlı bir ormanda hasta yatar Lenin,
çatılır kaşları: birilerini düşünür,
bakar beyaz karanlığa
görür gelecek günleri.”²⁰⁰

(Destên min nanî bo dostan zêde,
Bo min jî kêr qet dike.
Li gundên Enetolyayê
Maç dikim hemû çavên çavêşî
Dibime şehîd li cihekî dinê
Bo şoreşa dinê
Dilê min derbasî ser
Balgîyekî qedîfe dikin
Weke nîşaneya Ala-sor.
Bando dirûşmên kewgirîne lêdidin
Em mirîyên xwe di bin dîwarekî da çehl dikin
Li nava xakê
Mîna toximên bi bereket.

²⁰⁰ Hikmet, h.b., r. 1598

*Û li ser axê stranên me
Ne Tirkî, ne Rûsî, ne Îngîlîzî
Strankî ne.
Di daristaneke berfdar da nexweş radizê Lenîn,
Diponije; fikara hinekan dike,
Dinêre spîya tarî
Dibîne siberojan.)*

Wekî ku tê dîtîn her du helbestvan jî girêdayî îdeolojîya sosyalîst in û hunera xwe zêdetir li ser vê bingehe ava kirine. Helbestên Rojen Barnas û Nâzım Hikmet erka hunerê ya civakî digirin. Ew hunerê di nav civakê de weke sazîyekê dibînin û li gor vê nêrînê jî divê huner û hunermend di xizmeta civakê de be. Ew jî li gor vê nêrînê hunera xwe ji bo xwedîderketina civakê bi kar tînin ku di helbestên xwe de li hember emperyalîzmê nixê cîhanî diparêzin. Bi kurtî em dikarin bibêjin ku xala hevbeş a di navbera Rojen Barnas û Nâzım Hikmet de ew e ku her du jî hunera xwe de bi helwesteke civakperwer îcra dikin.

3.3. Hezkirin

Yek ji mijarên hevpar jî mijara hezkirinê ye ku her du helbestvanan jî di helbestên xwe de cih dane vê dîyardeyê. Me mijara hezkirinê bi çend sernavên cuda yê weke; hezkirina siruştê, mirovhezî, hezkirina zarokan û hezkirina yarê ji hev veqetand û li gor vê rêzê em li ser van mijaran rawestîyan

3.3.1. Hezkirina Siruştê

Siruşt, ku malzaroka jîyanê ye û ji gelek şairan re jî bûye best û îlham di gelek helbestên Rojan Barnas û Nâzım Hikmet de jî cih digire. Di binê sernavê siruştê de mijarên wekî hezkirina siruştê, bêrîya siruştê û siruştê welat hatîye honandin.

Rojen Barnas hin caran siruştê bi îmajê welêt re dermale dike û çawa ku bêrîya her tiştê welêt dike herwiha bêrîya siruştê welatê xwe jî dike. Di vê helbesta li jêr de jî tê dîtîn ku Barnas hezkirina welat û sewdaya siruştê tîne ba hev û vê hezkirinê wekî evîndarekî tîne ziman:

*Ey sira spêda Araratê
Min ji te ramîsanek divê
Maçek germîn bide, bo serê xwe
Berdestî sibê, li ber Firatê.²⁰¹*

²⁰¹ Barans, Kadiz, r. 40

Nâzım Hikmet jî hezkirina siruştê û hezkirina jinê di helbesta xwe tîne ba hev. Di helbesteke de sê rengê hezkirin û hesreta xwe tîne ziman. Ew hezkirina jinê û siruştê eşkere tîne ziman û wexta ku di girtîgehê de gazind ji dûrbûna herduyan jî dike hesreta welat di nava risteyan de eyan dibe.

Yeni bi huy edindim hapiste:

Seni sevdiğim kadar değilse de

Hemen hemen ona yakın seviyorum tabiatı.

*Ve ikiniz de uzaktasınız.*²⁰²

(Min edetekî teze derxist ji xwe re li hepsê:

Bi qasî ku ji te hez dikim nebe jî

Hema bêje nêzî wê hez dikim ji tebî'etê.

Û hûn her dû jî dûr in.)

Wekî ku tê zanîn di dîroka mirovahîyê de gelek caran siruşt hatîye wêrankirin û hê jî ew rewş didome. Hin caran ji bo hilberîna enerjîyê, hin caran ji ber şer û bi gelemperî ji ber berjewendî û nezanîna mirovan siruşt tê talankirin. Barnas jî wekî hezkirîyê siruştê ji ber van kiryanan acizîya xwe eşkere dike. Barnas di helbesta xwe de cih dide wêrankirina siruştê Kurdistanê ku bi destên dagirkeran pêk tê:

Bo çi ezê nebêjim gul û bilbil

Nerêsim di teşîya helbestê de?

Ku gulîstan bi napalman bê şewitandin

Ji salê carek li Kurdistanê

Di manewrayên lejkerî

Û bilbil

Li welatê min

Can bidin

*Bi fermana dewletên talankerî.*²⁰³

Dîsa Nâzım Hikmet jî li ser heman hişmendîyê helbesta xwe ya bi navê *Stronsiyum 90* dinivîsîne. Hikmet di vê helbestê de cih dide bikaranîna xelet a zanist û teknolojîyê ku dibe sebebê şer û talana siruştê ku bi mirina însanan ve diqede.

²⁰² Hikmet, *h.b.*, r. 637

²⁰³ Barnas, *Kadiz*, r. 199

*Acayıpleşti havalar,
 bir güneş, bir yağmur, bir kar.
 Atom bombası denemelerinden diyorlar.
 Stronsium 90 yağıyormuş
 ota, süte, ete,
 umuda, hürriyete,
 kapısını çaldığımız büyük hasrete.
 Kendi kendimizle yarışmadayız, gülüm.
 Ya ölü yıldızlara hayatı götüreceğiz,
 ya dünyamıza inecek ölüm.²⁰⁴
 (hewa ecêb bûne
 Te hew dît tav, baran, û carekê da berf.
 Dibêjin ji ceribandinên atomê ye.
 Stronsîûm 90î da dibare
 Ji gîha, şîr, goşt ra
 Ji hevî û hurîyetê ra,
 Ji wê hesretê ra ku em lê dergevan in.
 Em ketine rika hev, gula min.
 Yan em ê ji stêrkên mirî re jînê bibin,
 Yan jî wê mirin li cîhana me bibare.)*

3.3.2. Mirovhezî

Hezkirin di xuliqandina însanan de fitrateke siruştî ye. Mirovahîya ku li ser hezkirinê hatîye avakirin bêguman tenê bi hezkirinê dikare dewam bike. Mirov çawa ku ji dê û bavê xwe, malbata xwe hez dike divê wisa ji însanên din jî hez bike. Lewra aşitî, aramî û kêfxweşî li ser bingeha hezkirinê dikare belav bibe.

Wekî ku tê zanîn îdeolojîya çeprew ji bo wekhevî û azadîya mirovan li hember çinayetî û metinkarîye têdikoşe. Ev jî bi me dide zanîn ku di bingeha îdeolojîya çeprew de jî mirovhezî heye Rojen Barnas û Nâzım Hikmet jî weke peyrewên vê îdeolojîyê

²⁰⁴ Hikmet, *h.b.*, r. 1632

helbestên xwe li ser hezkirina mirovan ava dikin ku di gelek helbestên wan de rewşa mirovan tê şayesandin.

Rojen Barnas di helbestên xwe de bi gelemperî behsa însanan dike. Ew di wê hewlê de ye ku rewşa mirovahîyê bi hemû alîyan ve bişayesîne. Barnas her çiqas bi taybetî rewşa civaka xwe teswîr bike jî di rastîyê rewşa hemû gelên bindest bi xwîner dide serwextkirinê. Helbet di bingeha vê hewlê de hezkirina însanan heye, Barnas di helbesta xwe de vê hezkirinê eyan û beyan dibêje:

Xurî û pêta j'kûra evin im

Hezkirê jînê, yê însana me

Ji êşa herkesî axîn dikşînim

*Bo jana kesa l'pey dermana me*²⁰⁵

Nâzım Hikmet jî weke Rojen Barnas di piranîya helbestên xwe de cih daye rewşa însanan. Heta Nâzım di pirtûka xwe ya bi navê “*Memleketimden İnsan Manzarları*” (*Ji Welatê Min Dîmenên Însanan*) de tenê cih daye rewşa mirovan. Şair li ser vê pirtûka xwe dibêje ku “Min xwest ku wexta xwîner vê pirtûkê bîxwîne di nav mehşera însanan de derbas bibe.” Ev hevok têrê dike em pê derxin ku Hikmet çiqas giringîyê dide însanan. Jixwe eger em bala xwe bidin helbestên wî em ê bibînin ku heta dawîya emrê xwe di helbestên xwe de cih daye rewşa însanan. Di vê helbesta li jêr de jî em dibin şahîdê mirovhezîya Nâzım Hikmet:

Ve insanlar,

ah, benim insanlarım,

yalanla besliyorlar sizi, halbuki açsınız, etle, ekmekle beslenmeğe muhtaçsınız.

Ve beyaz bir sofrada bir kere bile yemek yemeden

doyasıya,

göçüp gidersiniz bu her dalı yemiş dolu dünyadan.

*İnsanlar, ah, benim insanlarım,*²⁰⁶

(Û mirov,

Ax mirovên min,

We bi derewan xweyî dikin, halbûkî hûn birçî ne, hewcehîya we heye ku hûn bi goşt û nan bêne dermalekirinê.

Û bîyî ku hûn bo carekê be jî li ser sifreyeka spî bi dilê xwe xwarinê bixwin

Hûn koç dikin li vê dinyaya ku her çaka wê mişt bi mêwe ye.

Mirov, ax, mirovên min,)

²⁰⁵ Barnas, Kadiz, r. 53

²⁰⁶ Hikmet, h.b., r. 938

Helbet ev mirovhezîya wan ne tenê ji bo neteweya wan e, ew hezkirina xwe sînordar nakin. Ji bo wan her netew, her însan bi hemû reng û taybetmendîyên xwe ve biqîmet in. Barnas di helbesta xwe de xwezîya aşîtîyê û aramîya gel dike loma jî bangawazîya yekîtiyê dike û hemû însanan bi taybetmendîyên xwe ve qebûl dike:

Were em bi çemberkî rûnên di civata mirovan:

Ne tu li seriya min bi çavsorî

Ne ez li jora te bi dek û fen...

Ez, ez

Tu, tu

Lê em..

Em bistrên bi hev re stranên mirovhezî²⁰⁷

Ji kîjan millet û kîjan nijadê dibe bila bibe mirovhezîya Nâzım Hikmet xwe di berhemên wî de derdixe pêş. Hikmet di hezkirina xwe de ferqê nake navbera însanan û ew însanan bi hemû êş û şahîyên wan ve dixwe nava risteyên xwe, bi êşên wan diêşe, bi kêfxweşîyên wan şa dibe. Di vê helbesta xwe de jî hezkirina xwe ya bînasnav û bêsînor kifş dike:

Sayın halkları bütün ırkların,

Endonezyalı, Almanı, Eskimosu,

Sudanlı, Çinlisi, Türkü, Ermenisi,

Yahudisi, Arabı, Lehlisi, Rusu,

Meksikalısı, Norveçlisi, Kırgızı,

Abhazyalısı, Hintlisi, Kürdü, Fransızı,

Farsı, Liberyalı, İngiliz,

Amerikalısı: ak, kara, kırmızı,

Tükenir mi saymakla

ve adını duymadıklarım,

hepinizi, hepinizi

yerlere kadar eğilerek selamlarım.

Saygıyla, şefkatle, bahtiyar, severim sizi.

Ne birbirinizden üstün

²⁰⁷ Barnas, Kadiz, r. 247

*ne birbirinizden aşı,ğı,
gönlümün tahtında yan yana otursunuz.*²⁰⁸

*(Birêz nijadên hemû netewan
Endonezî, Almanî, Eskîmoyî
Sûdanî, Çînî, Tirk, Ermenî,
Cihû, Ereb, Lehî, Êris,
Meksîkî, Norvecî, Kirgiz
Ahbazî, Hindû, Kurd, Fransiz
Fars, Lîberî, Îngîlîz,
Emrîkî: spî, reşik, sorik,
Qet xelas dibe bi jimartinê?
Ê yên ku navên wan guh lê nebûme,
We hemûyan, we hemûyan
Silav dikim hetanî ku enîya min li xakê keve,
Bi hurmet, bi dilovanî, bi bextewarî, ji we hez dikim,
Hûn ne ji hev berjortir
Ne jî nizmtir in,
Di textê dilê min da lî kêleka hev rûdinên.)*

3.3.3.1. Hezkirina Zarokan

Di mijara mirovhezîyê de hezkirina zarokan jî di helbestên Nâzım Hikmet û Rojen Barnas de ciheke girîng digire. Her du helbestvan jî him ji bo dahatûyê ji zarokan bi hêvî ne him jî ji ber rewşa zarokan aciz in. Her tim di şerê mezinan de zarok dibin qurbanî, di şer de an zarok bixwe tî kuştin an jî dê, bav û hezkiriyên xwe wînda dikin. Herwiha şer bi her awayî li ser derûnîya zarokan bandorên travmatîk dihêle û zarok bi her awayî li ber talana şer dikevin. Ji ber vê sedemê jî her du şair jî rewşa zarokan ji xwe re dikin mijar û nerazîbûna xwe nişan didin.

Rojen Barnas helbesta xwe ya bi navê *Zarokên Me* ji bo zarokên kurd dinivîsine ku ew jî bûne qurbanîya encama şer û sîyesata mezinan û zîmanê wan hatiye qedexekirin. Lê Barnas ji bo dahatûyê ji zarokan bihêvî ye ku ew di her alîyê jîyanê

²⁰⁸ Hikmet, *h.b.*, r. 1663

de zimanê xwe bi kar tînin û bi zimanê xwe dijîn. Ew di vê helbestê de digel hezkirina zarokan hesasîyeta xwe ya li ser ziman jî nîşan dide:

*Zmanê wan qedexekirî
Lê,
Zarok
Bi zmanê xwe dileyîzin
Malokan
Bi zmanê xwe çêdikin
Awir didin
Çindik davêjin
 Bi zmanê xwe
Bi zmanê xwe
 digirîn
 dikesirin
veneşêrin berberîyê zarokno!
Li asiwayê mefera me
Bi zmanê me
Bi zmanê xwe
Bibişirîn.²⁰⁹*

Nâzım Hikmet jî di vê helbesta li jêr de bi sîtemkarî behsa şer û kuştina zarokan dike. Ew di vê helbestê de bi vegotîneke xumam cih dide bomberanan û ewran wekî kujerê zarokan teswîr dike. Hikmet gazindên xwe ji serdestan dike ku vî şerê bi dawî bikin ku zarok bila bi zaroktîya xwe ve bimînin:

*Koşuyor altı yaşında bir oğlan,
uçurtması geçiyor ağaçlardan,
siz de böyle koşmuştunuz bir zaman.
Çocuklara kıymayın efendiler.
Bulutlar adam öldürmesin.²¹⁰*

*(Direve kurikekî 6 salî,
Bafiroka wî jî nav daran derbas dibe.
Hûn jî wextekê wiha revîyabûn.
Qêmişî zarokan nekin efendîno.
Bila ewr merivan nekujin.)*

Dîsa Nâzım Hikmet di helbesteke xwe de zarokan şîret dike ku ax û welatê xwe hez bikin. Hesasîyeta Barnas ya li ser ziman di helbesta Hikmet de jî wekî hesesasîyeta welat dixuyê. Herdu helbestvan jî ji zarokan bihêvî ne û dixwazin hestên neteweperwerîyê di dilê zarokan de jî şîn bibe:

²⁰⁹ Barnas, *Kadiz*, r. 187

²¹⁰ Hikmet, *h.b.*, r. 1552

Sen kendi cennetini
kara toprağın üstünde kur.
Coğrafya kitabıyla sustur,
seni "Hilkatî Âdem"le aldatanı..
Sen sade toprağı tanı
toprağa inan.
Ayırdetme öz anandan
toprak ananı.
Toprağı sev
anan kadar...²¹¹

(Tu bihûşta xwe
Li ser axa reş ava ke.
Bi kitêba cografyayê huş ke
Ê ku te bi "Hilkatî Âdem" ve dixapîne.
Tu bi tenê axê binase
Bi axê bawer ke.
Ji dayîka xwe ya helal veneqetîne
Dayîka axê.
Ji axê hez ke
Weke dayîka xwe...)

Rojen Barnas dengê têkoşîna xwe ya li hember mêtinkarîyê di her firsendê de bilind dike. Loma ew di vê mijarê de jî digel hezkirina zarokan li kuştina wan jî bi hesasî radiweste. Barnas di şerên navbera serdestan de ji ber kuştina zarokan zêdetir xemgîn dibe û gazinde xwe ji wan zilmkaran dike ku fikra şer û kuştinan xistine binhişîya zarokan û nahêlin ew zaroktîya xwe ve bimînin:

Mîna yê we, efendîno!
Zarûkên me jî fêrî dikirin
Veşartokê bilîzin
Û
Li şekir bi şîranî bimijîn

(...)
Çima we weha kir efendîno
Çima we wa' kir?
Ma leyistok biriyabûn di dinê
We fikra wan li kuştinê xera kir²¹²

Nâzım Hikmet jî bi qelesa xwe her tim di nav vê têkoşînê de cih girtîye. Ew kuştina zarokan dike mijara helbesta xwe ku emperyalîst ji bo berjewendîya xwe

²¹¹ Hikmet, *h.b.*, r. 233

²¹² Barnas, *Kadiz*, r. 270

dibin sebebê kuştina zarokan. Hikmet da ku êdî zarok nemirin bangawazîya gelan dike ku deng bidin dengê wî:

*Hiroşima'da öleli
oluyor bir on yıl kadar.
Yedi yaşında bir kızım,
büyümez ölü çocuklar,
(...)
Çalıyorum kapınızı,
teyze, amca, bir imza ver.
Çocuklar öldürülmesin
Şeker de yiyebilsinler.²¹³*

*(Qasî deh salan heye ku
li Hiroşimayê mirî me
keçikeke heft salî me
mezin nabin zarokên mirî,*

*Li derê we didim,
Xatî, apo, ka mohrekê (îmzeyekê).
Bila zarok neyên kuştinê
Bila şekiran jî bimijin.)*

Tiştê ku di van herdu helbestan de balê dikişîne ew e ku her du helbestvanan jî daxwaz û merama xwe bi heman risteyên wekî “*bila zarok neyên kuştin û şekiran bimijin.*” anîne ziman. Maqûl e em bêjin ku di vê helbesta Barnas de telmîheke eşkere heye, wî di vê helbesta xwe de risteya Hikmet bi kar anîye û helbesta xwe rasterast li hember a Hikmet wekî bersîveke nivîsandîye. Dîyar e ku Barnas vê daxwaz û hezkirina Hikmet ji dil nabîne, lewra li ber çavên wî zarok li Kurdistanê bi destên hemwelatîyên wî ve tîne kuştin lê Hikmet wan nabîne û bi gelemperî di mijarên zilmê de berê xwe dide li welatên cuda cuda. Di vê helbestê de jî Hikmet ji bo balê bikişîne li ser kuştina zaokan berê xwe daye li Japonyayê û behsa bûyera Hiroşimayê kiriye.

3.3.4. Hezkirina Yarê

Hezkirina yarê ji destpêka mirovahîyê ve heta roja me bûye mijara hunerê. Edebîyat jî yek ji wan qadan e ku însan û her tiştê di derhêqê însanan de ji xwe re dike mijar. Edebîyat him li dora mijara hezkirina yarê teşe digire û wê dermale dike him jî ji vê hezkirinê dermale dibe. Di dîroka edebîyatê de di gelek cureyên edebî de mijara

²¹³ Hikmet, *h.b.*, r. 1581

evînê hatîye honandin û bi taybetî jî di helbestan de ev mijar zêdetir berbiçav e. Di helbestên Rojen Barnas û Nâzım Hikmet de jî em rastî vê mijarê tên.

Wexta em bi giştî li helbestên Rojen Barnas dinêrin hezkirina Barnas zêdetir wekî hezkirineke platonîk dixuyê û xwedîyê vê hezkirinê jî nedîyar e. Ew di piranîya helbestên xwe yên evînî de li benda hatina yarê ye ku digel hezkirinê hesret jî dîyar dibe. Barnas di helbesta xwe ya bi navê “*De Were Ha*” de bi îmajên xurt dilsarîya yarê û hezkirina xwe tîne ziman. Ew dilê xwe wekî agir dibîne ku bi evînê dişewite, bi gotina xwe ya “dile min hêtûn e” dereceya hezkirina xwe tîne ziman û dilsarîya yarê jî wekî deryaya qeşemê disêwirîne. Serma hin caran dibe sedema mirinê, şair jî di vir de vê gotînê tîne wê mehneyê ku dile yarê ji ber vê sermayaya bêevînîyê lê nade, ew wekî mirîyan e:

Dilê min hêtûn e, ji evîna te
Dile te zemherîr e, zeber e, gêdûk
Dile te deryaya qeşemê,
Çi deryayek sar, qerisî, tezî,
Ji evînê bêhay,
Ne damar dijene ne reh lêdixe.
Di tanga min de, dile te;
Hişk û tevizî.²¹⁴

Tê dîtîn ku Hikmet li gor Barnas zêdetir cih dide mijara evînê. Lewra tê zanîn ku di her serdema jîyana Hikmet de jinek bûye hogirê wî û bi gelmeperî jî ji ber sedemên ku me di beşa jîyana wî de jî behs kiribû ji neçarî ji hezkirîyên xwe vediqete. Tiştên ku nîvco dimîne zêdetir di bîra însanan de dimîne û daxwaza însanan zêdetir dike. Loma Hikmet di piranîya helbestên xwe de behsa evîna xwe kirîye û di helbesta wî de mijara evîn û hesreta li hember evîndaran bi hev re gur bûne. Herwiha xwedîyê van helbestan jî her tim dîyar e. Lê em di jîyana Barnas de û di helbestên wî de rastî şopa tecrubeyeke şênber a li ser evînê nayên. Ev ferqa di navbera gurayîya mijarê him ji tecrubeyên wan him jî ji kevneşopîya wan a civakî tê. Lewra derdora civakî ku her du helbestvan tê de mezin bûne ji hev cuda ne.

²¹⁴ Barnas, *Kadiz*, r. 289

Di destpêkê de di helbesta Hikmet de jî wekî yê Barnas renekî platonîk heye, di helbesta wî ya bi navê *Îman* de em leqayî evîneke platonîk tîn, Hikmet di dilê xwe de bi evînê dişewite û nikare evîna xwe eşkere bike, ji neçarî berê xwe dide stêrkan û daxwaza hezkirinê dike. Lê dawî bi dilê wî nabe û ew hêvîya xwe winda dike:

*Kırk akşam üst üste: Sevsin! sözünü
İlk çıkan yıldız getirdin yâda.
Yine aratıyor her yarın dünü.
İmanım kalmadı yıldızlara da!...*²¹⁵

*(Çil şevan li ser hev: Bila hez ke! Gotina (wehda) xwe
Te bi stêrka ewil ve anî bîrê.
Dîsa her sibe xwezîya xwe bi doh tîne.
Îmana min nema êdî bi stêrkan jî.)*

Rojen Barnas êvîna xwe bi xîyalan dijî û ev vê xîyala xwe bi îmajê siruştê direngîne. Barnas bi şayesandineke xurt hevdişîna xwe û yarê li ber çavê me bi dûmenên siruştê, wekî senfonîyekê dişayesîne. Ew di xîyala xwe de tevî yara xwe li ber çemekî ne, di nav dar û devîyan de li ber mûzîka bayê bi dîtîna hev sersem dibin:

*Ez û tu
Li ber Ava Ro
Periyên daristana li dor me
Li ber muzîka bayê jî nav dar û devîyan
Bi reqsê di baleya evîna xeyalvejîn*²¹⁶

Nâzım Hikmet jî di helbesteke xwe de xîyala dîtîna yarê dike. Ew helbesta xwe di girtîgehê de ji yara xwe re dinivîsîne û ev helbest wekî xîyalekî dahatûyê ye û şayesandina biharê dike, di helbestê de Hikmet tevî hezkirîya xwe rojekê biharê di nav çîmenan de rûnîştî xîyal dike:

*Mürdüm eriği
 çiçek açmıştır.
-İlkönce zerdali çiçek açar
 Mürdüm eriği en sonra-
Sevgilim,
çimenin
diz üstü oturalım
karşı-be-karşı.
Hava lezzetli ve aydınlık
-fakat iyice ısınmadı daha-
Çağlanın kabuğu*

²¹⁵ Hikmet, *h.b.*, r. 1929

²¹⁶ Rojen Barnas, "Li Ber Ava Ro", *Kovara Nûbihar*, c. 17, h. 124, sal 20, İstanbul, 2013, r. 15

*Yemyeşil tüylüdür
Henüz yumuşacık...*²¹⁷

*(Alîçeya Murdumê
Gul vedaye niha.
Ewilî zerdalî gul vedide
Alîçeya Murdumê axirîyê-
Dildara min,
Em li ser çongan
Rûnên li ser mêrgan
Rû-bi-rû.
Hewa xweş û ronkayî
-Lê hêj baş germ nebûye-
Qalikê behîvterkê hêj hip-hêşîn e, mû li ser
Hêj nermokî)*

Evîndar her tim di fikara hev de ne, guhên wan her tim li ser hev e û li benda xeberekê ne. Ev fikar hin caran ji ber tirsaxebereke nexweş e ku jîyanê dike dogeh hin caran jî bi xem û xîyala yarê roja evîndar xweş dike. Barnas yek ji wan kesan e ku her tim li ser yarê difikire û tirsaxwê jî xeberên nexweş in ku jîyanê li wê dike dogeh:

*Saetek şêşt deqe ye, lê tu
Di her salîseyê de li bîra min
Û di her salîseyê de bi awakî di
Hişê min, fikra min li hev dixî
Jiyanê li ber min dikî cehennem.*²¹⁸

Nâzım Hikmet jî li ser heman mijarê ji jina xwe re helbestê dinivîse. Ew ji ber ku di girtîgehê de ye û ji jina xwe dûr e her tim wê difikire. Lê Hikmet ji rewşa xwe bi qasî Barnas bigazind nîne, vê rastîya xwe bi vegotîneke nerm tine ziman û vê mijarê ji xwe re nake derdeke mezin ku jîyan lê biherime:

*Kitap okurum :
 içinde sen varsın,
şarkı dinlerim :
 içinde sen.
Oturdum ekmeğimi yerim :
 karşımda sen oturursun,
çalışırım :
 karşımda sen.
Sen ki, her yerde “hâzır nâzır”ımsın,
 konuşamayız seninle,*

²¹⁷ Hikmet, *h.b.*, r. 711

²¹⁸ Barnas, *Kadiz*, r. 287

*duyamayız sesini birbirimizin :
sen benim sekiz yıldır dul karımsın...*²¹⁹

*(pirtûkan dixwînim:
di nav de tu heyî,
guh didime stranan
di nav de tu,
rûniştîm nanê xwe dixwim:
li hemberî min tu rûdinê,
dixebitim:
li hemberî min tu.
Tu: ya ku li her derê “hazir û nazir” a min î,
Em nikarin biaxivin ligel hev,
Dengên hev nabihîzin:
Ev heşt sal in tu jina min a bî yî.)*

Ji bo hin kesan evîn dibe sedema jîyanê, dinya bi hebûna yarê watedar dibe. Ev mijar di gelek helbestan de weke “hüsn-i talil” tê pêşberî me. Barnas jî yek ji wan kesan e ku jîyanê bi evîna xwe ve watedar dike û di helbesta xwe de vê hunerê bi kar tîne ku sedema bişkîfîna gulan, vekirina rojê, germbûna dilê xwe bi bişîrîna yarê ve girê dide:

*Çi dibe
Hema hinek bibişire
Bo
Gul bibişkife di bişkoka Rojê
Dilop dilop xwîn binizile
Li hinarîkan
Dil tawî ye
Dil ketiye taya sar
Bibişire
Da ku
Tîrêjê Gelawêj
Dî dil de biqijile*²²⁰

Nâzım Hikmet jî di helbesta xwe cih dide heman hunerê. Hikmet wexta di nexweşxaneyê de ye û bi Piraye (Hatice Zekiye Pirayende) yê re zewicandîye qîza xalê wî Mûnevver tê serdana wî, wê çaxê Hikmet dibe evîndarî Mûnevverê û li ser hatina wê helbest dinivîsîne.²²¹ Di vê helbestê de bi hatina Mûnevverê odeya nexweşxaneyê

²¹⁹ Hikmet, *h.b.*, r. 620

²²⁰ Barnas, *Kadiz*, r. 38

²²¹ Bezirci, *h.b.*, r. 63

li ber çavên Hikmet dibe mêgr û çîmen, gul vedibin, girîyên wê dibin hebên încîyan û dibarin mistên wî:

*Hoş geldin kadınım benim, hoş geldin!
Ayağını bastın odama
Kırk yıllık beton, çayır çimen şimdi.
Güldün,
güller açıldı pencereimin demirlerinde.
Ağladın,
avuçlarıma döküldü inciler;
Gönlüm gibi zengin,
hürriyet gibi aydınlık oldu odam.
Hoş geldin kadınım benim, hoş geldin...*²²²

*(Bi xêr hatî jina min, bi xêr hatî!
Te çawa ku gava xwe avête odeya min
Betona çil salî bû mêrg û gul niha.
Tu kenîyayî,
Gulan veda li caxên pencereya min.
Tu girîyayî,
Încî rijîyane kefa destê min;
Odeya min mîna hûrîyetê bû ronkayî
Û bû weke dilê min dewlemend.
Bi xêr hatî jina min, bi xêr hatî!)*

Wekî ku tê dîtin her du helbestvanan jî di vê hunerê de mazmûneke hevpar bi kar anîne. Wan di helbestên xwe de rewşeke tabîî ya bişkîfîna gulan bi rêya hunera hûsn-i talîlê bi sebeba bişîrîna yarê ve girêdane û vegotina xwe xurttir kirine.

Di helbesta bi navê *Bîbik Dirêsin* de Barnas sînoren di navbera însanan de hildiweşîne û balê dikişîne ser problemeke civakî. Barnas deng li yara xwe dike ku sînoren nijadperestîyê bide alîyekî û dilê xwe bispêre dilê wî. Di vir de yar aîdî tu çîn, nijad û taybetmedîyê nîn e ew tenê dibe sembola hezkirin û evînê. Barnas bi vê helbestê radigîhîne ku ji hezkirinê re tu tişt nabe asteng her însan bi her rengê xwe, bi her cudahîyên xwe ve hêjayî hezkirinê ye, hezkirina mirovan li ser her tiştî re ye. Tê dîtin ku di vê helbestê de digel evîna şexsî fehma mirovayê jî hatîye honandin:

*Evîn
Nîjad û dîn nanase:
Reşik,
gewrik,
zerik*

²²² Hikmet, *h.b.*, r. 916

û sorîn
nîn in di ferhenga wê de
Gişt wek hev
Mirovîn.
Were dîsa ez û tu
Dilan bispêrin dilan
Ji xwe re pêjdîn
-ji kewarê evînê-
*çekin.*²²³

Ev helbesta li jêr ji bo fehmkirina zîhnîyeta evîna Nâzım Hikmet mîna keke baş e. Ev helbest tenê li ser evîna şexsî nehatîye avakirin û tê de fehma mirovahîyê jî heye. Ew di vê helbestê de digel evîna xwe mirovhezîya xwe jî nîşan dide ku ketina nav civakê ji bo wî kêfxweşî ye. Her taybetîyên aîdî însanan ji bo wî hêjayî hezkirinê ye, di vê çarçoveyê de jî ew digel evîna xwe hezkirina her tiştê insanî tîne ziman:

İnsanların içindeyim seviyorum insanları
Hareketi seviyorum
Düşünceyi seviyorum
Kavgamı seviyorum
Sen bahr içinde bir insansın sevgilim
*Seni seviyorum.*²²⁴

(Di nava însanan de me, ji wan hez dikim
Ji tevgerê hez dikim
Ji hizrê hez dikim
Ji de'wa xwe hez dikim
Tu insanekî di nava behrê da yî dildara min
Ji te hez dikim.)

3.4. Hêvî/Umîd û Hezkirina Jîyanê

Yek ji mijarên hevpar jî hêvî û hezkirina jîyanê ye ku bi sixletî di helbestên Rojen Barnas û Nâzım Hikmet de cih digire. Her çiqas her du şair jî di jîyana xwe de bûne şahîdê gelek zehmetîyên weke; şer, cuntayên leşkerî û dûrbûna ji welêt jî dîsa hêvî û hezkirina wan a li hember jîyanê kêr nebûye. Digel van hemû nêyînîyan wan di helbestên xwe de her tim cih dane nirxên wekî; qencî, xweşikî, biratî, wekhevî û azadîyê ku ew her tim di evîn, îdeolojî, dahatû û di gelek mijarên jîyanê de bi hêvîyeke xurt derdikevin pêşberî xwîneran.

²²³ Barnas, *Kadiz*, r. 167-68

²²⁴ Hikmet, *h.b.*, r. 889

Rojen Barnas di helbesta xwe ya bi navê *Jîn Xweş e Evdalo! Evdalê Zeynikê!* de hezkirina xwe ya li hember jîyanê û hêvîyen xwe tîne ziman. Di vê helbestê de Barnas dide zanîn ku ew her rengê jîyanê hez dike. Li gor wî jîyan digel hemû neyînîyan, bi her rengê xwe ve ji mirinê xweştir e. Barnas di vê helbestê de jî balê dikişîne li ser ferqa di navbera çînan û bi helwesteke îdeolojîk bangewazîya yekitîyê dike ku dê li hember neyînîyên jîyanê bi hev re û bi meferî têkoşîna xwe berdewam bikin:

Jîn xweş e, Evdalo!
Jîn xweş e.
 (...)
 Jîn çêtir e, Evdalo!
Jîn çêtir e.
Jîn xweştir e ji mirinê
Lê
Mala feqîrîyê xopan be
Ka were
Em milên xwe bidin hev
Bo jînê,
Bo evînê
Êrîş bibin ser kozikê
Feqîrîyê bimalin ji binî,
*Feqîrîyê bimalin bi têkoşînê.*²²⁵

Hêvî û hezkirina jîyanê di gelek helbestên Nâzım Hikmet de cih digirin. Wekî ku tê zanîn piştî salên dirêj ên li girtîgehê, wî azadîya xwe ji nû ve bidest xistîye. Loma ew di vê helbestê de hezkirina jîyanê wekî kesekî ku ji nû ve hatîye dinyayê bi coş û kelecane nişan dide. Hikmet qîmetê dide her tiştê jîyanê, belkî ji bo gelek însanan tiştên ji rêzê be jî ew hay ji tehmên dinyayê heye û qîmetê dide wan. Ew dinyayê wekî behreke bêserûbin dibîne û li ber xwarinên li dinyayê, dîtina tavê, ji ber hebûna xwe şa dibe û vê şabûna xwe bi coşekê nişan dide. Ev helbest şeweya hezkirina Hikmet a li hember jîyanê bi me dide zanin ku ew jîyanê bi fehmdarî dijî, berke-berk girêdayî jîyanê ye û bi heyecana zarokekî piçûk dinyayê ji nû ve nas dike. Ew hezkirina xwe bi van risteyan tîne ziman:

Görmek
İşitmek
duymak
düşünmek

²²⁵ Barnas, Kadiz, r. 137

ve konuşmak

koşmak alabildiğine

başı dolu

başı boş

koş-

-mak....

(...)

Yaşamak ne güzel şey

TARANTA – BABU

Anlıyarak bir usta kitap gibi

Bir sevda şarkısı gibi duyup

Bir çocuk gibi şaşarak

YAŞAMAK...²²⁶

(Dîtin

sehkirin

bihîstin

hizirîn

û axaftin

hingî mecal çêbû revîn

bi fîkar

bê fîkar

re-

-vîn

(...)

Jîyîn çi tişteki xweş e

TARANTA – BABU

Têgihîştin weke kitêbeke hosta

Bihîstin weke straneke sewdayî

Heyirîn weke zarokekî

JÎYÎN...)

Tiştê ku mirovan li jîyanê digire hêvî ye, mirov her tim li benda hêvîyekê ye ku dinyaya xwe xweştir bike. Barnas jî li hember hemû neyînîyan bi hêvî ye û di helbesta xwe de jî vê şîretê dike. Di vê helbestê de Barnas rewşa Amedê tîne ziman ku di serdemeke zehmet de derbaz dibe, deng li gelê Amedê dike ku hêvîyên xwe qut nekin, her tim bi hêvî bibin, ji bo rojên geş li ber xwe bidin û li hember neyînî û bextreşîyan meşaleyên berxwedanê vêxin:

Megirî Ameda min, megirî

Xêliya rêş vegire

²²⁶ Hikmet, h.b., r. 448-49

*Lê tu car û tu car
Bêmefer mebe
Bêmefer ne be da ku em
Xitêran vêxin ji bo rojên geş
Bizavê qetav kin ji nû ve
Venê biseqînin da ev bextê b'reş
Vepejile²²⁷*

Di jîyana Nâzım Hikmet de ji bo ku ew bêhêvî be gelek sedem hene û em di beşa jîyana wî de li ser van mijaran bi berfirehî sekinîbûn. Lê digel van hemû neyînîyan ew di piranîya helbestên xwe de, di her mijarî de hêvîdar e. Em dikarin bibêjin ku ev hêvî ya Hikmet bingeha xwe ji hezkirina jîyanê, ji berxwedan û çakbînîya wî digire ku ew her tim ji dahatûyê hêvîdar e. Ji bo vê umîdwarîya Hikmet ev helbesta li jêrê mîna keke maqûl e:

*(...)
Sevgilim,
bu ayak sesleri bu katliamda
hürriyetimi, ekmeğimi ve seni kaybettiğim oldu,
fakat açlığın, karanlığın ve çılgınlıkların içinden
güneşli elleriyle kapımızı çalacak olan
gelecek günlere güvenimi kaybetmedim hiçbir zaman...²²⁸*

*(Dildara min,
Ev teqereqa solan di vê komkujîyê de
Car hat ez ji azadîya xwe, ji nanê xwe û ji te bûm,
Lê min tu wextê ji nava birçîbûn, tarîti û qêrînan de
bawerîya xwe ya siberojan ji dest neda
ku wê bi destê xwe yên ronkayî bê li derê me bide.)*

Mijara hêvîyê bêhtir xwe di warê îdeolojîyê de nîşan dide ku ew her du helbestvan li hember mêtînkaran her tim ji bo dahatûyeka geştir û azad bi hêvî ne û vê hêvîya xwe ji çîna kedkaran û yektîyê digirin. Rojen Barnas di helbesta xwe de behsa vê yeke dike ku wê bi yekiti û berxwedana kedkaran welatê wî rizgar bibe. Di vê helbestê de Barnas xwe di nav çîna kedkaran de dihesîbîne, ji ber vê sedemê jî ew

²²⁷ Barnas, *Kadiz*, r. 216

²²⁸ Hikmet, *h.b.*, r. 644

kirdeya “em” ê bi kar tîne û xwe tevlî vê berxwedanê dike. Wekî ku tê zanîn ber bi salên dawî yên şerê cihanê yê duyem ve serdestên wekî Hîtler (1889-1945), Musolînî (1883-1945) û Hîrohîto (1901-1989) rengê nû dan kapîtalîzmê ku di salên 1900an de tekedest bibû. Ev rengê nû dîktatorî bi xwe bû ku wan bi polîtîkayên xwe yên faşîst li dinyayê deng vedan. Barnas jî behsa têkbirina serdestên wekî Hîtler, Mûsaolînî û Dehak dike û ew bi gotina xwe ya “Me çawa hejand Mûsolînî” bi me dide zanîn ku ew bindest û kedkarên hemû cihanê wekî xwe dibîne û li hember hemû zilmkaran ber xwe dide. Ê ew bi van mînakên dîrokî hevîya xwe mezin dike û di wê bawerîyê de ye ku wê tegez rojekê azadî were welatê wî jî:

(...)
 Ê me
Çeka di destê Hîtler çawa kir dijminê sere wî
Ê me çawa hejand Mûsolînî
-Mîna dewkula li sepîyê-
Li daran...
Bi avê
Bi nan
Bi dilopa xweydana eniya xebatkaran
Bêmefer û xemgîr mebin!
Nêzîk e, bibîşkîfê felatî
Di gerûya Rojê
Bi sarêya
asiwayê
di navsera
Sîpan
*De.*²²⁹

Nâzım Hîkmet jî di helbesta xwe de bi heman hêvîyê ji bo welatê xwe li benda hatina azadîyê ye. Ew di helbesta xwe de wekî ku yara xwe re diaxive behsa hêvîyên xwe û azadîyê dike. Hikmet jî hêvîya xwe ji dîrokê digire û ew di wê hêvîyê de ye ku çawa serdestên zilmkar di nav pelên dîrokê de winda bûne wê rojekê textê mêtinkarên wan jî bi destên kedkaran hilweşe û azadî were welatê wî:

Onlar ümidin düşmanıdır, sevgilim,
akar suyun
meyve çağında ağacın,
serip gelişen hayatın düşmanı.
Çünkü ölüm vurdu damgasını alınlarına:
-çürüyen diş, dökülen et-,
bir daha geri dönmek üzere yıkılıp gidecekler,

²²⁹ Barnas, Kadiz, r. 165

*Ve elbette ki, sevgilim, elbet,
dolaşacaktır elini kolunu sallaya sallaya,
dolaşacaktır en şanlı elbisesiyle: işçi tulumuyla,
bu güzelim memlekette hürriyet...²³⁰*

*(Ew dujminê hêvîyê ne, dildara min,
Dujminên çem û robaran
Dujminên dara bermiraz
Û dujminê wê heyatê ne ku reh berdide axê.
Ji ber ku mirinê mohra xwe li enîya wan xist:
-diranê dirizê, goştê dirije-,
Wê hilweşin û herin, bi awayekî ku careka din hew vegerin,
Û helbet, dildara min, helbet,
Wê hurîyet bigere bi dilê xwe,
Bigere bi kincên xwe yên herî birûmet: bi tulumê karker ve
Li vî welatê nazenîn...)*

3.5. Dê/ Dayik

Her çiqas civaka kurd û tirkan civakên patriarkal/pederşahî bin jî tê dîtin ku hin caran wesfa dayikbûnê dikeve pêşîya wesfa bawtîya mêran. Di her du civakan de jî dayik weke heyîneke pîroz û rûmetgiran her tim bûye taca serîyan. Ji ber vê sedemê jî îmaja dayikê di berhemên edebî de jî cih girtîye.

Nâzım Hikmet û Rojen Barnas jî di helbestên xwe de cih didin vê mijarê û ew bi îmaj û şibandinên hevpar digel hezkirin û endîşeya dayikbûnê, êş û xemên dayikan jî tînin ziman.

Wekî hemû heyînen mê yên li dinyayê, malzaroka axê jî heye û ax bi berên xwe dibe kanîya jîyanê. Ji ber vê taybetmendîya xwe ax di gelek helbestan de wekî sembola jinanîyê, wekî dayikekê tê şayesandin. Barnas jî di helbesta xwe de îmaja dayikê bi kar tîne ku ax dibe dayikek û ji pêşîrên xwe jînê diherîkîne. Ew bi dilovanîya dayikek ji bo rizqê zarokên xwe her tim li benda cotyaran e ku tovên jîyanê bireşînin malzaroka wê:

*Kula axê ev:
Herşev
Zarûkên xwe dibîne di xewnê de
Li ser cot

Gundî
Gişt bûne cotyarî
Arizî,
lixweser*

²³⁰ Hikmet, h.b., r. 635

Bi bîryardarî
Gihîştine hev
û tev
Xwe dane ber pêşîrên wê
Yên
dagirtî
Mîna pitikên li ber şîr
Pêşîrê
Miz didin bi dîlovanî
Dinapîrînin
Digezin carcarna bi şalûsî
Û bê etlahî
Dimijîn lê
Bi çavnebarî. ²³¹

Nâzım Hikmet jî di helbesta xwe de cih dide axê ku vê hêmaya siruştî bi îmajê dayikê ve dermale dike. Hikmet toximkirina axê wekî ya dayikeke dîlovan ku di endîşeya têrkirina zarokên xwe de ye venabêje. Di helbesta wî de erotîzmeke nîspî heye. Ew axê wekî jineke bi şehwet teswîr dike ku ji bo dayikbûnê li benda tovê zayînê ye:

tarla hazırdı
koyu esmer eti anadan doğma çırılçıplak
tarla hazırdı
şişkin ıslak dudaklarını açmıştı yarı yarıya
uzun sürmedi bekleyiş
sabah aydınlığında canlı küçük kurtlar gibi yukardan saçılıp aktı tohum
hazla ürperdi toprak
içine çekti akarı
açılıp kapanarak
açılıp kapanarak
sonra da mahmur
bir kat daha güzel
terli kabarık
gerindi
ben ölümden kuvvetliyim diyebilirdi
gebeydi artık. ²³²

(ew best û beyar hazır bû
goştê wî yê qemer, çawa ku ji dîya xwe bikeve şîlfîtaî
best û beyar hazır bû
lêvên werimî yên ter vekiribû nîvî-nîvî

²³¹ Barnas, Kadiz, r. 109-110

²³² Hikmet, h.b., r. 910

zêde nedomand payîn
mîna kurmikên zindî yên hûr ji jor de belav bû di ronkayîya sibê de
ax bi coş û peroş ricifî
bi vebûn û girtinê
bi vebûn û girtinê
paşê jî sermest
qatek xweşiktir
bi xwêdaneke werimî
tevzî da xwe
dikaribû bigota ez ji mirinê mezintir im
bardar bû êdî.)

Rojen Barnas di helbesta xwe ya bi navê *Ez Mendalekî Çar Salî Me, Mamo!* de bi çavên zarokekî biçûk bişirînên dayikê teswîr dike ku dayika xwe di şer de winda kirîye. Zarok di vê helbestê de bişirînên dayika xwe dişibîne rojê ku îhtîyaca wî bi hezkirin û bişirîna dayikê heye:

Roj
Mîna kilorekî rûnî, ji genimê sorgul
Ku di tendurê de sorgizirî
Di şebaka me de,
 li rojhilat
 li esman
 ji min re
Wekî bişirînên dayika min
 *dibişirî*²³³

Nâzım Hikmet jî di helbesta xwe ya bi navê *Annen (Dayika Te)* de behsa dayikê dike. Di vê helbestê de qîmet û hêjahîya dayikê disêwirîne ku ew di her serdema jîyana însanî de bi hezkirin û fedakarîya xwe cihê sereke digire:

Şimdi sen giderken okula
Yemeğini kim hazırlar?
Kim bakar arkandan yola?
Kimdir seni en çok seven?
 *Annen!*²³⁴

(Dema tu niha herî dibistanê
Wê xwarina te kî çêke?
Wê kî li pey te çaverê be?

²³³ Barnas, Kadiz, r. 158

²³⁴ Hikmet, h.b., r. 952

*Kî ye yê ku herî zêde ji te hez dike?
Dîya te!)*

Dîsa herdu helbestvan di vê beşê de jî xwe ji problemeke civakî nadine dûr û cih didin êş û azarên dayikan. Barnas di helbesta xwe de cih dide tirs û meraqa dayika şehîdekî ku çavên wê li hatina kurê wê ye:

*Kire gazî:
Da rêwiningiyê wê vê carê jî
Bi xweşî
bi ser de
bê.
Kizîn ji kezebê çû,
Lûvand di ber xwe de:
-“Rêwiningiyê min lir ê ye, vê şeve
Nizanin gelo
Dê bigihîje menzil û meqsedê?”²³⁵*

Dîsa Nâzım Hikmet jî li ser heman mijarî helbest nivîsandîye. Ew helbesta xwe bi devê jineke vedibêje, behsa bextreşî û dilsojîya dayikan dike ku zarokên wan diçin şer. Çavên van dayikan bi salan li rê ye lê zarokên wan venagerin:

*Hicreti tadalı geçmedi bir gün
Yetmezmiş gibi de bu kadar hüznün
Bak yine açıldı hicran yılları
Al giden benizler ya döner sarı,
Ya yıllar geçer de gelmez haber
Gözleri yollarda analar bekler...
Ah biz bağıryanık Türk kadınları
Hep kara yazılı bu alınları²³⁶

(Hingî ku hîcret hat tehmandin rojek neborî
Serbarê ser evqas jî huzn
Binêre dîsa vebû salên hîcranê
Dêmên ku sor diçin yan zer vedigerin
Yan jî xeber nayê piştî salên didine pey hev
Dayîk çav li rê qerimî...
Ax em jinên Tirk ên cegerdax
Tîm reşan xwe pêçaye li enîyên wan.)*

3.6. Îxanet

²³⁵ Barnas, *Kadiz*, r. 266

²³⁶ Hikmet, *h.b.*, r. 1910

Yek ji mijarên hevpar jî mijara îxanetê ye ku her du helbestvan jî wan kesan rexne dikin ku ji welat û doza xwe re îxanet kirine. Nâzım Hikmet û Rojen Barnas weke du helbestvanên sosyalîst tîn nasîn û wekî ku tê zanîn ji bo sosyalîstan jî doz û armanca yekîtiyê û wekhevîyê tiştên jênegar in. Wan jî li ser meseleya doz û armanca yekîtiyê berê xwe dane rexneyeke hevpar û ji xwe re karakterek afirandine ku ev karakter bi hevalfiroşîyê û welatfiroşîyê tê sûcdarkirin û li ser heman îmajê rexneyên xwe anîne ziman.

Rojen Barnas di helbesta xwe ya bi navê *Kurê Jina Xwe* de rewşa vê karakterê şîrove dike ku di civata kurdan de tu wesfê wî tune û kesekî jî rêzê ye. Lê ev karakter li gor berjewendîya xwe tev digere, îxanetê li welatê xwe dike û bi welatfiroşîyê di civaka serdestan de dibe xwedîyê wesf û giranîyê. Barnas di vê helbestê de ji bo rexne û piçûkxistina vê karakterê îmaja jinê bi kar tîne û wî wekî “*kurê jina*” xwe binav dike:

*Di civata me de ciyê wî
Ne li seriya civatê bû
Û ne jî li ber şekalan*

*Ne tazî bû, ne birçî bû, ne bêrûmet
Di civata me de ew
Bi qasî giringiya xwe
Xwedî siyanet.*

*Bi rêwîti çû deverekê
Rom bû, Konstantîniye bû? Nizanim.
Şam bû, Bexda bû, Tehran bû
Ankara bû? An ciyekî din
Ez nizanim
Û rawî jî salixê wî ciyê nadin.*

*Kursîkî kişandin binî
Û xeftanekî lê kirin.
Di meclisek xas de tişteke gotinê
Ku pê ruhê wî
Ji yê me cihê kirin.*

*Êdî, me jî wî navê
Lê,
Gava lê dibe pêsîrtengî
Kurê jina xwe
Tê xwe davêje bextê bavê.²³⁷*

²³⁷ Barnas, Kadiz, r. 305

Karakterê Nâzım Hikmet jî bi hevalfiroşîyê tê sûcdarkirin. Lê Hikmet di vê helbestê de derûnîya vî karakterî şîrove dike ku ew ji ber vê xeletîya xwe di nav tirsê de dijî, tirs wekî sîyekî her tim li dû wî ye, dengê wîcdana wî jîyanê lê diherîmîne û ev halê wî wekî nexweşîya cuzamê rihê wî diperitîne. Herwiha Hikmet jî di vê helbestê de îmajê jinê bo piçûkxistinê bi kar tîne ku hevalfiroşîyê wekî firotina namûsê teswîr dike û jina vê karakterê tev li mijarê dike:

bu adam

*sattı arkadaşını;
sattı altın bir tepside arkadaşının
kanlı, kesik başını...*

(...)

*güneş batınca her akşam,
kaldırımlarda karısının donunu sürüyerek,
parmaklarının ucuna basıp yürüyerek
size doğru yaklaşan odur.*

*siz tanıyın onu
kalbinin boynunda sallanarak seslenen
mel'un çingırağından,
ve bilin ki onun
döküyor parça parça cüzzam illeti
ruhunun
etini...*

*bu adam bugün açtır.
açtır ama,
kaybetti bu adamda
kudretli ve büyük açlık bile kudsiyetini...*²³⁸

*(vî zîlamî
firot hevalê xwe
firot di tepsîyeke zêrîn de
serê hevalê xwe ya jêkirî û bixwîn..*

(...)

*Wexta ku her êvar ro diçe ava,
Kesê ser peyareyan derpîyê jina xwe kaş dike,
Li serpêçîyên xwe dimeşe,
nêzîkî we dibe ew e
hûn wî nas bikin
ji dengê zengila dile wî ya mel'ûn
ku li stûyê wî diheje,
û bizanibin ku*

²³⁸ Hikmet, h.b., r. 137

*êşa cuzamê goştê ruhê wî parepare diqetîne
ev zilam îro birçî ye
birçîye lê
winda kir birçîbûna mezin û biquddret jî
pîrozwerîya xwe li vî zilamî)*

Ji mînakên jî dîyar e ku herdu helbestvan jî li ser heman mijarî bi heman hesasiyete rawestîyane û herdu jî bi zimanekî tund rexneyên xwe araste dikin. Lê ev meseleya piçûkxistina van karakteran de bikaranîna îmajê jinê bixwe sedema rexneyê ye. Lewra ev herdu helbestvan di helbestên xwe de ji bo wekhevîya civakê hewl didin û ferqa di navbera civakan rexne dikin. Lê di vir de ew bi xwe ferqê dikin navbera nasnameyên zayendî ku jinan dikin qurbana kirinê zilaman û ji bo piçûkxistina van zilaman jin û namûsa jinê dikin mijar. Bi vê hişmendîya xwe nasnameya jinê bêwesf dikin.

3.7. Azadî

Nâzım Hikmet û Rojen Barnas her tim li hember mêtinkariyê dengê xwe yê îtîrazê bilind kirine û daxwaza dinyayeke azad kirine. Di vê mijarê de jî bi taybetî li ser azadiyê rawestîyane û li ser têkoşîna azadiyê bi heman terz û îmajan helbest nivîsandine.

Rojen Barnas di helbesta xwe de behsa têkoşerên azadiyê dike. Di vê helbestê tarîfî sembola dijmin e û di heman demê de dijmin dişibîne *Efrûtan* ku êrîşî şervanan dike. Dîsa Barnas mirina van şervanan wekî şemitîna stêrkan disêwirîne ku di civata nemiran de cih digirin. Şemitîna stêrkan wekî teswîreke folklorîk ji bo mirina mîrxasan tê bikaranîn, Barnas jî di vir de ji hêmanên folklorîk sûdwergirtîye û digel wê meneyê ji bo sembola ronîyê jî bi kar anîye ku di helbesta wî de dijmin tarîyê, şervan jî ronîyê temsîl dike:

*Têkoşerê rizgariyê
Dest kir tikîna tarîyê
Gewriyê li Efrûtê tirsê şidand
Û gotê;
-“Pûç e, ey tirs
 gef û daxwaza te pûç e!
 (...)
Alaya erkê
Neket erdê.
Lê,
Dîsa şemitî stêrkek ji esmanê me.*

*Têkoşerekî
Mîna şêrekî, gurmist
Qutifand li hevûdu mirinê
Mîna pêldayîna serawayek
Ji milkê evînê
Ji hevalan veqetî
Çû civata nemirdan
Rûnişt di civînê.²³⁹*

Nâzım Hîkmet jî di helbesta xwe ya bi navê *Hürriyet Kavgası (Şerê Azadîyê)* de li ser heman mijarê radiweste. Di vê helbestê de jî dijmin tarîyê, têkoşer jî ronîyê temsil dikin û dîsa şehîdbûna têkoşeran tê vegotin ku ev rihê wan ê nemir her tim ji nû ve tev li şer dibin.

*Yine kitapları, türkûleri, bayraklarıyla geldiler,
dalga dalga aydınlık oldular,
yürüdüler karanlığın üstüne.
Meydanları zaptettiler yine.*

*Beyazıt'ta şehit düşen
silkinip kalktı kabrinden,
ve elinde bir güneş gibi taşıyıp yarasını
yıkta Şahmeran'ın mağarasını.²⁴⁰*

*(Dîsa bi kitêb, kilam, alayên xwe hatin,
pêl bi pêl ronahî vedan,
çûn ser tarîtîyê
meydanan zeft kirin dîsa*

*li Beyazûtê şehîd bûn
hilpekîya rabû ji qebrê,
û birîna xwe di desten xwe de wekî rojê gerand
hilweşand şikefta Şahmeran.)*

3.8. Dîrok

Yek ji erkên edebîyatê jî neqilkirina nirxên civakî ye. Bi vê alîyê xwe ve jî edebîyat amûreke kevn a tomarkirinê ye. Her netewe bi rêya edebîyatê çand û dîroka xwe tomar dikin û hebûna van nirxan didomîn. Helbesta modern jî weke cureyeke edebîyatê amûreke tomarkirinê ye ku hemû bûyerên girîng ên dîrokê di bîra kolektîf de qeyd dike.

²³⁹ Barnas, *Kadiz*, r. 258-259

²⁴⁰ Hikmet, *h.b.*, r. 1788

*Di dilan de runişt
Û tê de
Xîreta bizava armancên ronak vêxist
Alaya serketina meferê vegirt.*²⁴²

Nâzım Hikmet jî di helbestên xwe de cih dide kesayet û bûyerên dîrokî û bi vê helwesta xwe ji dibe tevkarê afirandina bîra cîvakî. Wî gelek bûyerên serdema xwe ji xwe re kirine mijar ku ew helbest îro wekî şahîdên bûyerên dîrokî derdikevin pêşberî xwîneran. Di vê mijarê de em dikarin behsa Destana *Şeyh Bedreddin* bikin ku Hikmet cara ewil bi vê destanê mijareke dîrokî tevli helbesta xwe kirîye. Ew vê bûyera dîrokî ku di ser de sedan sal derbas bûye bi perspektîfeke pêşverû şîrove dike û vê destanê bi nerîneke hevçax û neteweyî ve dermale dike.²⁴³ Nâzım jî bo vê destanê ji pirtûkên dîrokî jêgirtinan dike, bi vegotîneke sade û fehmbarek, li gor fehma xwe ji nû ve dinivîsîne.

*Aydının Türk köylüleri,
Sakızlı Rum gemiciler,
Yahudi esnafları,
on bin mülhid yoldaşı Börklüce Mustafa'nın
düşman ormanına on bin balta gibi daldı.
Bayrakları al, yeşil,
kalkanları kakma, tolgası tunç
saflar
pâre pâre edildi ama,
boşanan yağmur içinde gün inerken akşama
on binler iki bin kaldı.
(...)
Tarihsel, sosyal, ekonomik şartların
zaruri neticesi bu!*²⁴⁴

*(Gundîyên Aydınê yên Tirk,
Keştîvanên Rum ên Sakızî
Bazîrganên Cihû
Deh hezar rêhevalên Xwedênenas ên Börklüce Mustafa
wekî deh hezar bivir ketin daristanên dujmin
alayên wan sor û kesk,
mertalên zîvîn, kumzîrxên tûnc
refan
belav kirin lê,
wexta ro di nav baranê diçû ava
ji deh hezaran du hezar man.*

²⁴² Barnas, Kadiz, r. 117-119

²⁴³ Bezirci, h.b., r. 152

²⁴⁴ Hikmet, h.b., r. 498

(...)

ev encama pêwîst a

mercên dîrokî, civakî û aborîyê ye!

Wekî ku dîyar e her du helbestvan jî bi hizra neteweyî di helbestên xwe de cih dane kesayet û bûyerên dîrokî. Dîsa herdu jî di çarçoveya hizra neteweyî de û bi zimaneke sade û fehmbare bûyeran şîrove dikin û ew di van helbestên xwe de dema aktuel û ya destanî/dîrokî bi hev ve girê didin. Bi taybetî Barnas ji pêkhatina bûyerên dîrokî kêfxweş e ku ji nifşên nû re bûne mînakên xîret û hêvîyê.

3.9. Mirin

Mirin di jîyanê de rastîyeke bêçare ye ku her tim zêhna însan mijûl dike û tenê însan xwedîyê wê derfetê ye ku bi rêya hunerê hest, raman, tirs û xemgînîya xwe ya li hember mirinê tîne ziman. Gelek helbestvan jî di helbestên xwe de cih didin rastîya mirinê ku bi nêrînên ciyawaz nêzîkî vê mijarê dibin. Ev mijar di helbestan de hin caran weke qebûlkirinekê, hin caran jî weke îtîrazekê derdikeve pêşberî xwîneran. Rojen Barnas û Nâzîm Hikmet jî ne di heman gurrahîyê de be jî di helbestên xwe de cih dane mijara mirinê.

Rojen Barnas di helbesta xwe ya bi navê *Şemitîna Stêrkan* de cih dide mirinê. Ew rastîya mirinê qebûl dike lê li hember mirinê jî berdewamîya jîyan û zayînê hêvî dide wî. Barnas di vê helbestê de ji sêwirandineke folklorîk îstîfade dike û mirina kesên mezin ku li ser doz û armançekê dimirin wekî şemitîna stêrkan teswîr dike. Barnas di vê helbestê de mirina di rêya têkoşînê de îşaret dike û mirina bi vî rengî di mertebeyeke bilind de dibîne û bi nêrîna wî kesên ji bo azadîyê dimirin li dû xwe rêya azadîyê vedikin û nav û şopa wan her li dinyayê dimîne.

Ku şemitîna stêrkek

Nimaya mirina yekî mezin be;

Herşev ji esmanê me

Stêrk dişemitin bê hejmar.

Ne bêsedem û beyhûde ye,

Ku hêvîdarên siberoj in, em.

Me welatek wer zayok heye.

Ranaweste li ber rihstîn tu car.

Neşemitin stêrk! bêsedem,

Nexuricin bê şop û bê ronahî.

*Xuricîna we, divê azahî
Tov ke li dû xwe, bi kerem.*²⁴⁵

Nâzım Hikmet jî di helbesta xwe de cih dide mirina têkoşeran û ew jî li ser heman hişmendîyê ye ku kesên ku li ser doz û armancekê dimirin nayên jibîrkin, bi rêzdarî û şanazî tîn bi bîranîn û Hikmet dide zanîn ku mirin nikare rê li ber doza wan bigire.

*Yangınlara fazla bakan gözler yaşarmaz,
Alın kızıl yıldızlı baş secdeye varmaz,
Dövüşenler ölenlerin tutmaz yasını.*

*Yine fakat bir yıldırım zulmeti yırtsa,
Sağır göğün koynundaki çanı haykırtsa,
Anıyoruz göğsümüzün son sayhasını.*

*Karadeniz bunu duysun derinliklerin:
O ateşli göğüsleri delen hançerin
Kabzasını alacağız biz elimize!*²⁴⁶

*(Hêsir nakevin çavên zêde li agir dinêrin,
Enîyên bi stêrka sor xwarî secdeye nabe,
Şervan şîna mirîyan nagrin.*

*Lê ger dîsa birûskek biqelişîne tarîstanê,
Naqosa di paşila esmanê ker bide qêrînê
Em bi bîr tînin qêrîna dawî ya dilên xwe*

*Bila vê bibîhîze kurahîyên te Behra reş:
Ew xençera te ya ku dilên pizot qul dike
Emê qevda wê bigirin desten xwe!)*

Mirin her çiqas rastîyeke jîyanê be jî hin mirinên nepayîn zêdetir dilê însan diêşînin. Bi taybetî jî mirina kesên navdar ku bi xebatên xwe di civakê de cih girtine dibin sebebê xemgînîyê ku qebûlkirina wê zehmet e. Rojen Barnas jî helbesta xwe li ser mirina Yılmaz Güney (1937-1984) dinivîsîne ku ew di filmên xwe de zêdetir cih dide mijarên civakî û bi vê xusûsîyeta xwe jî di civakê de ciheke taybet digire. Barnas vê mirinê wekî mirineke bêwext dibîne, li hember vê mirinê jî dengê xwe yê îtîrazê bilind dike û bi gazind deng li kesê mirî dike.

*Niha ne wextê mirinê ye,
Çavê milyonan li te!*

²⁴⁵ Barnas, Kadiz, r. 253

²⁴⁶ Hikmet, h.b, r. 1984

*Niha ne wextê şînkirinê ye,
Dengê milyonan bibe xwe
Rabe,
Bi kerem
Çavê xwe veke.*²⁴⁷

Nâzım Hikmet jî di helbesta xwe ya bi navê *Uyan Fatma (Şîyar be Fatma)* de ji mirineke bêwext gazind dike. Di vê helbestê de Hikmet ji ber mirina yarê xemgînîya xwe tîne ziman û tê dîtîn ku di vê helbestê de digel xemgînîyê dilînên hesretê jî cih digire. Hikmet jî di vê helbestê de bi heman terza vegotinê bi kar tîne û bi denglêkirinê gazindên xwe tîne ziman.

*Göğsüme yaslan da yatağından in,
Gel uyan uykudan, beni ağlatma!
Geçen yıl elinle bağa diktiğin
Üzümler sarardı... Ah uyan, Fatma!*²⁴⁸
(*Xwe bispêre singên min û dakeve ji nivînan,
Were hişyar be ji xewê, min nede girînê!
Ew tirîyên ku te par bi desten xwe li rez çadibû
Zerpilî.. Ax hişyar be, Fatma!*)

Di vê mijarê de maqûl e ku em bejin Rojen Barnas û Nâzım Hikmet her çiqas mirinê wekî rastîyeke jîyanê dibînin jî vê helwesta xwe her tim nikarin biparêzin ku hin caran mirin ji bo wan dibe sebebê dilşikestinên mezin ku vê êşa xwe bi gazind tînin ziman.

²⁴⁷ Barnas, *Kadiz*, r. 254

²⁴⁸ Hikmet, *h.b.*, r. 1934

ENCAM

Di vê xebatê de berhema bi navê *Kadiz* a Rojen Barnas û hemû helbestên Nâzım Hikmet ji alîyê naverokê ve hatine berawirdkirin. Hat dîtin ku digel hunera Rojen Barnas û Nâzım Hikmet di jîyana wan de jî gelek xalên hevpar hene. Di serpêhatîya her du helbestvanan de jî gelek zehmetî û pirsgirêk hene û di vê serpêhatîyê de ew bûne dîdarê gelek tiştan ku di helbestên wan de jî şopa van dîtin û serborîyên wan dixuyê. Lê hevparîya herî muhîm a jîyana wan îdeolojîya çeprew û mişextî ye ku li ser perspektîfa wan a hunerî bondor kirîye û hunera wan zêdetir di navbera van her du çeperan de teşe girtîye.

Têgeha welat di helbestên her du helbestvanan de jî pareke mezin digire. Mijara welêt di vê xebatê de bi du binbeşên wekî hezkirin û hesreta welat hat ravekirin. Lewra ew bi hezkirineke mezin girêdayî welatê xwe ne û di heman demê de mişextîya wan jî dibe sedema hesreteke mezin ku ew gelek caran vê hesret û hezkirina xwe tînin ziman. Di helbestên wan de welat ji têgeheke fîzîkî û coxrafîk zêdetir di wateya sîyasî û neteweyî de hatiye bi kar anîn ku li gor nêrîna wan welat û gel ji hev nayê veqetandin, tişt a ku welat watedar dike gel e. Hevparîyeke taybet a vê mijarê jî dagirkirina welatê her du helbestvanan e. Di serdema Nâzım Hikmet de şerê cîhanê yê yekem diqewime û welatê wî tê dagirkin, ji ber vê sedemê jî Hikmet di helbestên xwe de gelek caran cih dide vê rewşa welat û nerazîbûna xwe tîne ziman. Lê welatê ku Barnas di helbestên xwe de behs dike coxrafyayeke perçebûyî ye ku heta îro jî ji alîyê serdestan ve hebûna wê nayê qebûlkirin û ev coxrafya tenê bi hestên aîdbûnê ya gel ve dikare bibe welat. Loma jî Barnas di helbestên xwe de zêdetir bi hasasîyeta neteweyî nêzîkî vê têgehê dibe û di her fersendê de îtîraz û nerazîbûna xwe ya li ser dagirkirina welêt tîne ziman. Bi kurtî ew di helbestên xwe de digel hesret û hezkirina xwe cih dide rewşa madî, manewî û exlaqî ya welêt jî.

Nâzım Hikmet û Rojen Barnas wekî du helbestvanên sosyalîst hebûna çînên civakî red kirine û ji bo ragihandina peyamên îdeolojîk helbestê wekî amûrekê tercîh kirine. Wekhevîya di navbera civakan yek ji hêmanên sereke ya sosyalîzmê ye ku her du helbestvan jî bi vê hasasîyetê di helbestên xwe de balê dikişînin li ser vê mijarê. Ew bi vê peywendîyê dixwazin ragihînin ku hewcehî bi pergaleke civakî ya nû heye ku

çînên di navbera civakan de red dike. Rojen Barnas û Nâzım Hikmet di çarçoveya vê nêrînê de ji alîyekî ve balê dikişînin li ser yekîtîyê ku rêya li ber şer, ruxandin, kuştina însanan û neheqîyan bê girtin û ji alîyekî ve jî pergala emperyalîst û faşîst bi zimanekî tund û tûj rexne dikin. Di nav van probleman de her du jî zêdetir cih didin îstîsmarkirina keda karkeran û di hin helbestên xwe yên li ser vê meseleyê de kirdeya “em” ê bi kar tînin ku ew xwe jî di nav çîna karkeran de dihesibînin. Nâzım Hikmet digel problemên welat û cîvaka xwe problemên hemû welatên cîhanê jî bi nêrîneke sosyalîst di helbestên xwe de tîne ziman. Lê di vê mijarê de Rojen Barnas ji alîyekî ve ji Nâzım Hikmet vediqete û alîyeke spesîfîk ê îdeolojîya Barnas heye ku ew vê îdeolojîya sosyalîzmê zêdetir li ser problemên civaka xwe tîne ziman û ew îdeolojîya xwe bi netewperîya xwe ve xurtir dike. Lewra welatê Barnas ji çar hêlan ve hatîye dagirkirin û nasnameya kurdan tê înkarkirin. Ji ber vê sedemê jî ew bi qasî Hikmet cih nade problemên cîhanê û zêdetir bi rewşa welat û neteweya xwe ve mijul dibe. Tê dîtin ku ev helbestên li derdora îtîraz û îdeolojîyê dermale dibin di bingeha xwe de daxwaz û armanca azadî û wekhevîyê dikin loma di helbestên herdu helbestvanan de mijara azadîyê jî cihêkî taybet digire. Helbet fehm û daxwaza wan a li ser azadîyê jî ji hev cuda ye. Ji ber ku her du helbestvan bi heman şiklî merûzî qedexeyan namînin, Hikmet her çiqas li ser azadîya gelan raweste jî zêdetir azadîyeke şexsî dixwaze. Ji ber ku ew wekî şexsekî ji ber fikr û tevgerên xwe pêrqi qedexeyan tê. Lê Barnas û gelê xwe ji ber nasname û zimanê xwe merûzî qedexeyan tên, qedexe li ser hebûna wan e. Loma jî Barnas azadîyeke kolektîf him ji bo gelê xwe û him jî ji bo hemû bindestan dixwaze. Dîsa di mijara azadîyê de karakter û îmajên ku her du helbestvan bi kar tînin bi îdeolojîya wan ve pêwendîdar e. Lewra her du jî dagirker, kedxwir, zilmkar û îxanetkaran weke karakterên neyînî disêwirînin û îmaja tarîfîyê jî ji bo van karakteran bi kar tînin. Herwiha kesên bindest, têkoşer û kedkar jî weke karakterên erênî bi ronahîyê ve tên simbolîzekirin.

Di vê xebatê de mijara hezkirinê bi çar binbeşên weke; hezkirina siruştê, mirovhezî, hezkirina zarokan û evînê ve hat nirxandin. Di encama vê nirxandîna de hate dîtin ku di helbestên her du helbestvanan de mijara hezkirinê jî zêdetir bi hesret û îdeolojîyê ve pêwendîdar e. Bi gelemperî di vê mijarê de li ser şer û dagirkerîyê hatîye rawestîna ku di encamê de siruşt û însan bi taybetî jî zarok zirarê dibînin. Her du helbestvan jî dengên xwe yên îtîrazê li hember van neyînîyan bilind dikin.

Evîn mijareke taybet e ku di helbestên Nâzım Hikmet de ji destpêkê heta dawîyê di hemû serdeman de bi îstîqrar cih digire. Rojen Barnas bi qasî Nâzım Hikmet nebe jî cih dide vê mijarê û her du jî hesret û hezkirina xwe bi îmaj û hunerên hevpar dixemilînin. Lê dildara ku her du helbestvan disêwirînin ji hev cuda ne. Dildarên ku di helbestên Hikmet de cih digirin karakterên şênber in û helbest rasterast li ser navên wan hatine nivîsandin. Lê belê dildara ku Barnas disêwirîne karakterekî nedîyar e û di van helbestan de otosansûrek dîyar e. Em dikarin vê cudahîyê bi kesayeta wan, derdora wan a kulturî û kevneşopîya wêjeyî ve girê bidin. Lewra Hikmet li gor Barnas li derdoreke rehetir de jîyaye û di jîyana wî de jî her tim jinek hebûye ku bi rehetî di berhemên xwe de behsa wan kiriye. Lê di wêjeya kurdî de her çiqas di her serdemê de jin û bedena jinê bibe mijar jî ji alîyekî ve jî di nav çand û kevneşopîya kurdan de mehremîyeta jîyana taybet tê parastin. Rojen Barnas jî her çiqas di nav kevneşopîya wêjeya nûjen de cih bigire jî alîyekî wî yê adetperest jî heye ku ev meyla wî di helbestên wî yên mijar-evînî de jî dixuyê.

Digel ku her du helbestvan jî rastî gelek nêyînîyan tînin û dibin şahîdên zordarîyan jî hêvî, çakbînî û hezkirina wan a li hember jîyanê tu carî naqede. Loma jî di helbestên wan de mijara hêvî û hezkirina jîyanê wekî mijareke hevpar derdikeve pêş. Ew her tim ji dahatûyê, ji nîfşên nû û ji berxwedana li hember jîyanê bi hêvî ne ku helbestên wan vê felsefeya jîyana wan bi me dide hesandinê.

Yek ji mijarên hevpar jî dîrok e ku her du helbestvan jî hêvîya xwe ji bûyerên dîrokî digirin û di helbestên xwe de cih didin kesayet û bûyerên dîrokî.

Rojen Barnas û Nâzım Hikmet di helbestên xwe de mijara dayikê jî bi terz û vegotîneke hevpar bi kar anîne. Di helbestên wan de îmaja dayikê hin caran dibe hêmana şibandî û bi heyînên siruştî ve dermale dibe hin caran jî dibe kirdeya helbestê ku hezkirin, endîşe û elema wan tê vegotinê.

Mirin jî yek ji wan meseleyên hevpar a di navbera her du helbestvanan de ye. Li dor ve babetê ji hêlekî ve êş û xemgînîya ji mirinê bîwext tê şayesandinê ji alîyekî din ve jî mirinê rêya doz û têkoşînê de tînin berz kirin û nemirîya lehengan tînin nimandin.

Di vê xebatê de hat tespît kirin ku Rojen Barnas di serdema ewil a helbestvanîya xwe de dişibe Nâzım Hikmet. Lewra Barnas di serdema ewil a helbestvanîya xwe de li gor nêrînên sosyalîzmê tevdigere û di helbestên xwe de

propagandaya sosyalîzmê dike. Lê piştî ku diçe derveyî welat alîyê wî yê neteweperwerîyê xurtir dibe û helbestên bi vî rengî dinivîsîne. Herwiha Nâzım Hikmet jî li Tirkîyeyê wekî neteweperwerekî tirk helbestan dinivîsîne lê piştî ku diçe Sovyetê mîhwera wî diguhere û hunera xwe ji bo propagandaya sosyalîzmê bi kar tîne. Wekî ku tê dîtin her du her du helbestvan jî di serdemên cuda de girêdayî heman îdeolojîyan e.

Di vê xebatê de me hewl da ku di helbestên Rojen Barnas û Nâzım Hikmet de mijarên hevpar di gel terz û hesasîyeta wan ya vegotinî û hunerî eşkere bikin. Helbet digel hevparîyên di navbera wan de me di hin cihan de behsa ferq û cudahîyên wan jî kirin. Bi veçirandina van xalan hat tespîtîkirin ku di edebîyata tirkî de Nâzım Hikmet yek ji helbestvanên ewil e ku îdeolojîya marksîst di qada hunerê de disepîne. Herwiha ew wekî helbestvanekî marksîst û nûjen di edebîyata tirkî de bûye ekol ku wî hunera xwe heta dawîya emrê xwe bi vê şîarê îcra kirîye û gelek helbestvanên nûjen jî di bin tesîra wî de mane. Rojen Barnas jî yek ji wan helbestvanên nûjen e ku di gelek helbestên wî de nêrînên marksîzmê eşkere ye. Herwiha haya wî ji helbestên Nâzım Hikmet heye û dîyar e ku di binehişîya helbestên Barnas de tesîreke eşkere ya Hikmet heye. Bi kurtî em gihiştin wê qenaetê ku di nav hemû hevparîyan de hêmana sereke ya ku Rojen Barnas û Nâzım Hikmet nêzîkî hev dike felesefeya wan a îdeolojîk e. Hat tespîtîkirin ku wan di helbestên xwe de realîteya civakî hewandine, bûne berdevkê civakê û hunereke civakparêz derxistine holê. Wan wekî du helbestavanên serdema modern bi xebatên xwe erka hunerê ya civakî meşandine.

ÇAVKANÎ

Abdurrahman, Durre: *Şerha Dîwana Ehmedê Xanî -Felsefe û Jîyana Wî-*, Weşanên Avesta, Stenbol, 2002

Adsay, Fahriye: “Hevpeyvîn Ligel Rojen Barnas”, *Kovara Zarema*, hej.7, sal 3, Amed, 2016

Aksan, Doğan: *Nâzım Hikmet Şiirinin Gücü*, Bilgi Yayınevi, Ankara, 2009

Alinia, Minoo: *Diaspora Mekânları*, (Çeviren: Fahriye Adsay), Weşanên Avesta, İstanbul, 2007

Amîda Îrfan, *Qonaxeke Modernîzma Kurdî/ Helbesta Tîrêjê*, Weşanên Lîs, Diyarbakır, 20016

Aydın Ertuğrul, “Türkiyedeki Karşılaştırmalı Edebiyat Çalışmaları”, *Rumelide Dil ve Edebiyat araştırmaları Dergisi*, h.17. 2019

Aytaç, Gürsel: *Karşılaştırmalı Edebiyat Bilimi*, Doğubatı Yayınları, Ankara, 2016

Baran, Mîrza: “Di ser Erdnigarîyê re Deng û Bêdengîya Madûnan” (19.11.2019)

Barnas, Rojen: *Kadiz*, Weşanên Nûbihar, İstanbul, 2013

.....: *Farqîn (Silvan/ Silîvan)*, Weşanên Nûbihar, İstanbul, 2013

.....: “Şî’reka Min a Kevin”, *Kovara Nûbihar*, c.20, h. 138, sal 25, İstanbul, 2017

.....: “Li Ber Ava Ro”, *Kovara Nûbihar*, c. 17, h. 124, sal 20, İstanbul, 2013

Belge, Murat: “Karşılaştırmalı Edebiyat”, *Notos Dergisi*, İstanbul, h.73 Aralık 2018- Ocak 2019

Bereh, Berken: “Rojen Barnas”, *Kovara Nûbihar*, c. 19, h.133, sal 23, İstanbul, 2015

.....: “Ağzımda Kimliğim Benim” (03.11.2019)

Bermann, Sandra: “Karşılaştırmalı Edebiyat ve Dünya Edebiyatı”, *Notos Dergisi*, İstanbul, h.73 Aralık 2018- Ocak 2019

Bezirci, Asım: *Nâzım Hikmet – yaşamı, şairliği, eserleri, sanatı-*, Evrensel Basım Yayın, İstanbul, 2016

Çelik, Nihat: “Hevpeyvînek Li Gel Rojen Barnas”, *Kovara Jiyana Rewşen*, h. 43, Stenbol, 2000

- Engünün, İnci: *Mukayeseli Edebiyat*, Dergâh Yayınları, İstanbul, 1999
- Ergün, Zülküf: “Nerît û Helbest-Nerîta Neteweyî *Di Helbesta Nû Ya Kurdî De (1880-1970)-*”, *Weşanxaneya Nûbihar*, İstanbul, 2017
- Fuat, Memet: *Nâzım Hikmet Üstüne Yazılar*, Yapı Kredi Yayınları, İstanbul 2017
- Gültekin, Ali- Üyümez Betül: “Türkiye’de Karşılaştırmalı Edebiyat Çalışmaları”, *Alman Dili ve Edebiyatı Dergisi*, h.20, 2008
- Gürçağlar, Şehnaz Tahir: *Çevirinin ABC’si*, Say Yayınları, İstanbul, 2019
- Göktaş, Nazik: “Fransa’da Yazınsal Çeviri Yaklaşımları (Bir Tarihçelendirme Denemesi)”, *Çukurova Üniversitesi Eğitim Fakültesi Dergisi*, c.2, h.30, Adana 2005
- Göktürk, Akşit: *Çeviri: Dilllerin Dili*, Çağdaş yayınları, İstanbul, 1986
- Hikmet, Nâzım: *Bütün şiirleri*, Yapı Kredi Yayınları, İstanbul, 2018
- Mela Mûsayê, Hekarî, *Durul-Mecalîs: Yekemîn Komeley Çîrok le Mêjûy Pexşanî Kurdî -Wergêran- da (Saxkirdinewe û Lêkolînewe)*, Amd. Hêmin Omar Xoşnaw, Çapxaneya Hêvî, Hewlêr, 2019
- Melayê, Cizîrî: *Dîwan*, Weşanên Avesta, Stembol, 2012
- Murat, Kacıroğlu: “Cumhuriyet Dönemi Türk Edebiyatında (1923-1940) Toplumcu-Gerçekçi Edebiyat Tartışmaları”, *Erzurum Teknik Üniversitesi Sosyal Bilimler Enstitüsü Dergisi*, Temmuz, 2016
- Kara, Sergül Vural: “Tarihsel Değerlendirmeler Işığında Türkiye’de Çeviri Etkinliği”, *Mersin Üniversitesi Eğitim Fakültesi Dergisi*, c. 6, h.1, 2019
- Karaismailoğlu, Adnan: “*Tarih Boyunca Türkler ve Farsça; Modern Yaklaşımlara Bir Eleştiri*”, *Kırıkkale Üniversitesi Sosyal Bilimler Enstitüsü Dergisi*, c.3, h.1, Ocak 2013
- Kefeli Emel: “Karşılaştırmalı Edebiyat: Tanım, Yöntem ve İncelemeler”, *Türkiye Araştırmaları Dergisi*, İstanbul, c.4, h.8, 2006
- Leontiç, Mariya: “Nâzım Hikmet’in Hayatı ve Şiirleri” (20.10.2019)
- Muhammed, Husein: “Wergerandin” (22.02.2020)
- Öpengin, Ergin: “Werger û Wergêran di Kurmanciyê de: paşxane û hindek pirsên îroyî”, *In Proccedings of first international conference on Kurdish Literature*, xxx. Sanandaj, University of Kurdistan Press, 2011

Özarslan, Ersin: *Nâzım Hikmet – hayatı ve şiiri-*, Zanîngeha Hacettepe, Enstituya Zanistên Cîvakî, Teza Doktorayê, Ankara, 2003

Rousseau, A.M. -Cl. Pichois: *Karşılaştırmalı Edebiyat*, (Çeviren: Mehmet Yazgan), Milli Eğitim Bakanlığı Yayınları, 1994

Serfiraz, Mesûd: “Di Çapemenîya Kurdî Ya Dewra Osmanî De Wergera Wêjeyî”, *Kovara Wêje û Rexne*, h. 2, 2014

Seyyîd, Gassân es-: “Edebi Tercüme ve Karşılaştırmalı Edebiyat”, (Çeviren: İsmail Bozkuş), *e- Şarkîyat İlmi Araştırmalar Dergisi*, c. 8, h. 1 (15)

Stolze, Radegundis: *Çeviri Kuramları -Giriş-*, (Çeviren: Emrah Durukan), Değişim Yayınları, İstanbul 2013

Suçin, Mehmet Hakkı: “Arapça Çeviri Geleneği: Altın Dönem”, Harvard University Department of Near Eastern Languages and Civilizations, *Journal of Turkish Studies*, 2010

Şahin, Elmas: “Neden Mi Karşılaştırmalı Edebiyat?”, *Kibatek 13. Edebiyat Sempozyumu Bildiri Kitabı*, Nobel Kitabevleri Yayınları, Adana, 2007

Taştan, Yusuf: *Dîroka Wergerê û Xebatên wergera Kurdî*, Zanîngeha Van Yüzüncü Yılê, Enstituya Zimanên Zindî, Makezanista Ziman û Çanda Kurdî, Teza Lîsansa Bilind a Neçapbûyî, Wan, 2019

Tekşan, Mesut: *Karşılaştırmalı Edebiyat Bilimi*, Kriter Yayınları, İstanbul, 2011

Tieghem, Van Paul: *Mukayeseli Edebiyat*, (Çeviren: Yusuf Şerif Kılıçel), Büyüyen Ay Yayınları, Stenbol, 2013

Uçman, Abdullah: “Tanzimat’tan Sonra Edebiyat ve Siyaset: Nâmık Kemal ve Ziya Paşa Örneği”, *Türkiyat Mecmuası*, c. 24, h. 1, 2014

Wellek, René, Austîn Waren: *Edebiyat Teorisi*, Dergâh Yayınları, (Çeviren: Ö. Faruk Huyugüzel), İstanbul, 2013

Wellek, René: “Karşılaştırmalı Edebiyatın Krizi”, (Çeviren: Sıddık Yüksel), *Dinbilimleri Akademik Arştırma Dergisi*, c.7, h. 1, 2007

Yıldırımçakar, Zîyattîn: *Werger Wek Kirineke Çandî: Li Ser Rîyên Ji Wergernasîyê Ber Bi Kurdolojîyê Ve*, Zanîngeha Mardîn Artukluyê, Estituya Zimanên Zindî yên li Tirkîyeyê, Şaxa Makezanista Ziman û Çanda Kurdî, Teza Lîsansa Bilind a neçapbûyî, Mêrdîn, 2016

Zengin, Bekir (Ed.): *II. Uluslararası Karşılaştırmalı Edebiyat Bilimi Kongresi Bildiri Kitabı*, Kriter Yayınları, Sivas, 2018

http://ceviribilim.com/?page_id=1496

